Arşîva Bîra Kurdan: Ji Kendal Nezan gotara bi serenavê "Belengazîya kurdan" (1996) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Nîsan 2012 - Hejmar 29 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

**Alain Gresh**
Kurdên ku di destpêkê de li Sûrîyê ji bo bidestxistina mafên hemwelatîyê xwepêşandêrên yekemîn bûn, bi sedema ku Konseya Netewî ya Sûrîyê dayîna mafên wan nepejirand, êdî xwe didin alîyekî…
▶ R. 7

**Jean Radvanyi**
Herçiqas Vladîmîr Pûtîn 4ê adara bihorî dîsa wek serokkomarê Rûsyayê hatibe hilbijartin jî, meşrûîyeta wî lawaz bû û zêde kes ne bawer in ku ew dê ji pirsgirêkên welêt re çareyan bibîne…
▶ R. 8

**Owen Jones**
Şandeyên YE, IMF û Bankeya Navendî ya Ewropî li Portekîza cîhana piçûk a lîberalîzmê çi digerin? Piştî krîza deynî ya Yûnanistan û Îrlandayê gelo dê Portekîz bibe laboratûwareke nû?
▶ R. 9

**Jean-Christophe Servant**
Bijîjkên frankeşteynî yên hikûmeta Nîjeryaya ku ji ber çeliqînên civakî wek 'demokrasîyeke hêçbûyî' jî tê bi nav kirin, çawa ji tevgereke olî cinawirek weke Boko Haram afirand?
▶ R. 15

**Cédric Gouverneur**
Li Hindistanê şirketên bi mîkrokrêdiyê, ku diviya mirovên belengaz bihêz bikira û rûmeta wan li wan vegerandana, avabûyî bi mêtina xwîna kesên hejar ji xwe re serwetan didin ser hev…
▶ R. 18

### Di navbera xewn û rastîyê de

# Ragehandina dewleta kurdî

Salimê Casim*

Erê ragihandina "dewleta kurdî" îro di berjewendîya kurdan de ye? Dê paşeroja wê dewletê çi be? Dewleta kurdî ya ji alîyê dagîrkerên Kurdistanê ve dorpêçkirî dê bikare bijî? Bi taybetî jî gava hemî xureka me ji derveyî Kurdistanê tê. Sînorên vê dewletê dê çawa bin? Kurdistan dê bi tenê ji her sê parêzgehan; Dihok, Silêmanî û Hewlêrê pêk bê? Erê heger niha bêyî çareserkirina madeya 140ê û vegerandina deverên veqetîyayî, "dewleta kurdî" bê ragihandin, dê paşeroja van deveran çi be? Gelo rewş û mercên ragihandina "dewleta kurdî" li bar in? Dê helwêsta Bexdayê çi be? Yan dê helwêsta dewletên deverê û cîhanê çi be? Ev hemî pirsîyar in û berî ragehandina "dewleta kurdî" li bersivên xwe digerin.

Ev demek e ragehandina dewleta kurdî bûye benîştê devê hemî texên civaka kurdî. Ji egerê nebûna çi sinoran di navbera partîyên kurdî û hikumetê de, tevlihevîyek di kar û erkên cihên biryardanê da çêbûye. Babet û mijarên girîng yên nihênî ku bi tenê karê hikumetê ne, şûna parleman û hikûmet lêbikole û biryarê li ser bide, pirtir li ser cadê tên gengeşe kirin. Erê cadeya kurdî ji texa siyasî ya kurdî hişyartir e, Yan jî siyaset û cade têkelî hev bûne û bazar tesîra xwe di hemî mijaran de li ser siyasetê zêde dike. Ragihandina dewletê wek girîngtirîn û mezintirîn biryar bi propaganda û kurtename û bi daxwazên di "facebook"ê da, yan jî bi rêkên hevçerx yên dîplomasî û siyasetê û li pişt dergehên girtî tê gengeşe kirin û bi peymanan biryar li ser tê dayin?

Dewlet di cografyayeke destnîşankirî da wek qebareyekê siyasî, şêweyekê pêşkeftî yê rêvebirina kar û erkên xelkê ye. Di pêvajoya pêşkevtina împaratorîyan de sînorên cografî ji bo rêvebirîyên sîyasî biçûk hatine. Ji ber vê yekê împaratorî cografyayên berfireh wergirtibûn û gelek netewe û gel himbêz kiribûn. Lê li dûmahîya çerxê nozde û destpêka sedsala çûyî hilweşîyan û wek pêwîstîyeke serdemî bo asankirin û pêşvebirinê şûna wan di nav sînorên bertengtir û cografyayeke biçûktir de dewletên neteweyî hatine damezirandin.

Yek ji encamên Şoreşa Fransî û tesîra wê li ser peydabûna hizrên neteweyî ew e ku guherîn di formên rêvebirina welatan da çêbûn. Herçende di destpêkê de prosesa damezirandin û avabûna dewletên modern yên neteweyî gelek kiz bû û pirtir ji sed salan kêşa, lê dîsa jî vê prosesê şîya sînorên Ewropayê derkeve û hemû cîhanê bide ber xwe. Peryoda yekê ya avabûna dewletên neteweyî vedigere bo encamên şerê cîhanê yê yekê li Ewropayê û Rojhelatê Navîn ku ji egera nemana Împaratorîya Osmanî û ji encamên peymanên nihênî di navbera zirhêzên serkeftî yên ewropî de, dûr ji hez û biryarên gelên deverê dewletên nû hatine çêkirin. Sînor û rengê birêvebirina van dewletan neşîya derbirînê ji hizir û bîrên xelkî bike. Encamê şerê cîhanê yê yekê pirtir parçekirin û dagîrkirin bû. Duristkirina dewletan li Rojhelatê Navîn, bi taybetî jî li Îraqê, di proseseka saxlem ra

▶ R. 4

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, Danîmarka: 40 DKK, Norweç: 40 NOK, Swêd: 50 SEK, Swîsre: 6,50 CHF, Tirkiye: 7 TL

### Di çarçoveya gengeşîyên siyasî de

# Destûra nû û pirsa kurdî

Mesut Yeğen



Muzaffer Oruçoğlu: **Eda**, teknîka tevlihev, 71 x 88 cm

Da ku mirov birêveçûna gengeşeyên li ser destûra nû yên li Tirkîyeyê, ku ev salek e berdewam in, resm bike ev gotin têrê dikin: "Pir xeberdan, hindik karkirin." Dê di cih de be heger ku mirov bibêje ku siyaseta Tirkîyeyê sala çûyî weha derbas kir ku her tişt li ser destûra nû hatin gotin, lê tiştek nehat kirin. Du sedemên sereke yên vê yekê hene. Sedema yekem ev e: Nepenî ye ku ka hin aktorên siyasî yên sereke, ku dê teşe bidana destûra nû, destûreke nû dixwazin, yan na. Nîşane ne gelek in ku him CHP, him jî MHP destûreke nû dixwazin. Weha xuya dike ku herdu partî jî di şûna destûreke nû de, ku li gor pêşnîyarên AKP û BDPê were guhertin, dixwazin destûra heyî bimîne. Sedema duyem ku ka çima li ser destûra nû ewqas gengeşî tên kirin, lê dîsa gav nayên avêtin jî tahayulên aktorên siyasî yên sereke ne. Tiştê ku tê dîtin ew e ku di navbera tahayulên wan aktoran de, ku dê teşe bidin pêvajoya çêkirina destûra nû, an ku AKP, CHP û BDPê de cudatîyên gelek mezin hene û nîyeta van sê aktoran jî qet nîne ku van cudahîyan ji holê rakin. Daxwazên wan her sê aktoran, ên di warê destûra nû de, gelek kêm li hev dikin û dîyar e ku ew dê xwe nebetilînin ku wan lihevnekirinan çareser bikin.

Destûra nû ku AKP dixwaze, weha dîyar e ku lawazkirina wesayeta burokratîk, ku di referandûma 2010ê de dest pê kiribû, pêş de bibe, hikûmetê li hember burokrasî û parlamentoyê serbest û bandorker bike û navendperestîyê di wê astê de sist bike, ku bikaribe tengezarîya meseleya kurdî vemirîne. Bi gotineke din, AKP destûra nû ji alîyekî ve ji bo wê yekê dixwaze ku Tirkîyeyê ji çavdêrîya burokrasî û bi qismî ji ya parlamentoyê derxe û hikûmeteke 'azadkirî' sîstema nîv-serokî pêk bîne, ji alîyê din de jî ji bo wê yekê dixwaze meseleya kurdî hinekî be jî aş bike. Lê belê CHP li dij vê fikra hikûmeta bandorker a AKPê derdikeve û destûreke weha dixwaze ku wesayeta burokrasîyê bi dirûveke din be jî vejîne. Dê di cih de be ku were gotin ku CHP di şûna zordestîyeke bi piştgirîya dengdaran de, ku AKP dixwaze, zordestîyeke bi piştgirîya burokrasîyê dixwaze. Ji alîyê din de jî, tevî ku fikrên AKP û CHPê yên ji nû ve sazkirina têkilîya navbera siyaset û burokrasîyê qet bi hev nakin jî, fikrên wan ên sebaret bi çareserîya kurdî gelek bi hev dikin. Herdu partî jî li ser esasê Şertê Xweserîya Birêveberîyên Herêmî yên Ewropayê sistkirina navendperestîyê wekî reçeteya destûrî ya meseleya kurdî pêşkêş dikin.

### Pirsgirêka kurdî kevirê bingehîn yê nivîsandina destûreke nû ye

Tiştên ku di derbarê tahayulên AKP, CHP û MHPê de li jorê hatin gotin, nîşan didin ku: Destûreke nû ya pêkan, ku di encama lihevkirina van sê partîyan de derkeve, yan nabe destûreke nû, yan jî di warê çareserkirina meseleya kurdî de, nikare ji rakirina navendperestîyê pêvetir tu guhertineke berbiçav bîne. Helwêstên wan nîşan dide ku heger AKP û MHP li hev bikin jî ji vê yekê destûreke nû derkeve ku ne nû ye. Di warê pêşnîyara nîv-serokî ya hikûmeteke bandorker de jî dixuye

▶ R. 3

www.arsivakurdi.org

# Felsefeya bêdijwarî

## Christophe Baconin

Felsefe niha bûye mode. Bi qasî xuya dike ev nûçeyeke xêrê ye, madem tiştê li vir dibe mode dîsîplîneke wisa ye ku ji bo avakirina şertûmercên ramana rast tê bi kar anîn. Lê belê, hê di despêkê de jî, di dema xwe ya herî xeşîm de jî –bi ihtîmaleke mezin– ku li derdora sifreyeke xwarin û vexwarinê, bi awayê Platon, an jî li gel meşê, bi awayê Arîstote, gava dihat pêkanîn jî di navê de, ti caran nebûbû karûbarekî ewçend hêsan… **Raphaël Enthoven**, **Vincent Cespedes** û **Charles Pépin** îro stêrkên medyatîk ên vî warî ne û bi qasî ku mirov pê şaşûmetel bibe, zêde difiroşin: Berhema dawî ya **Charles Pépin**, bo nimûne, rêza pêşî ya pirtûkên herî zêde difroşin ên Weşangerîya *Amazon*ê îşgal dike. (1) Baş e, ji bo ku ewçend xwe bidin hez kirin, ew kîjan rêbazê, kîjan têgehan derpêş dikin û bi kar tînin?

Ji derî karûbarên xwe yên radyofonîk ("*Rêyên nû yên zanînê*", li ser kanala radyoyê **France Culture**, heta hezîrana 2011ê) û yên televizyonî ("*Fesefe*" li ser kanala **Arte**), **Raphaël Enthoven**, ku ji dibistana mamosteyî û ya felsefeyê mezûn bûye, herwiha di kovara *Philosophie Magazine* de jî bi rêkûpêkî nivîsaran dinivîse. (2) Bîrbirinên wî yên li ser mijarên cur bi cur ên weke lîstik, cesaret, bêrîkirin, xwedbînî, tedbîr, hemû bi kêfxweşî tên xwendin, nivîsên bêzirar in û armanca wan ew e ku hewayekî zêde cidî neafirînin. Lê belê li gel vê yekê jî ji bo wan referans pêwist in: Qet nebe ew referans bi kesên weke **Sacha Guitry, Cioran, Coluche, Nietzsche, Woody Allen** û **Spînoza** pirrengî ne. Nivîskar hejmara xweşgotin û paradoksên jirêzê, an jî pûç zêde dike: *"Xala destpêkirina mîzahê, nebûna tiştê pêkenînê ye"*, *"Heqîqet sirek e ku ji bo ti kesî ne sir e"*... Bi axaftina xwe ew li şûna îsbatkirinê, coşûxiroşê, li şûna ezmûna têgehan jî îdiakirinê tercîh dike. Bi awayekî giştî, ew xwe *"ji şopajoyê **Trotsky** bêhtir yê **René Char**, ji şopajoyê **Fîdel Castro** bêhtir yê Xwîşka olî Emmanuelle"* îlan dike û gilî û gazinên wî yên îronîk ên li hemberî mîlîtanîyê, "kesên çavliderî", komunîzmê an jî utopyayê, di bin kirasê têkoşîna li dijî bêberpirsîyarîya kesên ku xwe nadin ber *"sererastkirinên piçûk ên ku pêşveçûnên rasteqîn pêk tînin"*, di eslê xwe de balê dikşînin îfadeya besît a nêrîneke têra xwe pirbare ya ji qalibên wergirtî pêk tê.

Bi felsefeya *"mîzaha şampanya"*yê, **Vincent Cespedes**, ê ku hê berî çendekê mamosteyê felsefeyê bû û îro nivîskarê ceribandinan e û li cem ***Larousse***yê midûrîya koleksîyona ***Philosopher*** dike, ew jî tîne ziman ku dixwaze *"sextekarîyên ronakbîrî"* xira bike, lê belê ew bêhtir li ser tiştê ku weke *"bextiyarvanî"* bi nav dike, hûrûkûr dibe: Berxwurîparêzî, felsefeya bi rêzikan çarçovekirî, psîkanalîz, sinc, "***Club Med***", ol, dibistan, totalîtarîzm... Eger ji wî were pirsîn, ev tişt giş weke ku bi erzanîyeke ku wê me ji *"ji soza me ya jîyînê"* dûr bixe, bextiyarîyê difiroşin me. Weke olaneke dilsozê *Çêjên Cîhanî* yên **André Gide**, ew piştrast dike ku, ji bo rizgarkirina me, divê em ji nû ve fêrî *"zewqên besît"* bibin û bijîn bêyî ku em *"di nav kodên livûtevgera baş de bên girtin"* an jî hê ji vê jî baştir : *"gerandina govenda coşûciroşê"*, ev *"rewşa serxweşîya jîyanê bi xwe"* ku tê de *"em şokên bi awayekî nerm hîs dikin, eynî mîna di bin kremayê de hatibin nixumandin"*. (3) Bernameya cezibandinê bi her halî, lê belê pir jî mutewazî ye gava ku li gel *Lîstika Teyrê Anqa* (4) tê muqeyese kirin ; a ku wî berî demeke nêz derxist pîyaseyê. Ev lîstika bi kartan, ku cureyekî fala îskambîlan ya "intello"yê ye, weke aleteke xweanalîzkirin û danûstandinê tê nirxandin. Li gor kurteîzahê ku wê dide nas kirin, divê bi me re bibe alîkar ji bo ku em karibin *"bersivê bidin her cure pirsên xwe û yên nas û dostên xwe"* û *"di nav çend kêlîyan de bikevin nav kûrahîyeke bêhempa"*. Nimûneyek: Eger ez rahêjim karta "gerûgeşta li nav têkilîyên xwe yên evînî", ez fêr dibim ku evîn ji bo min jihişvebirek e ku min serxweş dike û rizgar dike û di heman demê de jî dihêle ku ez li hemberî kesên din jî vekirî bim. Ev bi rastî jî kûr e…

Xwedî dîplomaya mamostetîyê **Charles Pépin** jî me vedixwîne ku em bidin ser rêya bilez û bi fêrbûna bêwestan a *"bingehên felsefeyê di heft rojan de"* xwe xurt bikin. (5) Di her yek ji wan berheman de em tên vexwendin ji bo ponijîna li ser bextiyarî, siyaset an jî perwerdeyê, di çarçoveya planeke bi giştî bi ser sê beşan de bi ramanên balkêş çawa pêwist be wisa hatiye xemilandin: *"Hûrûkûr fikirîn me bextiyar nake, lê belê me zindîtir dike û dikare hem zêdetir bextiyarî hem jî zêdetir bedbextîyê bide me"*. –Bîreweriyeke xumamî ya bêyî rîsk a xwendina **Friedrich Nietzsche**. Dîdaktîk, lihevkir, ew heta ji destê wî tê, pesnê cezb û rûmetên demokrasîyê dide.

Ev her sê feylesofên ku di wateya siyasî de bi qasî ku sethî ewçend jî bêzirar in, ji ramanê bêhtir ekranên televizyonan ên ku tê de weke ku reh vedane xuya dikin, ji xwe re dikin derd û ji bo wan serê xwe diêşînin...

1 Charles Pépin et Jul, *Gerestêrka Zanayan. Ansîklopedîya Cîhanî ya Feylesof û Felsefeyan*, cild I, Dargaud, Paris, 2011


2 Raphaël Enthoven, *Feylesofê Xizmetê*, Gallimard, Paris, 2011; *Devera Dekorê*, Gallimard, Paris, 2009

3 Vincent Cespedes, *Lêgerîna bi sêhre a ji bo bextiyarê*, Larousse, Paris, 2010


4 Vincent Cespedes, Le jeu du Phénix *(Lîstika Teyrê Anqa)* Flammarion, Paris, 2011

5 Charles Pépin, *Hefteyeke Felsefeyê. 7 Pirsên ji bo Gavavêtina Nav Felsefeyê*, Flammarion, Paris, 2006

Wergera ji fransî: Baran Nebar



# JI ÇAPEMENÎYÊ



### Tirkîyeya Erdogan: Desthilatdarîyeke bêrehmtir

Di dehsalîya xwe de hikûmeta AKP ji demên berê jî zordesttir e.

Rojnameya ***Financial Times*** di 28ê mehê de gotarek li ser hikûmeta AKPê û serokwezîrê tirk **Recep Tayyip Erdogan** weşand. Di gotarê de ku ji alîyê **David Gardner** û **Daniel Dombey** ve hatiye nivîsandin, bal tê kişandin ser wê yekê ku di serdema dehsalî ya **Erdogan** de Tirkîye careke din bû hêzeke herêmî. Aborîya wê bi qasî leza Çînê mezin bû û gelek dibistan û otoban hatin ava kirin. Herweha muteşebisên ***'Pilingên Anatolyayê'*** jî li hember hin şirketên mezin rabûn.

Di warê gavên siyasî de rojname weha dinivîse: *"Birêz **Erdogan** di serdema xwe ya pêşîn de reformên siyasî pêk anîn û mafên medenî û mafên hindikahîyan pêş xist. Wî, di serdema xwe ya duyem de jî populerbûna xwe bi kar anî ku generalên hêzdar ji sehneyên daxîne. Niha li hember desthilatdarîya wî tu reqîb nema -û tehammula wî ya li hember muxalifan jî her ku diçe kêmtir dibe"*.

Rojname şirove dike ku digel otorîterîzma wî, qaretîya serokwezîr jî mezin dibe û cih dide gotinên serokê *Weqfa Civaka Vekirî ya Stenbolê* **Hakan Altınay**: *"Serokwezîr îqtîdarbûna yekane hembêz dike. Tenha tiştê ku ew dixwaze bibihîse çepik û dilsozî ne."* Wekîlekî AKPê bi xwe jî ji vê rewşê nerazî ye: *"Ew guhdarîyê dike, lê bawer dike ku ew jixwe her tiştî dizane û dibêje ez çi biryarê bidim ew e"*.

Gotar herweha hin nihêrînên din jî radigihîne: **Sinan Ülgen**ê serokê ***think-tanka Edam*** dibêje: *Azîneya Erdogan pevçûn e. Ev yek bi kêrî wî hat ji ber ku kesek nikare di navberê de bimîne. Ew jî mîna **Bush** dibêje tu yan bi min re yî, yan li dij min î. Erdogan û AKP di warê kêmkirina bandora artêşê ya li ser siyasetê de biryardarîyeke xurt nîşan da, lê belê wan heman azwerî di warên avakirina demokrasîyeke hêzdar de nîşan neda. Ji ber ku li hember muxalifan tehammul nîne, kalîteya demokrasîya Tirkîyeyê bi pirsgirêk e. Azadîyên takekesî tên tengtir kirin, lê hêza hikûmetê na.*

Derbarê pêşbirka digel cema'ata **Gülen** de jî rojname bi bîr dixe ku ***gulenî*** di nav polîs û dadwerîyê de bi cih bûne û niha wan çav berdaye xizmetên ewlekarîyê. Gotar herweha gotinên hin rayedarên AKPê radigihîne ku navê wî nabêje: *"Êdî ew naxwazin ku bi tenê polîs bin, dixwazin di cihên din de jî hebin, lê belê divê yek ji wan re bibêje rawestin"*.

### Çareserîya krîzê tahwîlên herêma euroyê ne

Rojnameya ***Financial Times*** di 26ê adarê de li ser krîza Ewropayê û çareserîyên ku tên pêşnîyar kirin nivîsandin. Di gotara **Wolfgan Münchau** de tê gotin ku pakêtên xelaskirina welatên ewropî wekî rokêtan tên dîtin, lê belê bandora wan bi qasî debançeyan jî nîne.

Li gor nivîsê tê bawer kirin ku heger fişarên muteşebisan ên li ser dewletan kêmtir bibe, hingê demên pakêtên xelaskirinê jî dikarin piçûktir bibin. Lê belê ev ihtîmala tengbûnê dibe sedem ku li cem pîyaseyan fikar peyda bibin; ev jî rê li fişaran vedike.

Li gor **Münchau** fona pakêtên xelaskirinê dibe ku bikaribe pêşî li îflasa welatên piçûk bigire, lê belê ew têra Îspanyayê nakin. Îspanya jî wê di dawîya dawî de naçar bimîne û serî li pakêtên xelaskirinê bide. Ji bo xelaskirina welatan di şûna tahwîlan de hikûmetên şexsî de divê li seranserî Ewropayê bono derxin pîyaseyan û bi vî awayî hemû welatên ewropî dikarin rîskê par ve bikin.

### Bombekirina Bingehên Navokî

Di 26ê adarê de rojnameya brîtanî ev pirs kir: Gelo taktîka bombekirina bingehên nukleerî bi kêr tên? Di gotara **Mehdî Hesen** de tê gotin ku êrişeke pêkan a li dij Îranê dê teqez Îranê îqna bike ku bernameyeke navokî bi pêş xe.

Rojname bi bîr tîne ku di 7ê hezîrana 1981ê de Îsraîlê înşaata reaktora nukleerî ya ***Osîrak*** bombe kiribû û ev yek niha wekî mînakek li dij Îranê tê pêşnîyar kirin. Lê belê gotarnivîs di wê bawerîyê de ye ku ev helwêsteke xelet e. *"Êrişa li dij Osîrak pêşî lê negirt ku Iraq çekên nukleerî ava bike. Jixwe wê demê bisporên fransiz bingeh weha çêdikir ku tê de çekên nukleer neyên ava kirin. An ku êrişa 1981ê ne dawîya bernameya çekên nukleerî ya Iraqê, lê belê destpêka wê bû. 9 salan piştî êrişê Iraq gihiştibû wê merheleyê ku çekên nukleerî çêbike"*.

Gotar di encamê de dibêje heger êrişeke weha li dij Îranê pêk were, ev yek dê bibe sedem ku Îran biryara avakirina çekên nukleerî bide.

### Elewîyên Sûrîyeyê bi tenê man

Di 22ê adarê de rojnameya ***Financial Times*** elewîyên Sûrîyeyê kir mijar. Di gotara **Roula Khalaf** de tê gotin ku ji ber têkilîyên wan ên digel rejîmê hindikahîya elewî hatine tecrîd kirin. Gotarnivîs dibêje herçend rewşenbîrên elewî piştgirîya serhildanan dikin jî, piranîya xelkê elewî hîna jî piştgirîya rejîmê dike. *"Piranîya Sûrîyeyê sunnî ye. Di nav gelheya wê ya 22 mîlyonî de 12 dersed elewî ne. Erişên artêşê bû sedema geşbûna dijminatîya li hember elewîyan. Elewî jî niha heyirîne û nizanin ka çi bikin"*.

Di gotara **Rouls Khalaf** de herweha tê gotin ku îro giranîya serokên olî nemaye û **Hafiz Esad** naveroka elewîtîyê vala kiriye. Gotarnivîs wekî din cih dide gotinên karsazekî elewî yê lubnanî ku digel elewîyên Sûrîyeyê di têkilîyê de ye. *"Wekî din çareya elewîyan nîne, divê ew dilsozên rejîmê bin. Ev meseleya man û nemanê ya elewîyan e. Heger ew rejîma ku wan diparêze were rûxandin, dê hikûmeteke îslamî were. Ev serhildan ne bi tenê li **Beşar** e, ew derbarê guherandina îdeolojîya Sûrîyeyê ye"*.

### Newroz bersivek bû li hember Tirkîyeyê

Rojnameya amerîkî ***New York Times*** di 21ê adarê de nivîsand ku kurdan bi pîrozbahîyên Newrozê bersiv da desteserkirinên li dij BDPê. **Susanne Gusten** di gotara xwe de balê dikişîne ser wê yekê ku hikûmeta tirk piştgirîyê dide bihara erebî, lê belê ew li hember xwepêşandarên li nav welatê xwe nadebire û polîs bi tundî bersiva xwepêşandarên kurd dide.

Rojnameya amerîkî bi bîr tîne ku niha li Tirkîyeyê 24 şaredar, bi dehan encumen û 630 rêveberên BDPê di zindanan de ne û weha dirêjîyê pê dide: "Xwepêşandarên kurd, da ku fişarê bikin ser hikûmeta tirk, ku piştgirî dide bihara erebî, lê protestoyên muxalifên li nav welatê xwe tehammuleke sînordar nîşan dide û daxwazên xwe yên ji bo xweserîyê bilindtir dike".

***New York Times*** herweha dinivîse ku *"hikûmetê di destpêkê de hin gav avêtibûn da ku rewşa kurdan baştir bike, lê belê siyasetmedarên kurd, ku dixwazin mafên kurdan di destûra nû de cih bigirin, nikarin ji van gavan sûdê werbigirin"*.

**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Koordînasyon**
Yado Ciwan

**Alîkarên vê hejmarê**
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

**Revîzyona Wergeran**
Feryal Guladawîya
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Devecî

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon, F-75013, Paris, France

www.arsivakurdi.org

# Destûra nû û pirsa kurdî (Dewama rûpela 1)

ku CHP tu caran piştigirîyê nade, lewma CHP û AKP dikarin bi tenê li ser nebûna navendperestîyê bi lawazî li hev bikin. Ev yek aşkere dike ku heger di navbera AKP û siyaseta kurdî de lihevkirinek peyda nebe, pêkan e ku destûreke nû, ya ne nû were çêkirin ku tê de guhertineke berfireh nebe ku bikaribe meseleya kurdî çareser bike. Di navbera daxwazên siyaseta kurdî yên li ser guhertina destûrê û lihevkirineke navbera AKP û CHPê de kendalek heye, lewma dîyar e ku destûrek ku ji alîyê siyaseta kurdî ve neyê erê kirin, dê bi kêrî çareserîya meseleya kurdî neyê. Ev yek jî di siyaseta Tirkîyeyê de dê rê li tengazerîyeke mezin veke: Dibe ku siyaseta Tirkîyeyê ketibe wê rêyê ku destûreke weha çêbike ku nikare wê meseleyê çareser bike ku mohra xwe li dîroka Komarê xistiye. Bi tenê bi guhdayîna pêşnîyarên siyaseta kurdî yên ji bo destûra nû dikarin ji vê rêyê derkevin.



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Dîn**, kolaj, 54 x 44 cm

## Destûra Nû: Kurd doza çi dikin?

Di warê destûra nû de bendewarîyên BDPyê, ku di zemîna partîyên siyasî de nûnera rast a siyaseta kurd e, aşkere ne. Ew pêşnîyarên guhertinê, ku di van demên dawîyê de alîyên derveyî BDPê jî piştgirîyê didin, dikarin li jêr sê serenavan werin kom kirin: Hevwelatîbûn, perwerdeya bi kurdî, xweserî (birêvebirina xwe bi xwe)

Di meseleya hevwelatîyê de tiştên ku kurd dixwazin aşkere ne. Siyaseta kurdî dixwaze ku hevwelatîbûna Komara Tirkîyeyê nebe xwedî naverokeke etnîk, olî û çandî. Di şûna hevwelatîyekê, ku çarçoveya wê bi kodên çandî hatîye dîyar kirin, tarîfeke huqûqî û siyasî pêşnîyar dikin.

Divê were pejirandin ku, herçend nayê qebûl kirin û gelek dij-îdîa tên kirin jî, hevwelatîbûna Komara Tirkîyeyê tu caran nebû kategorîyeke huqûqî-siyasî. Di her serê destûran de, ku piştî Komarê hatine çêkirin, hevwelatîbûn bi naverokeke çandî hat dagirtin. Hevwelatîbûna Tirkîyeyê hertim bi ***tirkbûn*** û ***sunnî-musulman*** bûn re di heman wateyê de hat bi kar anîn. Bûyîna hevwelatîyekî îdeal ê Komarê, dihat wateya axaftina bi tirkî û musulmanekî sunnî (yê 'nûjen') bûnê. Ev yek nîşan dide ku Komarê ji wan kesan re ku bi tirkî napeyivin, an ku ne tirk in, tirkbûn û ji wan kesan re jî ne sunnî-musulman bûn, sunnîbûn pêşnîyar kirin. Bi vî awayî, hevwelatîbûna Tirkîyeyê ne li ser esasekî yeksanîperwer, lê li ser esasê pişavtinê rabû. Niştecihên welêt dikarîn bi tenê qasî tirkbûn û sunnîbûna xwe bibin hevwelatîyên yeksan. Ev yek jî nîşan dide ku feraseta hevwelatîyê ya Komarê berîya hertiştî pişavkar bû. Niştecihên ne-tirk û ne-musulman ên welêt an ku kurd, çerkez, laz, elewî û hwd. dikarîn encax bi tirkbûn û sunnîbûnê bibin hevwelatîyên maqûl û yeksan ên Komarê.

Feraseta hevwelatîyê ya Komarê ne tenê pişavkar, lê belê herweha cudager jî bû. Komarê bi tenê ew kes vexwandin tirkbûn û sunnîbûnê. Ne-musulmanên welêt li derveyî vê vexwendinê hatin hiştin. Ji wan nehat xwestin ku ew bibin tirk û musulman jî. An ku hevwelatîbûna ne-musulmanan her tim li ser kaxizê ma. Di vê çarçoveyê de ne pişavtin, lê belê cudagerî bû para hevwelatîyên ne-musulman û ew di piştî Komarê de hertim tûşî cudagerîyeke kambax bûn. Ew di burokrasîyê de nehatin îstîhdam kirin, milkên wan hatin desteser kirin û herweha bi pogromê re rû bi rû man.

Ev serpêhatî nîşan dide ku di destûrên 1924, 1961 ê 1982ê di yekê de jî hevwelatî di çarçoveya huquqî-polîtîk de nehat dîtin. Pêşnîyara siyaseta kurdî jî guhertina vê feraseta hevwelatîbûna bi naveroka çandî ya bi naverokeke huqûqî ye. Lewma siyaseta kurdî daxwaz dike ku gotinên wekî *tirk, tirkîtî, hevwelatîyên tirk* û hwd. ku di destûrê de gelek caran derbas dibin, werin rakirin û destûr ne ji mafên tirkan, lê belê ji mafên hevwelatîyan behs bike. An ku siyaseta kurdî dixwaze ku destûra nû nebe destûra tirkan, lê belê destûra hevwelatîyan.

## CHP, MHP û AKP li ser pirsa hevwelatîyê

MHP bi awayekî bêtawîz, CHP jî bi awayekî şermokî li dij vê pêşnîyara hevwelatîbûnê ya siyaseta kurdî derdikevin. MHP israr dike ku di destûrê de tirk û yên tirkbûyî bibin xwedî îmtîyazan, CHP jî di şiroveyên klasîk de israr dike û dibêje feraseta hevwelatîyê ku di destûrê de ye, ne pişavker, ne jî cudager e û dibêje divê di şûna hevwelatîyeke huqûqî tirkbûneke huqûqî di destûrê de bimîne. Li gor MHPê yeksanîya huqûqî bi tenê mafê tirkan û tirkbûyîyan e. CHP jî îddîa dike wateyeke etnîk, an jî çandî ya tirkbûnê nîne û tirkbûn û hevwelatîbûn divê wekî hev bimînin.

Tevî dijderketinên MHP û CHPê weha xuya dike ku AKP li dij nûkirina feraseta hevwelatîbûnê dernakeve. AKP naxwaze ku ji têgiha neteweya tirk berde, lê belê qebûl dike ku di destûra nû de feraseteke weha ya hevwelatîyê hebe, ku ji naverokeke etnîkî û olî were safî kirin. AKP, ji MHP û CHPê cudatir pêşnîyar dike ku hevwelatîbûn wekî nasnameyekê bila were nas kirin. Ev yek nîşan dide ku dê di warê ji nû ve tarîfkirina hevwelatîyê de navbera AKP û siyaseta kurdî de nêzîkbûnek çêbibe.

Daxwaza siyaseta kurdî a di çarçoveya gotûbêjên li ser destûra nû de jî statuya kurdan e. Madeya 42. a destûra niha qedexe dike ku kurdî di perwerdehîyê de were bi kar anîn. Lê belê siyaseta kurdî daxwaz dike ku kurdî him bibe zimanê perwerdeyê, him jî bibe zimanê fermî yê herêmî. Siyaseta kurdî wê bawerîyê derdibire ku heger weha nebe kurdî dê nikaribe derbasî nifşên dahatî bibe. Siyaseta kurdî li dij wê yekê dernakeve ku tirkî wekî tenha zimanê fermî yê dewletê bimîne, lê belê kurdî divê ne bi tenê ji dibistana seretayî heta zanîngehê were bi kar anîn, lê herweha wekî zimanê fermî yê wan herêman were nas kirin, ku kurd lê piranî ne.

## Statuya zimanê kurdî di destûra nû de

Li hember van daxwazên zimanî yên siyaseta kurdî, MHP bikaranîna zimanê kurdî ya wekî zimanê perwerdeyê li alîyekî, naxwaze ku ew di dibistanan de jî were hîn kirin. MHP îdîa dike ku heger ev daxwazên siyaseta kurdî werin qebûl kirin, welat dê parçe bibe. CHP û AKP jî li hember daxwazên zimanê perwerdeyê û zimanê fermî yê herêmî yên siyaseta kurdî lîberalbûneke nû pêşnîyar dikin, ku kurdî bi tenê di dibistanan de were hîn kirin. Her du partî jî naxwazin ku kurdî bibe zimanê perwerdeyê, yan jî zimanê fermî yê herêmî. Heger daxwazên zimanê perwerdeyê û zimanê fermî yên siyaseta kurdî neyên nas kirin û bi rastî jî kurdî nema bikaribe derbasî nifşên dahatî bibe, wê demê ev encam derdikeve holê: AKP û CHP dixwazin wê siyaseta pişavtinê, ku Komar ev heştê sal in hewlê dide bi darê zorê bisepîne, di maweyeke dirêj de bêyî ku darê zorê hebe, bisepîne.

Sêyem daxwaza mezin a siyaseta kurdî jî xweserî ye. Ev demek e ku siyaseta kurdî di bin navê ***xweserîya demokratîk*** de daxwaz dike ku mafê kurdan ê birêvebirina xwe bi xwe were nas kirin. Ev yek car caran vediguhere pêşnîyareke konfederasyoneke xwedî hêz, asayîş û rêxistina dîplomasîyê jî xuya ye ku pêşnîyara xweserîya demokratîk a siyaseta kurdî di asta herêmî de ye û ji bilî ewlekarî, dîplomasî û darayîyê di qadên din de qanûndanêrî û birêveberî di destê herêmê de be. Heger zimanê neasayî, ku siyaseta kurdî carina bi kar tîne, li alîyekî were hiştin, dikare were gotin ku ev daxwaz bingeha esasê Kurdistaneke xweser pêk tîne. Aşkere ye ku siyaseta kurdî dixwaze ku hevwelatîyên kurd bi destê parlamentoyeke herêmî, Kurdistanê bi rê ve bibin.

Daxwaza herî radîkal a siyaseta kurdî, ku di çarçoveya destûra nû de pêşnîyar dike, ev e. Ji bilî kurdan tu aktoreke siyaseta Tirkîyeyê bi germî nêzî vê daxwazê nabe. MHP bilêvkirina pêşnîyareke weha, xeternak dibîne. CHP û AKP dibêjin qîma xwe bi birêvebirineke dûrî xweserîyê bînin. Her du partî jî di esasê de dixwazin bêyî ku wesayeta birêveberîya navendî ya li ser birêveberîyên herêmî were rakirin, herêman hêzdartir bikin. Herdu partî piştgirîyê dikin ku hin faalîyetên îcrakirinê derbasî birêveberîyên herêmî bibin, lê destûra wan a qanûndanînê nebe. Şertê Xweserîya Birêveberîyên Herêmî ya Ewropayê him ji bo CHP û him jî ji bo AKPyê di rêya herêmîbûyînê de çarçoveya destûra nû pêk tîne.

## Îhtîmalên destûra nû

Him daxwazên siyaseta kurdî û him jî helwêstên aktorên sereke yên li hember van daxwazan nîşan didin ku îhtîmal gelek qels e ku di van rojan de siyaseta Tirkîyeyê destûreke nû çêbike, ku bikaribe ji daxwazên siyaseta kurdî re bibe bersiv. Helwêstên her çar aktoran aqûbeta maceraya pêkan a guhertina destûrê weha nîşan dide.

Di vî halî de dem dê nîşan bide gelo siyaseta Tirkîyeyê dê bikaribe îhtîmaleke pêncem derxe yan na.

1 AKP û MHP dikarin destûrekê çêbikin, ku statukoya heyî biparêze, lê belê bi demokratbûneke qismî hêza burokrasîyê hinekî teng bike. Ev yek tê wateya destûreke ***nû*** ya ***ne-nû***. Lê belê ji ber ku Tirkîye dê destûra nû gotûbêj bike, ev yek îhtîmaleke hêzdar e

2 AKP û CHP dikarin destûreke nû çêbikin, ku nehêle kurdî bibe zimanê perwerdeyê û zimanê fermî, lê hinekî din serbest be û şaredarî werin hêzdar kirin. Lê belê him ji ber ku CHP piştgirî nedayîna AKPê, di her mijarekê de ji xwe re kiriye siyaset û him jî CHP tu caran piştgirîyê nede guhertineke lawazkirina wesayeta burokrasîyê, ku AKP dixwaze bike, ev îhtîmala duyem qels e

3 AKP û siyaseta kurdî di warê nermkirina daxwazên siyaseta kurdî û berfirehtir kirina pêşnîyarên AKPê de li hev bikin, dikarin destûreke nû çêbikin. Lê belê weha xuya dike ku ne niyeta siyaseta kurdî ya lihevkirineke digel AKPyê heye, ne jî niyeta AKPyê heye ku cudahîyên navbera xwe û siyaseta kurdî ji holê rake. Ev îhtîmala sêyem jî qels e

4 Di rewşeke weha de îhtîmaleke çarem jî ev e: Meclisa niha nikare destûreke nû çêbike. Herçend ev yek ji bo niha wekî îhtîmala herî hêzdar xuya dike jî, him fişara meseleya kurdî, ku her ku diçe zêde dibe, him jî daxwaza AKPyê ya ji bo lawazkirina wesayeta burokrasîyê vê îhtîmalê jî qels dike

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Dê**, kolaj, 60 x 44 cm

www.arsivakurd.org

# Ragehandina dewleta kurdî (Dewama rûpela 1)

derbas nebû. Ji ber hindê jî Îraq wek dewlet neşîya bibe dewleta hemû pêkhateyên di nav sînorên xwe de û derbirînê ji hezên wan bike.

Qonaxa duyê ya avabûna dewletan encama şerê duyem yê cîhanî ye ku piranîya van dewletan li Ewropayê ji egera serkeftina Yekîtîya Sovyetan, hatine ava kirin. Anku avabûna van dewletan di nav sînorên nû de, ne ji encama heza netewe û gelên van dewletan bû, belkî encama peymana aştîyê bû di navbera serkeftîyên şerî de; wek Yekîtîya Sovyetan, Amerîka û Brîtanya. Piştî nemana Yekîtîya Sovyetan guherînên mezin di nexşeya dewletên ewropî de çêbû; herdû dewletên alman yek girt û bûne dewletek, lê Çekoslavakya bû du dewlet (Çek û Slovakya) û gelek dewletên dî yên neteweyî; Ermenistan, Azerbêcan, Gurcistan, Ukrayna û hwd... ava bûn. Ji dewleta Yugoslavyayê ya pirnetewe pênc dewletên neteweyî ava bûn. Qonaxa siyê ya avabûna dewletên neteweyî ji piştî şerê cîhanî yê duyê ta dawîya sedsala çûyî ye. Piranîya dewletên di vê qonaxê da ava bûne, encama bizavên çekdarî yên pêşkeftinxwaz bûn; bi taybetî jî li Afrîka û Amerîkaya Latîn. Ev jî pirtir berhemê "şerê sar" yê di navbera herdû zilhêzên mezin ên cîhanî de bû; Amerîka û Yekîtîya Sovyetan. Di vê qonaxê de Yekîtîya Sovyetan di rizgarbûn û avakirina form û dewletên nû û di piştevanî û arîkarîya bizavên çekdarî yên pêşkeftinxwaz de xwedî roleke mezin bû.

### Piştî hilweşîna Yekîtîya Sovyetan, awayê damezirandina nû ya dewletan

Piştî nemana Yekîtîya Sovyetan û bi wê ra jî nemana şerê sar û herwesa nemana hevdijîya îdeolojîyên rast û çep, şêweyekê nû yê damezirandin û avabûna dewletan di rojeva siyasetê de peyda bû. Ev şêwe jî pirtir girêdayî dîplomasîya navneteweyî ye. Anku êdî nema şerên cîhanî yên mezin, yan jî alîgirîya zilhêzeka cîhanî dibin egera avabûna dewletan, belkî siyaset û dîplomasî û berjewendîyên deverî û navneteweyî dibine rêxuşker û palpişt bo damezirandina dewletên nû. Gumanbar e ku mercên navxoyî yên mîna aborîyeka bihêz hokarên girîng in ji bo avabûn û serxwebûna dewletekê. Mînak ji bo şêweyên van dewletan jî Tîmura Rojhelat û herwiha jî Sûdana Başûr e dema bûn dewletên serbixwe û piranîya dewletên cîhanî bi vê dewletbûnê mukirhatî.

Xwendineka dîrokî di prosesên avabûna dewletan da me vedigerîne her du şerên cîhanî û hevrikîya zilhêzên mezin ku bûne hokar û egerên girîng yên avakirina dewletên neteweyî, bi taybetî jî li Rojhelatê Navîn. Îraq wek dewlet berhemê, yan jî destkirda kolonyalîzma îngilîz e. Îraq di sinorên xwe yên evro da li dûv berjewendîya siyaseta îngilîz bo neteweya ereb, bi taybetî jî tayîfa sunnî, li ser hesabê neteweya kurd hatiye çêkirin. Di dirêjahîya dîroka dewleta Îraqê da ji egera siyaseta regezperestî ya erebî, kurdan nekarî bibin parçeyekê wekhev ya pêkhateya vê dewletê. Ereban wek neteweyê serdest, xwe wek xudanên dewleta Îraqê zanîye û siyaseta dewletê li gor berjewendîyên xwe bi rê ve biriye. Kurdên Îraqê wek gelekê parçekirî xebata siyasî û ya çekdarî ji bo parastina xwe û li dijî qirkirina xwe kiriye.

Ragihandina dewleta kurdî, yan jî baştir e em bêjîn damezrandina dewleta kurdî, çunkî ragihandin wê wateyê nade ku bi tenê bi ragihandinî dewlet çêbû û cihê xwe di sîstema siyasî û malbata dewletan da girt. Ragihandina dewleta kurdî (yekalî) ji alîyê serokatîya kurdî ve -bêyî dan û standinên digel Bexda, Enqere, Tehran û Şamê, yan jî bêyî dîtinên erênî ji van dewletan- ne di cihê xwe de ye û nayê hesibandin wek ragihandinek bi biryareka hizirpêkirî û bi pîvanên siyasî û dîplomasîyê. Avabûna dewleteke nû wateya têkdana sînorên cografîk yên dewleteke dî ye. Di mînaka me da ku "Dewlete Kurdî" anku kurdên başûr ji dewleta Îraqê vediqetin (Îraq parçe dibe) û dewleteke dî ji alîyê aborî, siyaseta avê û kartêkirina deverî û navneteweyî ve hevrika Îraqê ava dibe. "Dewleta Kurdî" ya ji cografyaya Kurdistana Başûr pêk tê, dê kartêkirinê ne bi tenê li ser pêkhateyên neteweyî û tayîfî yên dewleta Îraqê, belkî li ser dewletên cîranên Îraqê û "Kurdistanê" jî bike. Ji ber vê yekê jî gelek girîng e nûnerên kurdan bi dîyaloga siyasî û dîplomasî ber bi prosesa avakirina dewleta kurdî ve here. Hemû siyasetmedar û bisporên siyasî li ser wê yekê li hev dikin ku di siyasetê da hevalbendên herdemî nînin, belkî berjewendîyên siyasî, stratejîk û aborî giranîya siyasetê dest nîşan dikin û biryarên siyasî digihînin hev. "Dewleta Kurdî" bi biryarên nihênî û dûr ji dîplomasîyê nikarî bê ava kirin. Mînaka dewleta Qibrisa Tirkî hê jî li pêş çavên me ye, ku ta niha bi tenê Tirkiyeyê ew nas kiriye û Qibrisa Tirkî neketiye ser nexşeya dewletên cîhanî.

Gumanbar e ku ji ber sedema şoreşên azadîyê yên "Bihara Erebî" sîstemên siyasî yên dewletên Rojhelatê Navîn ketine nav guherînên bingehîn. Herçende motora şoreşên Bihara Erebî pirtir gencên ne siyasî bûn û çi îdeolojî, yan jî rêxistinên siyasî serkêşîya wê nedikirin jî, Îslama Siyasî şîya feyde ji van guhurînan werbigre û bêyî awarte li hemû dewletên ku şoreşên Bihara Erebî bi ser ketiye, di hilbijartinan da serkeftinê bi dest bixe. Ev jî bûye sedemeke girîng a tirsê bo desthilatdarên deverê, dewletên ewropî, Amerîka û Rusyayê. Û weha hevpeymanî û hevalbendî li ser bingehê berjewendîyên hevpar pêk hatin; Amerîka, Ewropa bûne piştegirên dewletên Kendava Farisî û bi yek dengî beramberî Sûriye, Îran bi piştevanîya Rûsya û Çînê rawestiyan. Û weha Rojhelatê Navîn bûye meydana hevrikîya zilhêz û berjewendîyên hevpar û hevdij. Ev hevrikî û tirs dikarin derî li dewleta kurdî vekin, lê di heman demê da jî dikarin derî lê bigirin jî. Heke kurd şîyan xwe wek alternatîfeke demokrasî û mînakeke baş a rêvebirinê bidin qebûl kirin û berjewendîyên aborî û siyasî yên dewletên xudan biryar û hêz biparêzin, dikarin piştgirîya dewletên cîhanî bi dest bixe. Siyaset danûstandin e, anku tu di rewşeke lihevhatî de hindek tiştan didî yê beramber xwe û hinek destkeftan bi dest dixî. Anku danûstandin ne bi tenê bi wateya dîyalogê, belkî bi wateya dana hindek soz û tiştên destgir beramber bidestxistina hindek destkeftên siyasî û dîplomasî. Bêguman ser asta Îraqê, deverê û navneteweyî. Bi vî awayî xewna "Dewleta Kurdî" dikare bibe rastî.

### Stratejîya damezirandina dewleta kurdî

**Civaknasê navdar ê Îraqê Alî al Werdî sala 1982yê di civîneke taybet de li ser dîtina xwe bo paşeroja Îraqê weha bersiv da: "Îraq dê bi tenê li ser sê (pêkhate) yan berdewam be. Kurd di çarçovê dewleta Îraqê de namînin û di paşerojê de dê serbixweyîya xwe bi dest xin. Û şîe nema hevwelatîyên pila duyem dimînin û sunnî jî ji destberdana desthilata Îraqê qebûl nakin".**

Bi ya min baştirîn analîza li ser Îraqê ye ji bisporekê mezin ê dîroka civaka îraqî ya nû.

Hilweşandina dewleta Îraqê di 09.04.2003yê de girîngtirîn û mezintirîn rûdan e di dîroka nû ya sedsalên çûyî ya desthelatdarîya Îraqê. Vê rûdana bingehîn rê û derî li gelek dîtin, şirove, ezmûn û hevrikîyan re vekir û hêj jî dumahîya wan nêzîk nebûye. Gelek senaryo bo paşeroja Îraqê hatine şirove kirin û derî li desttêwerdana deverî û navneteweyî vebûn û bo meydana hevrikîyên siyasî, tayîfî û neteweyî. Îraq wek dewlet niha di lawaztirîn qonaxa desthilatdarîya xwe de ye.

Îraq ew dewleta bi darê zorê ji layê Îngilîzan ve sala 1921ê hatiye damezirandin, nekarî di dîroka xwe ya 90 salên bihurî de bi wekhevî bibe dewleta kurdên Îraqê jî ku derbirînê ji daxwaz û mafên wan yên neteweyî bike. Ev jî bo sedema wê yekê ku kurd vê dewletê wek ya xwe nebînin û bi hemû rengên xebatên siyasî û çekdarî daxwaz û berevanîya mafên xwe yên neteweyî bikin.

Stratejîya **Şêx Mehmud**î bo dirustkirina qebareyeke kurdî xwe di cografyayeke teng û xelekên siyasî yên dûr ji realîteya siyaseta navneteweyî didît. Ji ber hindê jî vê bizavê nekarî nûnerîya tev texên civaka kurdî û hemû cografya Kurdistana başûr bike û bi ser keve.

Partîya ***Hîwa*** wek yekemîn rêkxistina siyasî ya kurdî tê hesibandin ku ji hemû Kurdistana başûr endam û alîgir himbêz kiribûn û karibû nûnerîya hemû kurdan bike. Herçend ev rêkxistin salên 1943-1945ê bibû baskê siyasî yê bizavên çekdarî yên ***Barzan***, lê dîsa nekarî serkêşîya bizava rizgarîxwaz a gelê kurd bike.

***Partîya Demokrat a Kurdistanê*** karî nûnerîya hemû tex û hemû cografyaya ***Kurdistana Baş***ûr bike û stratejîyeke yekgirtî ji bo daxwazên gelê kurd darêje. Ji ber siyaseta şoven û neteweperst ya dewletên Kurdistan dagîrkirî, stratejîyeta bizava rizgarîxwaz a kurdî ji 1961- 1991ê xwe di otonomîyê (rasteqîne) de bo Kurdistanê didît û paşê jî demokrasîya ji bo Îraqê lê hat zêde kirin. Bizava rizgarîxwaz a kurdî -Partî (**KDP**) û paşê jî Yekîtî (**YNK**) û rêxistinên din- ji ber dorpêçkirina Kurdistana Başûr ji alîyê her çar dagîrkeran ve û parvebûna cîhanê bi ser du zilhêzên mezin ve, delîve nedîtin ku di vê qonaxê de di warê mezinbûn û pêşkevtinê de stratejîyeteke serbixwe û dûr ji kartêkirinên siyasetên deverê û navneteweyî çêbikin. Di warê dîplomasîyê de gavên pêwîst nehatin avêtin da ku di siyaseta navneteweyî da deng û daxwazên gelê kurd bigehînine cîhana ji derve û hevalbendan bo stratejîya siyaseta kurdî peyda bikin. Ta serhildana 1991ê jî firset bo bizava kurdî nehatibû dan bi fermî, yan jî nefermî nûnerîtîya xwe li dewletên ewropî dest nîşan bikin. Em dikarin bêjîn ku bizava kurdî bi taybetî û gelê kurd bi giştî di nav siyaset û alîyên bitesîr yên li Ewropa Rojhelat u Rojava xebata lobîyê nekirin.

Serhildana Kurdî ya adar a 1991ê di rewşeke gelek erênî û lihevhatî de rû da; ew Îraqa ku hemû dewletên cîhanê li dijî Îranê piştgirîya wê dikir, ji nişkê ve bi dagîrkirina Kuwêtê hemû cîhan kir dijminên xwe û bi yek rêzî li dijî wê rawestiya. Sedem jî nemana "Şerê Sar" û siyaseta hevdij ya her du zilhêzên mezin ên cîhanî; rojhilat bi serokatîya Sovyetê û rojava bi serokatîya Amerîka bû ku ta sala 1991ê jî li dûv teorîya *"dijminê dijminê min hevalê min e";* dema dewletek li dijî zilhêzekê bûya, zilhêza dî bêyî virde wirde dibû hevalbendê wê û piştgirîya wê dikir.

### Kurd jî dikevin nav meydana lîstikên siyaseta deverê û cîhanê

Di vê rewşa lihevhatî ya li deverê kurd wek hêzeka nû ya di warê rêvebirinê û dîplomasîya siyasî de kêm tecrube, hatine nav lîstikên siyaseta deverê û cîhanê. Dewletên erebî û her çar dewletên Kurdistan parçe kirine jî di dorpêçkirina pêkolên siyasî yên bizava kurdî de kêmtirxemî nekiriye. Herçend xalên hevpar di navbera Îran, Îraq, Tirkîye û Sûrîyeyê de gelek kêm bin jî, lê dîsa di siyaseta qelskirina bizava kurdî de digehin hev.

Lê belê piştî nemana rejîma **Seddam**î sala 2003yê kurdan karî bibin hêzeke aborî; pêşîyê faktoreke girîng a aborîya deverê û paşî jî ya cîhanî. Petrol di rojeva siyaseta cîhanî de hokareke girîng a destinîşankirina giranîya siyasetê ye. Kurd wek xwedî petrol dikarin di siyaseta aborîya cîhanê de bi roleke mezin rabin. Lê mixabin me bisporên aborîya siyasî û bi taybetî jî yên petrolê nînin û heke me hebin jî bê ezmûn in û nikarin bi hostayî siyaset û lîstikên siyaseta aborîya petrolê bi kar bînin.

Wek neteweyek bê dewleta nete-weyî, di çerxê globalîzma aborî û ragihandinê de pêwîstîya wan bi stratejîyeke xwedî giranî, çir û pir, întensîv û domdar heye da ku kurd bikaribin di paşerojê de bikevin rojeva siyaseta cîhanî. Lewra di warên siyaseta navxuyî, deverî û cîhanî de pêwîstîya me bi dezgehên stratejîk heye ku di demên pêwîst de bikaribin bersiva berhevkirî bidin. Wek mînak gelek girîng e ku dezgeheke me ya pirsên federalîzmê hebe ku hemû pirsên peywendî bi herêmê û Îraqê ve heye himbêz bike û bersiv û çareyên rojane bo rojeva siyaseta Îraqê dest nîşan bike. Herwesa jî înstîtuyek bo pirsgirêkên deverê û bi taybetî jî yên peywendî bi cîranên herêmê ve hebin. Dezgeheke din ya akademîk dikare çavdêrîya siyaseta navneteweyî bike, dîtin û livînên siyasî û aborî yên li cîhanê şirove bike. Ev dezgeh dikarin bi riya bisporên kurd û yên bîyanî di demên pêwîst da, di wergirtina biryarên girîng ên çarenivîsê da harîkarîya siyaseta kurdî bikin. Divê dezgehek hebe ku kêmasîyên di warê bisporîyê de dest nîşan bike û bi şarezayî kesên hejî ji bo bisporîyên taybetî perwerde bike.

Da ku em bikaribin pirsa kurdî bi şêweyekê akademîk û rast û dirust bigehînin navendên lêkolîn û zankoyên cîhanî, pêwîstîya me bi stratejîyeke nû ya dirustkirina navendên lêkolînên kurdî li zankoyên cîhanî û dewletên girîng ên siyasî û aborî heye. Ev navend dikarin bala bi hezaran xwandevanên bîyanî bikêşin ser lêkolînên kurdolojî ku siyasetê, dîrok, ziman, edebiyat, civaknasîyê û htd. himbêz dike. Û weha dê bi hezaran lêkolînên zanistî û akademîk bikevin ber destên xwandevan û lêkoler û bisporên cuda yên siyaset, aborî, ziman û dîrokê. Ev xwandevan paşerojê dê bibin bisporên kurdnasîyê û dikarin agahdarî û şiroveyên rast li ser kurd û Kurdistanê bigihînin raya giştî ya dewletên xwe. Li gor agahdarîya min ta niha sê navendên lêkolînan li Amerîka, Brîtanya û Almanyayê hatine damezirandin. Lê pêwîstîya me bi dehan navendên bi vî rengî heye. Dewletên mîna Turkiye, Îran û dewletên erebî bi dehan navendên bi vî rengî di nav zanîngeh û derveyî zanîngehan hene ku wek stratejîyek siyasî xizmeta siyaseta van welatan dikin.

Bo piştevanîya aborî û diravî ya xwendevanan jî divê dezgeheke arîkarîya xwendevanên bîyanî, yên ku dixwazin di van senterên kurdolojîyê de bixwînin, yan jî bisporîya wek master û doktorayê li ser kurdan bikin, bê damezirandin ku arîkarîyeke mehane bidene wan xwendevanan yên ku destê wan teng e û nikarin arîkarîyê ji çi cih û dezgehên din werbigirin. Piştevanîya diravî bo van xwendevanan dê bibe sedemeke girîng a exlaqî ya girêdana van bisporan li beramberî kurdan û êdî ne bi tenê çîya hevalên kurdan bin.

Di prosesa stratejîk ya neteweyî de avakirina dezgehên lobîyê û bihêzkirina lobîyê xwedî roleke gelek mezin e. Eger lobîyeke bihêz a cihûyan li Amerîka û dewletên rojava nebûya, dewleta Îsraîlê ava nedibû û



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Birçîbûn**, teknîka tevlihev, 96 x 72 cm



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Alozî II**, teknîka tevlihev, 52 x 31 cm

nedikarî bijî. Divê lobî wek faktoreke girîng a stratejîya siyaseta kurdî bê nasîn û ehemîyet pê bê dan Ji bo me kurdan du alîyên vê yekê hene: Dost û hevalên kurdan yên bîyanî û revenda kurdî li welatên cîhanê. Rola "dayîka kurdan" **Danielle Mitterrand** li bîra me hemûyan e ku çi xizmeteke mezin bo kurdan kiriye. Aktîvkirina dostên kurdan bo dirustkirina lobîyekê dikare piralî be; wek dirustkirina civak û komeleyên dostanîya kurd û almanan, yan jî komeleyên arîkarîya civakî û dirustkirina pirên kulturî bi riya semîner û programên edebî û hunerî li Kurdistanê û li welatên bîyanî. Damezirandina dezgehekê çap û belavkirina zimanên bîyanî li Ewropayê, da ku ew berhemên kurdî yên wergerînin ser zimanên bîyanî, çap bikin, belav bikin û herweha berhemên nivîskar û bisporên bîyanî li ser kurdan bêne çap kirin û arîkarîya wan nivîskaran bê kirin.

Revenda kurdî eger bi aqilane bê rêk xistin, dikare roleke mezin di dirustkirina lobîyekê xwedî tesîr a kurdî de hebe. Hikumeta Kurdistanê divê wekî hemî gelên din, xwandingehên kurdî li Ewropayê veke û piştgirîya diravî ya navendên kulturî û komeleyên kurdî bike, da ku ev komele bikaribin bi rolê xwe yê civakî û neteweyî rabibin û pirekê di navbera revenda kurdî li derve û Kurdistanê bê çêkirin û ev revend bi Kurdistanê û bi siyaseta kurdî ve bê girêdan. Niha li Swêdê, Brîtanya û Almanyayê bi dehan kurd ji bo parlemanên navendî û deverî yên van welatan hatine hilbijartin, dikarin wek lobîyeke kurdî li ser cihên biryardanê xwedî roleke mezin bin. Ciwanên tirk, ereb û ermen karîne lobîyeke bihêz ji revenda xwe çêken. Kurd dibêjin ***"nezanî çav da cîranî"***. Dewleta kurdî bêyî stratejîyeke kurdane nikare bikeve ser nexşeya dewletên cîhanî.

## Sîstema dewleta kurdî çi be?

**"Yê libnanî dewletek divê, yê sûrî ne piştrast e ji tirsa dewleta xwe û yê îraqî nema dikare li dij zordarîya dewleta xwe îdare bike. Yê yêkê li dewletekê digere, yên din dixwazin ji dewleta xwe rizgar bibin. Yê yekê li dewletekê digerîya da şer û xwînrêtin bi dawî bên, yên din dixwazin dewletek hebe da ku nûnerîya wan bike ...".**

**Xessan Selame** weha di pirtûka xwe ya bi navê "***Dewlet û Civak li Rojhelatê Erebî"*** ku li sala 1987ê derketiye, bo me tirsa civakê ji şerên navxweyî û ji desthelata dewletê ya diktator bi mînak û pesnên ciwan cuda dike. Ev derazînk me dibe nav mijareke gelek girîng ya rêvebirina dewletê, ew jî sîstema birêvebirina dewletê ye. Kîjan sîstem ji bo kîjan civakê baş e.

Felsefa wateya dewletê ew e ku derbirînê ji daxwaz û pêdivîyên hemû hevwelatîyên xwe bi awayekî wekhev bike; dûr ji bîr û boçûn, îdeolojî, cudahîyên neteweyî, olî û tayîfî û nûnera hemû kategorîyên civakê be. Ev tarîf wek teorî gelek sade û xweş e û têgihiştina wê pir bi sanahî ye, lê di warê praktîzekirinê de gelek dîtin û şirove yên cuda jê diçin. Hemû curên sîstemên siyasî xwe di vê tarîfê de dibînin û wî mafî didin xwe ku nûnerîya hemû civakê dikin, vêca çi sîstemên komarî, yekpartîtî, diktatorî, demokrasî, federalî, yan jî melikî bin.

Piştî şerê cîhanê yê yêkê û hilweşîna Împaratorîya Osmanî hizra neteweyî li Rojhelatê Navîn xurt bû; gelek partîyên neteweyî hatine damezirandin û di encamê de gelek dewletên li ser bingehê îdolojîya neteweyî yên berteng bi riya cuntayên eskerî wek li Misir, Îraq û Sûriyê hatine damezirandin. Lê ev dewletên li ser bingehê îdeolojîyeke neteweyî hatine ava kirin, neşîyan bi wekhevî nûnerîya hemû xelkî bikin û ber bi diktatorîyê û sîstemên yekpartîtîyê ve çûn û wek pêwîstîyeke serdemî neşîyan digel guherîn û pêşkeftinên cîhanî biçin; ji ber hindê jî helweşîyan. Mînak jî Îraq û Misir in û Sûriye mînakek zindîtir e.

Şiroveyek siyasî ji bo dewletên neteweyî me digehîne wê encamê ku wateya sîstema van dewletan ev e: Li diktatorîya yek partî desthilatdar e, hizrên neteweperestî serdest in, azadîya dîtin û hizrên dî nîne û azadî û mafên derbirînê sînordar in. Ev dewlet hemû sîstemên komarî bûn û desthilat di destê kesekî bi tenê da bû; parleman û hikûmet êxsîrên desthilata serokî bûn. Lewra sîstema komarî wek ezmûneke reş nikare bibe mînakek ji bo birêvebirina dewletê.

Piştî nemana ***Yekîtîya Sovyetan*** îdeolojîya sosyalîzmê kiz bû û dewletên sosyalîst wek kevirên domînoyê yek li pey yekê hilweşîyan. Valatîyek hizrî, yan jî ya îdeolojî li hemû cîhanê û bi taybet jî li Rojhelatê Navîn çêbû. Vê sîstemê jî wek îdeolojîyeke bîyanî û dûr ji nirxên civakên rojhelat, neşîya berdewamîyê bi hebûna xwe bide. Piştî nemana van her dû sîstemên siyasî yên birêvebirina dewletê, valatîyek îdeolojîk li deverê çêbû û encamê wê jî bi hemû giranîya xwe ya hizrî ve xurtbûna Îslama siyasî ye. Tirkiye, Tûnis û Misir mînak in bo vê perîyodê, yan jî bo vê sîstema birêvebirina dewletê bi rengên xwe yên cuda.

Encamên hilbijartinên vê dawîyê li Tirkîye, Tûnis û Misirê serkeftina Îslama siyasî bûn; bi parlemanek û hikûmeteke bihêz û serokê dewletê yê desthilata wî sînordarkirî. Anku li cîhanê û hemû devera Rojhelatê Navîn sîstemên komarî ji nav çûn, yan jî lawaz bûn. Ev guherîn ji egera tirsa desthilata bêsînor ya dîktatorîya serokê dewletê û sîstema komarî çêbûn. Kombûna gelek desthilatan di destê kesekî da metirsîya çêbûna diktatorîyê gelek pirtir dike. Mirov dikare bêje ku sîstemên komarî li Rojhelatê Navîn peywendîyeke xurt bi diktatorîyê ve heye. Her ji ber vê tirsê jî li cihê sîstemên komarî, sîstemên demokrat bi hilbijartin û parleman û hikûmetên bi desthilat hatine damezirandin û sînorên desthilata serokan hatine biçûk kirin. Li cîhana rojava bi tenê sîstema Fransayê komarî ye û serok xwedî desthilateke mezin e. Dewletên Yekgirtî yên Amerîkî jî herçende sîstemek federalî ye jî, serokî desthilatên mezin hene. Lê ev nayê wateya ku desthilata hikûmetê û ya parlemanê lawaz e, berevajî belkî parleman desthilata serokî kontrol dike û beşdar e di wergirtina hemû biryarên girîng da. Eger sîstema komarî, anku ya serokatîyê metirsîya çêbûna diktatorîyê hebe, ka kîjan sîstem bo me wek kurd baş e?

## Serok û parleman û hikûmet

Em hemû li ser pirsa demokrasîyê hevfikir in û me bawerî bi hilbijartinan heye. Demokrasî bi xwe jî proseseke dirêj û pirseke rêjeyî ye. Herweha demokrasî xwedî gelek reng û dengên cuda ye. Lê pirsa girîng bo me kurdan ew e; erê em kîjan sîstema birêvebirina dewletê hilbijêrin? Em çi hilbijêrin? Parlemanî û bi wê jî hikûmetê, yan pêşîyê serok û paşê hikûmetê? Yan jî her duyan hilbijêrin? Ji ber nebûna destûrekê li Kurdistanê tevlihevîyek di nav sînorên her sê navendên biryarê da heye. Desthilat û maf û erkên her sê navendên biryardanê nehatine dest nîşan kirin. Herçende herêma Kurdistanê parçeyek e ji sîstema dewleta federalî ya Îraqê, lê cudahîyeke mezin di navbera şêweyê rêvebirina li Hewlêrê û Bexdayê de heye. Bexda ku paytextê Îraqa federalî ye, serokê hikûmetê pirtir wek hikûmeteke navendî serederîyê digel hemû Îraqê dike. Li Îraqê serok nahête hilbijartin û parleman serok hildibijîre, lê li Kurdistanê serok dihête hilbijartin û ev jî pirtir li gor sîstemên komarî ye. Çunkû wateya hilbijartina serok şûna parleman û hikûmetê pirtir desthilatê dide serok. Kurdistaneke bi dijminan dorpêçkirî zêdetir sîstemeke komarî himbêz dike, yan jî sîstemeke parlemanî, ku hemû desthelat di destê parlemanê de ye? Civandina gelek desthilat û hêzan di destê kesekî da metirsîya dirustbûna diktatorîyê mezintir dike. Lê lawazîya desthilata navendî di civakên rojhelatî da dibe sedema tevlihevîyê û windabûna heybeta dewletê, mînak jî Misir û Lîbya ne. Sîstema parlemanî bi xurtkirina dezgehên çavdêrîyê, dezgehên qanûnî û hukumî dikare bibe mînakeke baş bo birêvebirina Kurdistana me. Parleman bi riya hilbijartinan meşrû dibe û dibe navend û bingehê sîstemê birêvebirinê. Parleman çavdêrîya wê hikûmetê dike ya ku parlemanê ew bi dengdana xwe damezirandî.

Gumanbar e heke em bêjin "komara Kurdistanê" yan "komara kurdî", hingê pêwîst e serokê wê komarê jî hebe. Lê pirsa girîng li vir ev e; bi kîjan desthilatê? Navê dewletê şêweyê rêvebirina dewletê nîşan dike. "komara kurdî yan dewleta kurdî" wateya dewletek neteweyî dide, ev jî tirsekê ji bo cîran û wan neteweyên di nav sinorên Kurdistanê da dijîn wek ereb, turkmen û kild û aşûrî peyda dike û hingê ev hemû pêkhate xwe di nav vê dewletê da nabînin. Wek dîrokê jî xuya kiriye, dewletên neteweyî ne bê alozî û pirsgirêk in. Lê "dewleta Kurdistanê, yan komara Kurdistanê" dikare hemû pêkhateyên olî û neteweyî wekhev himbêz bike. Çunkû kurd wek netewe tê hesibandin û Kurdistan wek welat ku gelek netewe û ol di nav sinorên wê da dijîn.

Li vir pêwîst e em li sîstemên melikî yên deverê jî binêrin ku heta niha karîne bi şarezayî xwe ji pêlên şoreşên Bihara Erebî biparêzin. Pirtir jî mînakên Urdin û Mexrib (Maroko). Ebdillayê melikê Urdinê sedemên gendelîyê û xirabîya rewşa aborî dixe ser stoyê hikûmetên cuda yên Urdinê û bi guherîna berdewam ya hikûmetan karîye heta niha xwe ji bahoza guherînan rizgar bike. Mexribê jî karîye carê bi rêformên pêşwext rê li ber pêlên şoreşa Bihara Erebî bigire. Çavdêrên siyasî li ser wê yekê li hev dikin ku serdemê melikî li Îraqê bi berawirdkirin di gel hikûmetên li paş xwe bi tenahîtirîn desthelat di dîroka Îraqê da dihête hijmartin. Ez bawer dikim hizir kirin di sîstemekê melikî da ku helbijartin bingeh be û perleman û hikûmetek xwedî desthelateke bihêz bin û melik jî wek remzek û merce'îyetek (bawer pêkirî) neteweyî be, dê elindên dîtinên me yên siyasî firehtir û mezintir lêket.

Serokatîya kurdî di pirsa biryardana dewletê de dikare bi riya dengdaneka giştî meşrûbûna biryara xwe ji gelê kurd werbigire. Ev hêz û şîyanê dide desthilata kurdî.

Sîstema siyasî, çi komarî, yan parlemanî, yan federalî yan jî konfederalî be, divê destûra Kurdistanê dîtin û xwestekên civaka kurdistanî derbibire da em di paşerojê da nebin êxsîrên vê sîstemê û vê destûrê.

* Berpirsê pêwendîyên derve yê Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê û servîserê kovara Havîbûnê.

Tîpguhezî: Mihemed Çelkî



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Elîyê dingil**, kolaj, 78 x 43 cm

*EDITO*

Qetla heft kesan ji alîyê cîhadîyekî ve ji bo wexteki muweqet bû sedemê derketina ji rojevê ya kampanya serokdewletîyê ya fransî ya li ser mijarên aborî ku di navenda hilbijartinê de cih digirin. Çend hefte piştî hilbijartina 6ê gulanê, serokomarê nû wê tevlî zîrweya G20ê jî bibe. Û yekcar divê ew biryarê bide; ji nûve guftûgo bike, an jî xwe nede ber peymana ewropî ya xwe dispêre zihniyeta rastgirên alman ên ku tê payîn siyasetên kemberşidandinê dijwartir bikin. Riya siyaseta aborî û civakî ya Fransayê jî wê girêdayî vê tercîhê be, lê belê herwiha girêdayî sazbûna ewropî.

## HILBIJARTINÊN SEROKKOMARÎYÊ LI FRANSAYÊ

# Wêrekî yan xetimîn

SERGE HALIMI

Gelo hilbijartinên li Fransayê wê rê li ber guhertina serokkomar veke, bêyî ku bigihêjin armancên dîyarker yên serdema ji sala 2007ê ve destpêkirî? Nobetguhertina siyasî wê ji bo fransîyan bîhnfirehîyekê pêk bîne. Lewma ji bilî şaşîyên ku herî zêde tên zanîn yên serokkomarê dewra wî temam dibe –li her deverî hazirbûna wî, xwederxistina wî ya pêş, jêhatîbûna wî di gotina hertiştî û piştre gotina berevajîyê heman tiştî, heyranîya wî ya ji bo dewlemendan, hema hema biqasî mêyila wî ya ku bêkar, koçber, misilman, yan jî memûran vediguherîne serê gunehan ji bo tevahîya hêrs û ziwêrîyan–, pênc salên bihurîn herweha paşveçûneke demokrasîya siyasî û ya serwerîya gel jî ne.

Piştî referandûma gulana 2005ê namzedên serokomarîyê yên biçin ***Qesra Elysée*** yên du partîyên sereke yên di parlemanê de, muxalefeta piranîyeke fransîyan a li dijî avahîyeke ewropî ya ku tevahîya şaşîyên wê yên sêwirandin îro xwe didin der, nexwestin bibînin. Dengdayîna hilbijartinê bi dengekî nekeve ber nîqaşê di encama guftûgoyeke neteweyî ya kalîteya wê ji kampanyaya hilbijartinê ya niha çêtir, xwe îfade kir. Û serokkomarîya **Nicolas Sarkozy** yê jê dihat hêvî kirin bibe nîşana vegera dilxwazîya siyasî, bi dîyarkirinên mirovan matmayî dihêlin, bi dawî dibe. Li alîyekî tevahîya namzedên çepgir rexneyan li bankeyan digirin, li alîyê din wezîrê aborîyê yê Fransayê xwe lê datîne ku "*mirov fînansê ji xwe re bike hedef, ev yek biqasî ku mirov bibêje 'ez li dijî baranê me', 'ez li dijî sermayê me' yan jî 'ez li dijî mijê me' ehmeqane ye*". Serokwezîr **François Fillon** bi xwe pêşniyazî namzedê *Partîya Sosyalîst* **François Hollande** dike ku "*bernameya xwe ya hilbijartinê bixe ber pîvana Standart & poor'sê*". (1)

Tabîkirina derdorên birêveber ên fransî li "*demokrasîya li gor bazarê*" ementûya îdîakirî ya rastgirîyeke alman a her diçe bêhtir jixwerazî û gewî ye û ev şîar herweha serwerîya gel jî dimehînin, jê kêm dikin. Rakirina vê îpotekê li navenda vê dengdayîna li pêşîya me ye. Û ferz dike ku bêyî virde û wêde şertên nîqaşa ewropî werin danîn. Herkes pê dizane ku bernameyên siyaseta hişk a aborîyê ên ku ji du salan û vir ve bi çavsorî hatin pêk anîn, bi kêrî tu başbûna pirsgirêkên deyndarîyê nehatin –û wê neyên jî– ev bername xwe lê datînin ku dixwazin van pirsgirêkên deyndarîyê çareser bikin. Stratejîyeke çepgir a wê qeyd û benda malî nexe ber lêpirsînê, di encamê de di dewra yekem a hilbijartinan de were mehkûm kirin û têk biçe. Lê belê rewşa siyasî ya ewropî nahêle ku mirov xeyalan bike, ev tişt dikare bê xebat û tekoşîn pêk were.

Halê hazir, herikîna pereyan ku derbxane bi erzanî dide bankeyan da ku ew jî bihatir wan bi deyn bidin dewletan, pêşî li xetimîneke giştî digire. Lê ev mohlet bi tenê girêdayî *Bankaya Navendî ya Ewropî* (ECB) ye ku xwe dispêre "serxwebûneke" ku peymanan bi awayekî bê tedbîr danê. Ji bo dema dirêjtir, piranîya welatên endam ên *Yekîtîya Ewropayê*, li gor daxwazên Almanyayê yên ku Parîs wan bi sernermî teqlîd dike, soza hişkkirina siyasetên şidandina aborî dane û qebûl kirin ku wê sîstemeke cezakirinê ya dijwar li ser ên muxalif ferz bikin. Ev yek jî peymana li ser *Îstiqrar Koordînasyon û Birêveberîyê* (PILR) ya ku van rojan tê mohr kirin, misoger dike.

Êdî tehlûke heye ku cezayê li Yewnanistanê hat birîn, were serê Spanyayê jî, tevî ku rêjeya bêkarîyê lê bûye % 22.8 jî, jê tê xwestin ku lihevderneketina budçeya xwe yekê ji sisiyan kêm bike. Portekîz di heman rewşê de ye, ew jî neçar e ji lêçûnên xwe yên dewletê kêm bike, tevî ku rêjeya faîzên deynên wê pir bi hewa dikeve (di adarê de % 14) û welat di piçûkbûna aborî de teqinîye (sala 2011ê rêjeya mezinbûna aborîya wê % -3 bû). Li ser dewletan hatiye ferz kirin ku budceyên xwe bêhtir hişk bikin û mesrefan kêm bikin, heman dewlet ketine ber çerxa bêkarîya girseyî de û ev rewş berê jî hatiye ditin; dermannameya aborî û civakî ya salên 1930ê li Fransayê bi vî rengî bû... Hingê ravekirina sosyalîstan weha bû: "*deflasyon krîzê xirabtir dike, ew hilberînê û hatina ji bacan kêm dike*". (2)

Ehmeqîya siyasetên îro bi tenê wan kesan metelmayî dike yên ku hê jî difikirin ev siyaset dikarin bi kêrî berjewendîyên giştî werin û ne bi kêrî olîgarşîyên kurtêlxwur ên ku bi milê dewletê ve zeliqîne. Heke rûyekî fînansê heye, ew jî ev rû ye. (3) Mirov vî dijminî bi nav bike, ev ê bike ku li dijî wî çêtir seferber bike.

Heke li Fransayê desthilatdarî dest biguhere, xistina ber lêpirsînê ya PILRê (yan jî siyasetên aborîya jixwekêmkirinê yên bi heman xisletê) divê bibe karê mutleq li pêş yê serokkomarê nû, ew kî dibe bila bibe. Serketin û têkçûna vî karî wê ya mayî dîyar bike: Perwerde, xizmetên gelemperîyê, edaleta bacê, îstîxdam. Holland hez dikir çerx û mekanîzmaya hevgirtina ewropî ku ew piştevanîya wê dike û dermankirina bi rêbaza şokê ya lîberal ku ew li dij e, ji hev cihê bike. Wî niha zend û bend badane da ku PILRyê "*ji nû ve muzakere bike*", hêvîya wî jî lê zêdekirina "*baskekî mezinbûna aborî û îstîxdamê*" ye ku di asta parzemînî de pişta projeyên pîşesazîyê digire.

Li gor **Jean-Luc Mélenchon** bi xwe "*ti siyaseta çepgir di çarçoveya van peymanan de ne mumkin e*". Bi awayekî têra xwe mentiqane namzedê *Bereya Çepgir* li dijî PILRyê ye, ew herweha li dijî *Çerxa Îstîqrarê ya Ewropî* (ÇÎE) ye jî ya ku pêş dibîne alîkarîya malî bi welatên rewşa wan pir xirab re were kirin, wan welatên jî berîya vê alîkarîyê divê tedbîrên pir hişk ên hevsengîya budceyî qebûl kiribin. Namzeda jîngehparêz û namzedên *troçkîst* jî kampanyayan xwe ji bo "*teftîşeke ewropî ya deynên dewletê*" dikin, heta hin jê wê weke nerewa bi nav dikin, derbê lê dixin, argumana wan jî ew e ku kêmbûna bacê ya van bîst salên dawîyê û faîzên dayî deyndêran esasê asta wan ya heyî rave dike.

### "Tewa elastîk" a 1997ê

Piranîya dewletên ewropî ku Almanya serkêşîya wan dike yên ku li dijî ji nû ve muzakerekirina peymanan in, li ti tiştê bi vî rengî nafikire. Û jixwe hîç nafikire ku meblaxên mezin bide wan dewletên di rewşeke zehmet a malî de bêyî ku ev dewlet birêveberîya xwe ya "çê" bi kefalet piştrast nekin. Maneya vê ev e, ew ê li alîyekî taybetîkirinên nû qebûl bikin û beşeke girîng a bergirîyên xwe yên civakî (mûçeyên teqawîdan, alîkarîya bêkarîyê, tesbîta mûçeyê herî kêm, hwd.) bixin ber lêpirsînê. Jixwe wekî din serokê *Bankeya Navendî ya Ewropî* **Mario Draghi** 24ê sibata bihurî di hevpeyvîneke bi *Wall Street Journal* re bi kurtî weha derbirî "*Êdî ewropî ewqasî dewlemend nînin ku heqê herkesî bidin ku kar nekin*". Kevne cîgirê serokê **Goldman Sachsê** li peyvên xwe zêde kir û got, li gor siyaseteke jixwekêmkirina aborî ya "baş" divê hem bac werin kêm kirin (tu namzedên fransî heta bi **Sarkozy** jî vê yekê pêşnîyaz nakin) û hem jî lêçûnên dewletê.

Em evqasî bibêjin, serokkomarekî çepgir wê pir zû li benda muxalefeta piranîya hikûmetên Yekîtîya Ewropayê ku piranîya wan muhafezekar in û ECBê bikeve, jixwe nabe em Komîsyona Ewropî ya ku **José Manuel Barroso** serokatîya wê dike, ji bîr bikin. Ji ber vê yekê bi awayekî biryardar serokwezîrên brîtanî, polonî, îtalî û alman red kir ku favorîyê anketan ên fransî qebûl bikin, li gor wan ew li gor serokê niha kêmtir sernerm e.

Wezîrê malîyê yê hollandî **Jan Kees de Jager** ji niha ve dest nîşan kir "*em qet ne hevalbendên ji nû ve muzakerekirinê ne. Li alîyê din heke **Hollande** dixwaze reforman ji destpêkê ve bi rê ve bibe, hingê em ê li cem wî bin, çi reformên lîberalkirina xizmetan bin û çi jî reformên bazara kar bin.*" (4) Em hemûyî bi kurtî îfade bikin, hemû serokkomarên fransî yên çepgir wê desteka ***Hollanda***yê bistînin heke siyaseteke ji ya **Sarkozy** lîberaltir pêk bînin...

**Angela Merkel** bi xwe meylên xwe yên partîzanî qet venaşêre: Wê da zanîn ku ew amade ye tevlî mîtîngên rastgirên fransî bibe. Sosyalîstên alman bi xwe kêmtir bi hewes in li hemberî hempîşeyên xwe yên li alîyê din ên Çemê Reynê. Serokê partîyê **Sigmar Gabriel** dîyar kir ku ew piştgirîya çepgirên fransî dike, lê belê birêveberekî din **Peer Steinbrück** ku bi xwe jî hêvîyan ji xwe dike ku piştî 18 mehan bibe serokwezîr, angajmana **Hollande** ya ji bo "*careke din muzakerekirina van lihevkirinan* [ên ewropî] *hemûyan*" weke safdilî bi nav dike. Ew texmîn dike ku namzedê fransî wê çerx bike û li ya xwe biqulibe: "*Heke ew were hilbijartin, siyaseta wî dibe ku bi awayekî darîçav ji ya ku dibêje cuda be*". (5)

Nabe ku em hîpotezeke bi vî rengî li derve bihêlin. Sala 1997ê hê hingê sosyalîstên fransî berîya hilbijartinan parlemanê soz dabûn ku ew ê Pakta Îstîqrarê ya Ewropî ya li Amsterdamê mohrkirî –li gor **Mionel Jospin** "*tawîzeke bi awayekî absurd dayî hikûmeta alman*"– ji nû ve muzakere bikin. Piştî ku bûn desthilatdar, çepa fransî bi tenê şert "û mezinbûna aborî" li peymana bi navê "Pakta Îstîqrarê" zêde kirin.

Birêveberê niha yê kampanyaya hilbijartinan a **Hollande**, **Pierre Moscovici** ye, ew sala 2003yê ji nû ve li vê çerxkirina jî gotin vegeriya. Dema ku mirov ji nû ve dixwîne, mumkin nîne ku mirov li rewşa ku belkî piştî gulana li pêşîya me dest pê bike, nefikire: "*Peymana Amsterdamê hatibû muzakere kirin –bi awayekî pir xirab– berîya ku em bibin berpirsîyar. Tê de gelek kêmasî hebûn –û serê pêşî naverokeke civakî ya zêde kêm. (...) Hikûmeta pêşî dikarî bi awayekî rewa wê erê neke (...), yan jî qet nebe doza ji nû ve muzakerekirina li ser wê bike. Ev nebû tercîha me ya dawî* [Moscivici hingê wezîrê karên ewropî bû*]. Lewra em li qesra Elysée bi **Jacques Chirac** re bi krîzeke sêalî re rûbirû bûbûn. Krîza franko-alman, lewma heke em vekişîyaban, vê yekê wê bi carekê têkilîyên me bi hevkarê me yê sereke re tevlîhev bikira (...). Krîza bi bazarên malî re ku birêveberên wan hez dikirin peyman were erê kirin (...) herî dawî jî krîza bihevremanê. (...) **Lionel Jospin** bi awayekî rast biryar da ku qadê veguhêze, hem li rêyeke hêsan a paşve gav avêtinê û hem jî jêfilitîneke biserketî gerîya. Ango di berdêla razîbûna ji Peymana Amsterdamê de biryara pêşî ya Konseyeke Ewropî ya ji bo mezinbûna aborî û îstîxdamê bi dest xist*". (6)

Heke di gulan û hezîrana li pêşîya me de çepgir di hilbijartinên serokkomarîyê de biserkevin , paşê jî di yên parlemanê de, wê du hêman ji tabloya me li vir xêzkirî biguherin. Li alîyekî desthilatdarîya birêveber a fransî wê ne weke berîya panzdeh salan hatibe parve kirin; lêbelê li alîyê din hevsengîya siyasî ya ewropayê ku sala 1997ê ber bi navend-çepê ve meyildar bû, îro bi awayekî xurt alîyê rastgir nîşan dide. Ango, heta bi hikûmeteke ewqasî muhafezekar a mîna serokwezîrê spanî **Mariano Rajoy** jî êdî fikaran dike ji dermankirina jixwekêmkirina aborî a daîmî ya ku hikûmetên alman ji bo wî plan dikin. Bi vî awayî wî 2yê adara bihurî "biryara dewletê" ya qebûlnekirina kirasê bi zorê yê budceyî yê ewropî da zanîn.

Hema hema di heman demê de duzîneyek welatên din di nav wan de Îtalya, Îngiltere û Polonya jî doza ji nû ve rêdana ber siyaseta aborî kirin, ew siyaseta aborî ku ji alîyê duserîyên elmano-fransî hatî sêwirandin. **Hollande** dikare kêfa xwe bi vê yekê bîne. Ew hêvî dike ku hilbijartina wî ya muhtemel wê têkilîyên hêzên parzemînê serûbinî hev bike, bêyî ku ew neçarî vemalîna zendûbendan –bi gelek hikûmetên ewropî, ECB û Komîsyona Brukselê re li qayişkêşana hêzê bibe–a ku hîletê wî bi awayekî eşkere jê diçe. Ya rast ji nû ve rêdana ku welatên lîberal dixwazin, ti elaqeya wê bi wê tiştê re nîne ku ew bi xwe pêşniyaz dike. Peyva "mezinbûna aborî" ji bo hinan qebûlkirina siyasetên pêşniyaza thatcherî (kêmkirina bacan, lîberalkirina civakî û jîngehî) ye, ji bo yên din pakêteke piçûk a veberhênanên dewletê (perwerde, lêkolîn, binesazî) ye. Ev rewşa şêlo wê heta hetayê nemîne. Pir bi lez û bez divê mirov bi "*guhnedana ewropî*" re rûbirû bibe, **Mélenchon** û hêzên din ên çepgir vê yekê pêşniyaz dikin.Yan jî dewamkirina bêhêvî li ser riya ku ji niha ve dane ber xwe.

Ji bilî ya ku wan ji hev cuda dike –weke mînak di warê edaleta bacê de– **Sarkozy** û **Hollande** destek dan heman peymanên ewropî yên ***Maastricht*** û ***Lîzbon***ê. Her duyan jî hedefên pir hişk ên kêmkirina lihevderneketina budceya dewletê (sala 2013ê %3ê Hilberîna Nesafî ya Hundir, sala 2016 ev rêje %0 û sala 2017ê jî) erê kirin. Her du jî proteksîyonîzmê [siyaseta parastina hilberîneran li dijî hevrikîya hilberînerên welatên din; nota wergêr] red dikin. Her du li hêvîyê ne ku mezinbûna aborî her tiştî çareser bike. Ew berê siyasetên derve û bergirîyê yên weke hev diparêzin, heta bi wê astê ku sosyalîstên fransî êdî bi destê Fransayê ji nû ve bicihkirina fermandarîya yekbûyî ya Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê (NATO) jî naxin ber lêpirsînê.

Dîsa jî êdî wext e mirov xwe ji tevahîya van şertan qut bike. Guhertina serokkomar şertê vê yekê ye. Lêbelê ne dîroka desthilatdarbûna siyaseta çepgir û ne jî rêveçûna kampanyaya heyî destûrê nadin ku mirov bifikire ku ev ê karibe têrê bike.

1 Bi dorê RTL, 22ê çileya 2012ê, û *Le Journal du dimanche*, Parîs, 15ê çileya 2012ê

2 Destpêka pêşniyazqanûna budceyî ya koma sosyalîst ji bo sala 1933ê

3 Dosyeya me bixwîne "Birêvebirina bankeyan", *Le Monde diplomatique*, hezîrana 2010ê

4 Le Monde, 1ê adara 2012

5 AFP, 15 sibata 2012ê

6 Pierre Moscovici, *Un an après/Salekê Piştre*, Flammarion, Parîs, 2003, rûpel 90-91

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## Ji Riyadê heta Tehranê

# Pêla şokê ya Sûrîyê

ALAIN GRESH

Tevî zextûrepteke hovane, xwepêşandanên sûriyeyîyan li dijî rejîmê didomin. Daxwazên wan û yên li Bahreyn, an jî Urdunê hatibûn derbirîn, wek hev in; lê belê parçebûna navxweyî ya muxalefetê û desttêwerdanên derve dikarin bibin sedemên pevçûnên olî yên ku dikarin tevahîya herêmê tehdîd bikin.

Pirtûka em behsê dikin klasîkek e. Sala 1965ê ji alîyê rojnamevanê brîtanî **Patrick Seale** ve hat nivîsîn û behsa şer û pêvçûna ji bo kontrolkirina Sûrîyeyê ya piştî şerê cihanê yê duyem dike. Navê pirtûkê jî *Têkoşîna ji bo Sûrîyeyê* ye. (1) Ev têkoşîn hem di dema şerê sar, di navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Yekitîya Sovyetan de qewimî, hem jî di dema "şerê sar ê erebî" de pêk hat. Wê demê Misira **Cemal Abdil Nasir** û Erebistana Suûdîyê ji bo desthilatdarîya hêremî şer dikir -heta bi çîyayên Yemenê ku lê leşkerên misirî li dijî qebîleyên qralparêz, piştgirîya komara nû dikir, komara ku ji alîyê Riyadê ve dihat fînanse kirin. Ji salên 1950yê heta sala 1967ê Sûrîye di navenda hevsengî, an jî bêhtir di navenda nehevsengîya hêzên herêmî de bû. Wê demê li Şamê darbeyên cûntayên leşkerî li pey hev pêk dihatin.

Di heman demê de ew bû navenda tevlihevîyên dijwar yên salên 1950 û 1960ê ku armanca wan serxwebûna siyasî, pêşketina aborî, pêkanîna civakeke adiltir û wekhevtir bû. Girse ji neteweperestên ereb, ji çepgir û ji marksîstan pêk dihat.

Piştî têkçûna ereban li hemberî Îsraîlê di sala 1967ê de, Rojhilatê Nêzîk ket nav xetimînekê ku çil salan dewam kir. Tevahîya rejîman, çi komarparêz çi jî qralparêz, dev ji hemû şiklên hewldanên ji bo pêkanîna reforman berdan. Xisletên van rejîman ev in: Otorîterbûna wan, kombûna dewlemendîyan di destê elîteke piçûk de ku girêdayî dewletê ye û şewba bertîlxurîyê. Di vê demê de herçiqasî serhildanên ji hev qut yên gel, nîşana nerazîbûneke belav bin jî, rejîman piranî li ser berjewendîyên jeopolîtîk û li ser helwêsta wan li hember Amerîka û Îsraîlê, şerê hev dikir. Daxwaza guhertin û veguhertina civakî tê ji bîr kirin.

Di nav salan de rengê hevgirtinan diguherin. Dema ***Şerê Kendavê*** yê yekemîn di sala 1990-1991ê de, me dît çawa Sûrîyeya **Hafiz El Esed** hevgirtîya Washingtonê dikir û Urduna **Qral Huseyin** piştgirîya **Seddam Huseyin** dikir. Demeke kêm berîya şoreşên erebî yên sala 2011ê, dualîtîyeke dijber enîya piştgirên Amerîka (Misir û Erebistana Suûdîyê) û enîya bi navê "berxwedan" (Îran, Sûrîye, Hemasa Filîstînî û Hizbullaha Lubnanî) dianî hemberî hev.

Şam bi roleke sereke radibe, nexasim bi saya hevgirtîya xwe bi Komara Îslamî re ; hevgirtineke ku ji sih salan û vir ve tu tiştî nikaribû wê xira bike, cudatîyên fikrên her du welatan jî nikarîbû wê xira bikin. Mesela newekhevîya fikir weke li ser aşitîya bi Îsraîlê re ku Îran weke prensîp red dike û ku Sûrîye bi hin şert û mercan qebûl dike. Dev ji best û panava (platoya) ***Golan***ê, ya ku ji 1967ê û vir ve dewleta cihû dagîr kiriye, berdan yek ji van şert û mercan e.

Piştî kuştina serokwezîrê kevin yê lubnanî **Refîq Herîrî**, di 14ê sibata 2005ê de û bi lez ji welêt derketina leşkerên wê, rejîma ***beasî*** ket nav pêvajoyeke îzolasyonê, di dawîyê de ji **Beşar El- Esed** hat ku jê derkeve. Hişkbûna wî li hember îdareya **George W. Bush**ê ku xeyal dikir wê bikaribe wî ji text bixe, alîkarîya wî ji bo Hizbullahê dema şerê Îsraîlê di havîna 2006ê de li Lubnanê bi rê ve dibir û piştgirîya ku wî di dema dagîrkirina îsraîlî ya kanûna 2008ê heta çileya 2009ê da Hemasê, kirin ku li herêmê îmaja "enîya berxwedanê" ya Beasê pêş were. Birayên Misilman ku li hemberî vê biryardarîyê matmayî mabûn –ji bo demekê- dijberîya xwe rawestandin.

Vê prestîja rejîma Beas kir ku rêveberîya wê bawer bike ku welatê wan wê timî li derveyî tevgera ji sala 2011ê ve li herêmê belav dibû, bimîne. Di heman demê ev rejîm di cihanê de kir ku hin tevgerên li dijî emperyalîzmê, ên ku kûrahîya guhertinên di encama şoreşên erebî de pêk hatî li ber çavan nagirin, bi tenê alîyê jeopolîtîk yê alozîya li Sûrîyeyê bibînin. (2)

### Muxalefet daxwazên kurdan qebûl nake, dewlet PKKê bi kar tîne

Ev hesab û analîzên şaş in. Rêjîm bi heman pirsgirêkan re rû bi rû ye ku li herêmê belav in: Otorîtarîzm û dîktatorîya dewletê; xespkirina dewlemendîyan û lîberalkirina aborîya ku newekhevîyan mezintir dike; nemumkunîyeta bersivdana daxwazên ciwanan ku ji nifşên berê baştir perwerde bûne û hejmara wan jî zêdetir e. Redkirina liberçavgirtina hêvîyên wan, hovîtîya neditî ya tepisandinê kirin ku zêdebûna şidetê hê bi leztir bibe û kir ku beşeke ji serhildêran yên ku bi piranî weke li Misirê li dijî şidetê bûn *(silmiyya)*, êdî bibin xwedî çek. Tehklûkeya ku şer veguhere şerekî mezheban mezintir bû, lewre rejîm bê dudilî vê mijarê ji bo tirsandina elewî (3) û xirîstîyanan bi kar tîne.

Tevî vê yekê jî wisa xuya ye ku ji muxalefetê nayê ewlekarîyeke cidî ji bo paşerojê misoger bike. Li şûna ku bawerîya mirovan bi xwe bîne, wan hin piştgirên xwe ji dest dan. Kurdên ku di destpêkê de xwepêşandêrên yekem bûn *(nexasim ji bo bidestxistina welatîbûnê ku jê bê par mabûn)* bi sedema ku Konseya Neteweyî ya Sûrîyeyê (***KNS***) red kir mafên wan bide, êdî xwe didin alîyekî. (4) Li alîyê din jî rejîmê bi awayekî serketî ji nû ve destûr da çalakîyên *Partîya Karkerên Kurdistanê* (**PKK**) ku berî vê jî di şerê li dijî Tirkîyeyê de di salên 1990ê de bi kar anîbû. PKK di nav kurdên Sûrîyeyê de hê jî gelekî bi hêz e.

Tevgereke nû jî berîya demeke kin derket holê: ***Tevgera Neteweyî ji bo Guhertinê*** (TNG) ku ji alîyê **Dr. Omar Qurabî** ve, serokê kevin yê *Rêxistina Sûrîyeyê ji bo Parastina Mafên Mirovan*, tê bi rê ve birin. Ew ji ber marjînalkirina mîlîtanên elewî û tirkmenan rexneyan li KNSê digire. (5) Herçi xirîstîyan in ku bi hezaran hevoldarên xwe yên ku ji Iraqê revîyan û xwe spartin Sûrîyeyê dîtin, ew bi fikar in li hemberî bihêzbûna cihadîstan û li hemberî sloganên ku hin xwepêşandêr li dijî xiristîyan û elewîyan dibêjin.

KNSya ku bi nerazîbûna gelek muxalîfan re rûbirû ye –yek ji wan jî ***Komîteya Neteweyî ya Koordînasîyonê*** ye ku mudaxeleya leşkerî red dike û dîyalogê bi rêjîme re dixwaze- di nav xwe de parçe parçe bûye, ji alîyê Komîteyên Herêmî ve nayê qebûl kirin û ji alîyê ***Birayên Misilman*** ve li gel hin fîgûrên lîberal tê bi rê ve birin. Girêdayîbûna wê bi welatên rojavayî û bi qralîyetên kendavê re xweş nayê dîtin.

Girêkeke bi temamî kor e. Ji muxalefetê nayê ku rejîmê ji text daxe û ji rejîmê nayê ku vê serhildana ku bi biryardarî û egîdîya xwe ya li hember xwefedakirinê balê dikşîne ser xwe, bişkêne. Vegera li statukoya berê ne mûmkûn e û kontrolkirina mêjîyan û laşê mirovan, di civatekê de ku di van mehên dawîyê de xwe polîtîze kir wê tucarî mumkin nebe. Reformên ji alîyê Şamê ve hatin pêkanîn (destûra bingehîn ya nû, efûya giştî, hwd) tu tesîrê nakin, lewre destûra îstîxbaratê û artêşê heye bikujin, bombeyan bibarînin û êşkencê bikin.

Di heman demê de, ihtîmala şerekî navxweyî heye û ihtîmal herweha heye ji sînoran derbasî Lubnan û Iraqê jî bibe. Mudaxeleyeke leşkerî ya bîyanî tenê wê şerên nav gelan radîkalîze bike û wê bike ku çek bibe hakîmê yekane yê şerên mezhebî. Ew dikare derba dawîyê li hêvîya demokratîkbûna herêmê bixe.

Mudaxaleya leşkerî ne alternatîva bi tenê ye. Hinek zextên aborî li Sûrîyeyê (ku dikarin bên şidandin, bi şertê ku li ser rêveberan were ferz kirin, ne li ser gel) hebin da ku beşeke ji burjûwazîya ku piştgirîya rêjîmê dike dudil bibe. Li alîyekî din jî, ji heyetên çavdêrên ji alîyê Lîga Erebî ve şandî yên pêşî hatibû ku, tevî zehmetîyên ku dîtin jî şidetê kêm bikin; Erebistana Suûdîyê berpirsîyar e ji derketina wan a ji welêt û windabûna raporên wan. Van raporan bi agahîyên qutkirî yên medyayê re li hev nedikir. Vegera wan heyetên li Sûrîyeyê û ferehkirina erka wan wê bibûya gaveke ber bi pêş ve. Li gel vê yekê jî divê Rûsya û Çîn hevkarîyê bikin ji bo hewl bidin lihevkirineke li ser dema derbasbûnê pêk bînin. Hinek wê li hember vê fikrê rabin, lihevkirin bi welatekî kujer re? Li Amerîkaya Latînî dema derbasbûnê ber bi demokrasîyê, ber bi efûkirina leşkeran pêk hat, herçiqasî mirov nerazî be ku leşkeran demeke bi qasî sîh salên dirêj sûd ji vê yekê standibin jî.

Aktorên derveyî ku rewşê bi tenê weke şerekî mezin di navbera dîktatorî û demokrasîyê de dibînin, îmtiyazê nadin vê alternatîfa zehmet û bi asteng. Le belê kî dikare bawer bike ku rejîma Suûdîyê ya ku meclîseke wê ya hilbijartî jî nîne, dixwaze li Şamê demokrasîyê pêk bîne? Vî welatî ku wezareta wê ya karên hundur serhildanên şiî yên li rojavayê welêt qewimîn weke *"şiklekê nû yê terorîzmê"* rave kir? (6) Vê rejîma ku di destpêka adarê de li Abha –paytexta herêma ***Assir*** ku piranîya şênîyên wê sunnî ye- bi awayekî hovane êrişî ser xwendekarên ku li dijî rewşa xirab ya perwerdeya zanîngehan kom bûbûn, kir?

Erebistana Suûdîyê ku ji ber lawazbûna tesîra Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li herêmê ketiye gumanan û ku ji "desthiladarîya şiî" ya li Iraqê bi cîh bûyî nerazî ye, rêveberîya kontir-şoreşa hêremî girtiye ser xwe û bêyî ku bi tevahî xilas bike, serhildana Behreynê tepisand. Ew çekan dide serhildêrên Sûrîyeyê, tirsa ji şîîyan bi gewde dike da ku piranîya sunîyan ber bi xwe ve bikşîne û koza wê jî dijmintîyeke dualî a li dijî şiîyan û "farisan" e.

### Berxwedana gel

Tevî ku van salên dawîyê têkilîyên Riyadê bi ***Birayên Misilman*** re pir xirab bû, ew siyaseta xwe ya "hevgirtina sunnîyan" dispêre bidestxistina deshilatdarîyê li Tûnisê, li Qahîreyê û li Fasê ya Birayên Misilman. Belkî ew ê sibe li Libyayê jî desthilatdarîyê bi dest bixin. Lê zehmet e mirov tiştekî muheqeq pêş bibîne, ji ber ku dengê terîqeta Birayên Misilman li ser biryarên ku divê bide ne yek e –çawa ku hikûmeta tûnisî her şiklê mudaxaleya ji derve red dike û yan jî ,erê di nav hêzên Hemasê, ku dev ji biryargeha xwe ya navendî ya li Şamê berdaye, nişan didin. Endamekî bûroya siyasî ya rêxistinê , birêz **Selah El-Berdewîl**, dîyar kir, eger şerek di navbera Îran û Îsraîlê de biqewîme, *"Hemas wê mudaxele neke"*. Ev helwêst ji alîyê rêveberekî din ê girîng, birêz **Mahmûd El-Zehhar** ve hat înkar kirin. (7) Lewra pirsgirêka nayê çareser kirin ya filistînî asteng e li hember fikra hevgirtineke mezin a sunnîyan li dijî Îran û Sûrîyeyê. Di berxwedana li dijî stratejîya Îsraîlê de wê kî cihê Şamê yan jî Tehranê bigire?

Washington bi xwe, armanca wê şkandina yek ji stûnên "tewereya xirabîyê" ye û ji vê û wêdetir têkbirina Îranê ye ku serokwezîrê îsraîlî **Benyamin Netanyahû** xeyal dike bombeyan li ser bibarîne. Tevî ku ji text xistina **Esed** jê re derfetek e da ku ji nû ve li herêmê xwe bi cîh bike, wisa xuya ye ku Amerîka- ya ku bê serkeftin û sertewandî ji Iraqê derket, li Afganistanê hez jê nayê kirin û di demeke nêzîk de wê neçar bimîne hêzên xwe jê vekişîne, ***talîban*** û gelê li hember "jirêderketinên" wê matmayî, jê nefretê dikin,-pir naxwaze bi xwe mudaxeleyeke leşkerî ya nû li Sûrîyeyê bike. Gelo wê weke li Lîbyayê piştgirîya mudaxeleyeke leşkerî bike? Gelo wê rîska tevlihevkirina welatekî ku cihadîst û El-Qaîde ji xwe lê tevdigerin bigire?

Herçî hikûmeta îsraîlî ye, belkî wê helwêsta wê bi saya diyarkirina rêveberê kevin yê ***Mossad***ê û kevneşêwirmendê neteweyî yê ewlekarîyê birêz **Efraim Halevy** bê eşkere kirin. Li gor îdiaya wî jidarxistina rejîma Şamê, li gel lawazkirina demdirêj yaTehranê, wê bike ku ne pêwîst be bombe li ser Îranê bibarînin. (8) Lê Tel Avîv jî pê dizane ku her helwêsteke fermî ya bi vî rengî, wê muheqeq zirarê bide muxalefeta Sûrîyeyê. Û hin kesayetên li Îsraîlê ditirsin şerekî navxweyî li Sûrîyeyê biqewîme ku wê aramîya sînorê her du welatan xirab bike.

Li alîyê din jî, Rûsya û Çîn ji gewdebûna hêza îslamîstan û li hemberî vê yekê yekalîtîya ewropî û amerîkî. Lewra heta niha tevî ku wan tercîha xwe ji bo çareserîyeke lihevkirî eşkere dikir, her du welatan der barê biryarên Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî yên ji bo Sûrîyeyê, mafê xwe yê vetoyê bi kar anî.

Tevahîya van çivdanên li Rojavayê Nêzîk diqewîmin, cihekî ku ji ber şerên Dewletên Yekbûyî meşandî (Afganistan, Irak), Îsraîlê meşandî (Lubnan, Filistîn) jixwe di nav bêîstiqrarîyeke kûr de bû: Di encamê de welatên lawazkirî; roleke girîngtir ya milîsan (Irak, Kurdistan, Afganistan, Lubnan, Filistîn) ku xwedî gelek rêbazên fermî û bi hêz in, weke milîsan; alozîyên civakî ku hindikayîyan tehdît dikin, hwd.

Di çarçoveya bêîstiqrar de serhildanên erebî bi carekê dest pê kirin. Doza wan azadî, rûmet, demokrasî û adaleta civakî ye. Tevî ku ji wan hat ku serokkomarên li Tûnis, li Misir, li Lîbya û li Yemenê ji text daxin, mirov dîsa jî xeyalşikestineke di raya giştî ya rojava de hîs dike. Weke ku **Peter Harling**, rêveberê çalakîyan yê ***International Crisis Group*** (Koma Krîzê ya Navneteweyî) li Misir, Sûrîye û Lubnanê xêz dike *"Ne balkêş e ku tevlihevîyeke mezin cihê şoreşên ku li Tûnis û li Misirê bi carekê pêk hatin, bigire. Hema bigire li tevahîya cîhana erebî, em dibînin ku lihevkirineke nû ya bi ezim û bi şidet li ser peymaneke civakî çêdibê. Li vê herêma weke agir rewşên taybet li girêdayîbûneke bi hev re ya xurt zêde dibin û modela tûnisî heta bi gundên kes nas nake yên Sûrîyeyê tê nîqaş kirin".* (9)

"Zivistaneke îslamîst"? Şerên di navbera mezheban de? Tepisandina tevgerên ji alîyê arteşa Sûrîyeyê, yan jî misirî? Ev senaryo hemû mumkin in, lê hemû hêza dengê nerazîbûnê, qîmetê ji hilbijartinên demokratîk re girtin, qudreta bêhempa ya gel li Bahreynê weke li Sûrîyeyê piçûk dibînin. Gel di heman demê de piştgirîya doza filistînî dikin ku hîn didome û beşdarî tekoşînên civakî û demokratîk dibin ku ji 1967ê û vir ve rawestiyabûn. Di vê çarçoveyê de tehlûke heye ku mudaxeleyên nû yên ji derve rewşa parçebûnê hê xirabtir bikin, weke ku li Iraq û li Lîbyayê pêk hat. Bi heman rengî tehlûke heye ku têkoşîna demokratîk veguhere şerekî mezhebî, nexasim di navbera sunnî û şîîyan de.

1 Patrick Seale, *The Struggle for Syria: A Study in Post-War Arab Politics, 1945-1958 (Têkoşîna ji bo Suriyê: Lêkolîneke siyasetên erebî ên piştî şeran, 1945-1958)* , Oxford University Press, London-New York, 1965

2 Li ser nîqaşên di nav çepê lubnanî de, bixwîne Nicolas Dot-Pouillard, "“Résistance” et/ou “révolution”: un dilemme libanais face à la crise syrienne" ("Berxwedan û/an jî şoreş: Dudilîyeke lubnanî li hemberî krîza sûriyeyî"), Les Carnets de l'Ifpo, 11ê çileyê 2012ê, http://ifpo.hypotheses.org

3 Hindikayîyekê misilman ku girêdayîyê şîîtîyê ye. Malbata El-Esed û gelek rêveberên surî ji vê hindikayîyê ne

4 Dogu Ergil, "Syrian Kurds" (Kurdên Suriyê), *Zaman,* Istanbul, 21ê sibata 2012ê

5 Ipek Yezdani, "Syrian dissidents establish new bloc" (Muxalifên surî blokeke nû ava dikin), *Turkish Daily News,* Istanbul, 21ê sibata 2012ê

6 "State has full right to check rioting, Interior Ministry says" (li gor wezareta Karên Hundir, heqê dewletê heye ku serhildanan kontrol bike), *Arab News,* 11ê adara 2012ê, http://arabnews.com

7 *The Guardian*, London, 6 adara 2012a, û *The Jerusalem Post,* 8ê çileyê 2012ê

8 "Iran's Achilles' Heel" (Xeleka lawaz ya Iranê), *International Herald Tribune,* Neuilly-sur-Seine, 7ê sibata 2012ê

9 "Le monde arabe est-il vraiment en “hiver”?" (Cîhana erebî bi rastî di “zivistanê” de ye?), LeMonde.fr, 1ê sibata 2012ê

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Nerazîbûneke bêhempa

# Berdewamîya enîyê li Rûsyayê

JEAN RADVANYI *

Tevî ku roja 4ê adara bihurî, Vladimir Putîn li gel % 63.6 dengan dîsa wek serokkomarê Rûsyayê hatibe hilbijartin jî, rewşa siyasî ji hêvîyên wî yên di dema xuyakirina namzedîya ya îlona 2011ê de pir cuda ye. Meşruiyeta wî lawaz bû û, heta di alîyê wî de jî, pir kes ne bawer in ku ew ê bikaribe ji pirsgirêkên welêt re çareyan bibîne.

Şoreşeke rengîn (1) bi awayê rûsî wê pêk neyê. Seferberîyên 5 û 10ê adarê, ku li ser bangewazîya grupên îtîrazker ên encama hilbijartina serokkomarî li dar keftin, girseyên hesibandî bi xwe ve nekişandin û organîzator bi xwe lê mikûr hatin ku divê awayê derbirîna nerazîbûna wan bê guherîn. Li gel vê yekê jî, desthilat nikare weha bihesibîne ku her tişt temam e. Li dawîya qonaxeke çalakbarîya nedîtî ya ku li kanûna bihurî, bi dû hilbijartinên meclisî, hatibû dest pê kirin, civaka rûsî ji her demî bêhtir dabeşkirî xuya dike.

Ji sextekarîyê bêhtir (2), ji nû ve hilbijartina Putin ne surprîz e. Di serî de ji ber ku beşeke mezin a dengdaran, piştî trawmaya krîzên siyasî û aborî yên ji 1991ê ve li pey hev hatî, wî wek parêzvanê tenê yê istiqrara welêt dibînin. Di xwepêşandanên mezin ên bi dû hilbijartinên cihê nerazîbûnê yên ***Dûma***yê de jî, piranîya kesan qutbûneke siyasî ya tevayî nedixwest. Partîya li ser kar, feyde ji vê hişmendîyê wergirt û soza dewambûnê da. Wekî din, zagonên hilbijartinê yên ji 2000ê ve ketibûn dewrê rê neda muxalefetê ku namzedên pêbawer derxîne pêş.

Ev heman manîpulasyon bixwe ne ku bûn dîkikkêşa tevgereke muxalefetê ya berfireh. Beşa raya giştî ya herî zêde bi nirxên demokratîk ve girêdayî –nirxên ku hemû rayedarên ji **Boris Yeltsin** ve bi ser xwe girtibûn– xwe li ber sînîzma xuyakirina pevguhastina rolên dueta li ser kar ranegirt, dema ku serokkomarê niha **Dmîtrî Medvedev** roja 24ê îlona 2011ê namzedîya kevneserokkomar û serokwezîrê niha **Vladimir Putin** pêşkêş kir û Putin bi xwe yekser lê vegerand û soz daye ku ew ê cihê serokê hikûmetê jî ji Medvedev re veqetîne.

Li pey kampanyayeke hilbijartinê ya ku, nemaze li Moskvayê û bajarên din ên welêt, xwepêşandanên berfireh û her ku diçe, li dij namzedê fermî tûndtir û dijwartir, mohra xwe lê xist, bergeha siyasî ya rûsî û jê bêhtir, rewşa raya giştî, bi kûrahî serûbin bûne. Tevî serkeftineke qebûlnekirî di hilbijartinên parlemanî de jî, partîya li ser kar, Rûsyaya Yekgirtî, nikare xwe ji leqeba xwe ya li Înternetê navdayî, "Partîya çete û dizan", xilas bike. Partîya Komûnîst jî, ya ku di rêza duyem a hilbijartina serokkomarî de bi cih bû, li gel namzedê xwe **Guennadî Ziûganov** lawaz bû, her weke **Vladimir Jirinovski** yê namzedê ***Partîya Lîberal û Demokratîk a Rûsyayê*** (LDPR), partîya netewperest a kevneşopî li rêza çarem daket. Bi siyaseteke civakî ya çalak (rakirina pansîyon û pareyê teqawidbûnê, rakirina meaşên hin kategorîyan weke mamoste û personelên tenduristîyê), bi fînansekirina pîşesazîyên kevneşopî, **Putin** bandora PKê a di kelehên xwe yên kevnare de kêm kir, tevî nûbûneke retorîka welatparêz a ku Jirinovski jî xist tengasîyê. Herçi ***Iabloko***, partîya **Grîgorî Îavlînskî** ya ku demekê wek partîyeke sosyal-demokrat a rûsî hatibû nîşan dan, karên nelirê ew ji Dûmayê qewirand û riya hilbijartina serokkomarî jî li pêş namzedê wê girtiye; ew hîn bêhtir marjînalîzekirî derket.

## "Yekemîn duçerxa du rûniştek"

Mîtîngên mezin ên muxalefetê rola tevgerên derparlemanî bi pêş de xist û serokkomar **Medvedev** bi hin temsîlkarên wan re li destpêka adarê jî hevdîtin pêk anî. Wan baweşînkeke nedîtî ya meylên dijber, lê di redkirina kiryarên desthilata heyî de yekbûyî, anî cem hev. Li gel çepeke hûrhûrkirî, du meylên din tê de cih digrin, meyleke rastgir û lîberal jî di nav de. Ev meyla lîberal hîn lawaz e, lê demokratîkbûneke tund weke şerteke bivê nevê ya têxistina rê ya rabûna rûsî îlan dike. Li cem pêşengên adetî, wek kevneşampîyonê kişikê **Gary Kasparov** an kevneserokwezîr **Mikhaîl Kassianov** û **Boris Nemtsov**, surprîz ji hêla **Mikhail Prokhorov** hatiye, yê ku di rêza sêyem a hilbijartinê de cih girt. Evê mîlyardar û olîgark, kampanyayeke çalak a li dij karên nelirê meşandin û daxwaza tevindana vê qûtba lîberal bi îlana damezrandina partiyeke nû piştrast kir. Lê belê, ji kêmbûna tecrubeya siyasî bêhtir, dewlemendîya wî ya di welatekî hîn dijberê olîgarkan de, her weke daxuyanîyên wî yên li ser pêwîstîya reformeke qanûna kar, jê re dibin asteng.

Meyla duyem jî aîdê tevgera netewperest e, ku tevî nûdestpêkirina gotinên welatparêz a **Putin**, ku negirêdayîyê tu partiyê ye û bi kampanyayên nijadparest yên di pey hev de pêk anîn û bi bikaranîna şidetê li dijî koçberan – bûyerên ku ji seferberiya polêsan bêhtir rê li ber xwepêşandanên demokratan vekir– bi berfirehî pêş de ket. Li gel pêleke dirûşmên demagojîk ên têkildarên sloganên hevfikirên wê yên ewropî, vê meylê ji nezelalîya pozîsyonên **Alexis Navalny** ê navdarê Înterneta rûsî û qehremanê şerê li dij giregirên bertîlxwursûd wergirt.

Li hember nerazîbûneke weha berfireh, desthilatê li gel aletên îdarî yên bi heybet, çalakkirina parêzvanên xwe li dar xist. Wê dijûnên rabihorîyê dîsa derxistin holê, weke "dijminên Rusyayê" yan jî "xayînên welêt". Bi pey re, weha xuya bû ku wî dixwest bersiva hin xwestekan bide. Berê hilbijartinên 4ê adara 2012ê, **Medvedev** weha nîqaşên li ser çend pêşnîyarên zagonê yên ji bo reformkirina hin alîyên pergala heyî (vegera hilbijartina walîyan, qeydkirina hêsantir a partîyan) li Dûmayê dan dest pê kirin. Lê belê, **Putin** jî behsa çend astengan kiriye ku wê berfirehîya van reforman sînordar bikin...

Sernavê ku heftaneya rûsî *The New Times*, roja 5ê adarê, ji bo hevpeyvîna li gel **Igor Iurgens**ê berpirsê fikirdankeke nêzîkî **Medvedev** hilbijart, têra xwe ravekar e: "Em şkestin". Li gel analîza şerên bandordarîyê yên di çembera nêz a "dueta pêşî" de (Medvedevê serokkomar, Putinê serokwezîr), ew têkoşîna du hêzên nehevseng dişayêsîne. Hêza pêşî, ya ku ew tê de cih digre, dişibe kategorîya civakî ya xwepêşandêrên kanûn û çile yên kolanên Moskvayê: Entelîjentsîyaya lîberal, mamoste, xwendekar, lêkolîner û sinifa navîn a di rabûnê de; hemû parêzvanên vekirina welêt û kûrbûneke bi lez a demokrasîyê.

Li dijî wê, lobîyeke muhafezekar heye, *"yekîtîyeke bihêz"* û di hemû mekanîzmayên desthilatê de birêxistî, ku xwe dispêre koeke sektorên ji rêûresmê: *"kompleksa leşkerî-pîşesazî, hîdrokarbûr, agrobusiness û artêş"*. Ew tirsa wan a guherîn û êrişên derve binxêz dike. Navên hatî ser zimên di tabloyeke matmayîker a ji hêla heman heftaneyê ve weşandî (3) de cih digirin, ya ku têkilîyên şexsî û resmî yên **Putin** û komeke rayedarên siyasî û karmendên van derdoran –li gel binesazîyên mezin ên neqliyatê û du elemanên kilît ên mekanîzmayê, banka û medyayên sereke –bi hûrgilî nîşan dide.

Ev şebeke ji nîvê hatina hindûrîn a brûtê (HHB) bêhtir û zêdetirî sê çarêkên îmkanên ixracatê yên rûsî jî di xwe de vedihewîne. Desteserîya dewletê li ser van salên dawîn hê jî xurttir bû. Çapemenî bê navber kirinên van şirketan mehkûm dike, ku çalakîyên wan bi siparîşên hikûmetê ve bi giranî girêdayî ne: Nirxandina zêde ya bihayan a sîstematîk, bi xêra rewşên monopolê, reva qezencan ber bi meydanên *offshore* û nezelalîya ku bertilxurîyê hêsan dike.

Ji protestokirina hilbijartinan bêhtir, çalakbarîya xelkê bi taybetî li dor daxwazên zelalbûn, edalet, çavdêrîya gel li ser biryaran digere û li dij imtiyazên biheybet ên *nomenklatûra*ya nû ya ji bîst salên tunebûna cudakirina desthilatan derketî, radiweste. Ne tesaduf e ku xwepêşandêran rengê spî ji xwe re hilbijartin û şerît, rozet û top jî jê dan çêkirin. Bertîlgirî, karên nelirê û desthilatdarîya rayedaran di her sewiyeyekê de cihê nerazîbûnê ye. Lewre ku tevî sozên dubare yên dueta **Medvedev-Putin**, pêşketin di vî warî de hema bêje tunene. Sedemên resmî yên jikaravêtina giregirên dewletê yên di qonaxa bihurî de tu caran wek bertîlxurî yan karên nelirê nehatin nîşan dan.

## Tirsa vedoreke nû ya pevçûnan

Du lêkolînerên amerîkî yên ku karîyer û kiryarên **Putin** analîz kirine, portreya merivekî heyranê dîrokê diresimînin, yê ku dixwaze bibe wek **Petr Stolypinekî** sedsala 21ê (4) û berî her tiştî hêz û dînamîzma berê li welatê xwe vegerîne. Li gor wan, serokkomarê nû ev wezîrê **Nikolas II** wek mînak ji xwe re bijart, yê ku ji ber tepisandina tevgera şoreşgerî ya 1905ê her weke sazkerê reformên girîng û nîvcomayî navdar e. Wî weha bersiva Stolypin li hemberî Dûmayê di 1907ê de kir mala xwe: *"Birêzino, ne guherînên mezin, Rusyayeke mezin ji me re pêwîst e"*. Herdu lêkolîner jî çend epîsodên siyasî yên biryardêr ên karîyera siyasî ya Putin bi bîr dixin, pêşî li dewsa cîgirê şaredarê reformker ê yekem ê Petersburgê, **Anatoli Sobtchak**, paşê wek warisê hilbijartî yê **Boris Yeltsin**; ew li ser nakokîya xuyanî ya wî disekinin, nakokîya navbera terciha wî ya dubarekirî ya parastina mantiqê bazareke vekirî û demokrasîyeke di înşabûnê de, û niyeta wî ya sert a parastina dewleteke navendî ya hercihî.

Ji dema ku, welatê wî bi tevlihevîyan re rûbirû bû, wî wek istîxbaratkerê KGBê û xebatkarê şaredarîya Petersburgê kar kir, Putin pênebawerîyeke kûr wergirt û di serî de *"şoreşên rengîn"*, pişt re jî *"bihara erebî"*, ev pênebawerî dîsa çalak kir. Ew ji hatina serdemeke nû ya nerihatîyan ditirse. Wekî din, fikira wî jî ev e ku xwepêşandanên mehên bihurî di binî de ji hêla rêxistinên bîyanî ve hatin manîpule kirin. Di zincîreke nivîsarên dûv û dirêj de, namzedê Putin fikira nûkirina Rûsyayê di hemû zemînan de dubare kir, li gel parastina wê ji zextên derveyî yên dixwazin wê lawaz bikin.

Ev pênebawerîya dualî, navxweyî û derveyî, helwêsteke nakokbar bi xwe re tîne. Ji ber ku ew li pêşketina demokrasîyê bi tenê ji alîyê desteserîyeke tevayî dinêre, prensîpa demokrasîyê bi xwe tê bin pê kirin. Li gel ku **Medvedev,** hîn serokkomar e, zagoneke dijbertîlgirîyê ya nû pêş dibîne (5) û serokê nû yê Dûmayê **Sergey Narychkin** zêdebûneke berfireh a rola parlemanê pêşniyar dike (6), Putin radyoya *Dengvedana Moskvayê* û kanala televîzyonê ya ferdî ***Dojd*** (*Baran*) yên ji ber azadîya wan a îfadeyê navdar tehdîd dike, û rayedarî zext li Aleksandr Lebedevê fînanskerê rojnameya muxalîf *Novaïa Gazeta* dike...

Putin wê bi pey dewsgirtina xwe ya resmî, roja 7ê gulana 2012ê, çi bike? Li gor siyasetnasê alman **Aleksandr Rahr**, ev wekaleta nû dê çerxeke reformker bi xwe re bîne. Lê belê, ji bo gelek kesan, Putin bi tenê îfade û guherînên berbiçav pêşkêş dike, ne wek **Stolypin** lê wek wezîrekî din, **Grigori Potemkin**, ku serkeftinên xwe yên sexte li Katrin II pêşkêş kiribûn. Gelo muxalefeta îro neewle, wê bikaribe xwe bi awayekî siyasî bi rê xe, da ku biryarên wî bide guherandin?

* Birêveberê Navenda Lêkolînên Fransî-Rûsî yên Moskovayê.

1 "Şoreşên rengîn" –ya "gulan" a 2002ê li Gurcistanê; "şoreşa porteqalî" a 2004ê li Ukraynyayê– hewldanên jitextxistina desthilatên heyî bi çalakîyên gel in

2 *Bnr.* rapora pêşî ya Rêxistina ji bo Ewlehî û Hevkarîyê li Ewropayê (REHE) li ser malpera wê Golos, rêxistina ne hikûmetî ya bispora van çavdêrîyan, hûrgilîya karên nelirê dide lê weha texmîn dike ku Putin wê bê van karên nelirê jî di dora yekem de bihata hilbijartin

3 *The New Times*, Moskva, 31 cotmeh 2011

4 Fiona Hill û Clifford G. Gaddy, "Putin and the Uses of History", *The National Interest*, Waşîngton, 4 çile 2012

5 *Nezavisimaïa Gazeta*, Moskva, 14 adar 2012

6 *Nezavisimaïa Gazeta*, 15 adar 2012

Wergera ji fransî: Simko Destant

# Di nîqaşê de Yekîtîya Sovyetan

JEAN-MARIE CHAUVIER

Piştî 20 salên nemana xwe, bloka sosyalîst û YKSS (Yekîtîya Komarên Sovyeta Sosyalîst) hê jî li Rûsyayê pirsan derdixin holê û nîqaşan zêde dikin. **Andrei Graçev** bi saya vêkolîneke bi rêk û pêk (1), "dabaşa wenda" (bi xalepirsekê) ya pîşekarê perestroykayê yê ku dixwest di heman demê de YKSSê û cîhanê biguherîne ronî dike. Şêwirmendê kevin ê **Mîxaîl Gorbaçov**î dide nîşan ku serokê pêşîn û dawî yê YKSSê çawa, gav bi gav dev ji hêza welêt a ku di 1985ê de hê jê dihat tirsîn, berde. Di vê lêkolînê de dîmena şagirdê efsûnkar ku ji çalakîyên xwe bêhntengî bûye, kêm xuya ye.

Nivîskar li dijî teorîyên ku rola bingehîn didin Rojavayê, derdikeve. Li gor wî, daxwaza ku kir sîstema sovyetî bi dawî bê, ji nav Rûsyayê hat, ji rêveberîya sîstemê hat, ji ber ku beşeke mezin ya elîtên sovyetî dixwest ji komûnîzmê xilas bibe: Ev YKSS bû ku biryara bidawîanîna şerê sar, azadkirina dewletan ji wesayetên xwe heya "serwerîya bisînor" a Ewropaya navend û ji nû ve yekbûna Almanyayê da, tevî ku **Mîxaîl Gorbaçov** hewl da ku ketina wê ya nav Organîzasyona Peymana Atlantîka Bakur (NATO) asteng bike.

Sedema vê polîtîkayê ev e ku **Gorbaçov**î dixwest herikîna çekdarbûnê ku zirar li YKSSê dikir, bi dawî bianîya û ku dixwest bawerîya Rojavayîyan bi nêta xwe ya baş bîne. Bi vî awayî şefê Kremlinê dê *"gavên pêşîn"* heta bêçekkirina yekalî ya welêt zêde bikira. Dewletên Yekbûyî dibe ku xwe di berê cîhanê de wekî namzeda hêza hîper/hêza pir mezin a rayedar hîs kir. Êdî qonaxa, veger jê nîne, hatiye; dema ku Moskova bi Washingtonê re di 1990ê de hevgira biryara (Neteweyên Yekbûyî) destpêkirina şerê li dijî Iraqê ye û li gel vê yekê jî heyeteke xwedî peywir dişîne Bexdayê nik **Seddam Husên** da ku xwe ji hatina dijberhevbûnê bide alî. **Evgueni Primakov** ê ku bisporê pirsgirêkên ereban e, îdîa dike ku Wezîrê Kar û Barên Derve yê Sovyetê, **Edouard Chevardnadze** ev kar li Washingtonê sabote kir, lewra ew alîgirê vebijêrka leşkerî bû.

Berhema **Graçev**î bi detayên raveker ên li ser şertên jidayikbûna pergala nû ya global, dagirtî ye, bêguman ji *"ramana nû"* ya **Gorbaçov**î dûr e, ê ku xwe lê datîne ku "azadîya hilbijartinê" bê îstîsna ji bo tevahîya gelan misoger dikir… Gelo ew pêxemberê serdema zêrîn bû ku tê, an Dilpaqijê Stavropolê bû –bajarê wî yê jidayîkbûnê? Nivîskar van pirsan ji bo nîqaşê vekirî dihêle. Nivîsa wî ji hêlekê ve pêşkêşkirina **Anatoli Tcherniaev**î rast derdixe. (2) Ev peywirdarê bilind ê kevin ê Komîteya Navendî (beşa navneteweyî) di rojnivîsa xwe ya kêmdîtî de, ya ku ji 1972yê heya 1991ê nivîsîye, tabloyeke metelhiştî ya xirabûna têkilîyên di navbera *Partîya Komunîst a Sovyetîa Yekbûyî* û "partîyên bira" yên rojavayî de nîşan dide; li gor wê "eurokomunîzm" bi rêgeza tijî ji bo vê têkoşînê bandor li ser berpirsîyarên sovyetîk kiriye.

Şêwirmendê **Mîxaîl Gorbaçov**î yê ji 1985ê heya 1991ê, **Tcherniaev** berhema xwe bêyî redkirina têkçûnan, rave dike û diparêze. (3) Şahidên din bi aşkerahî zêdetir rexnegir nêzîk dibin: Bi vî awayî, **Anatoli Gromîko**, kurê şefê dîplomasîya sovyetîk (1954-1986) di adara 1985ê de **Gorbaçov**î dide hilbijartin û wisa dixuyê ku li vê poşman bûye, an jî **Valentin Faline** jî, bisporê Almanyayê ye, li gor wî jî hevdîtinên li ser yekbûna Almanyayê dikarin çêtir bin. Ev ramanên heterodoks ku li Rûsyayê belav dibin, li ba fransîyan nayên qebûl kirin. Ev raman piştevanîya rêveçûna cureyeke bûyeran dikin ku li ba me tuneye: Ya kapitulasyoneke YKSSê ku bêhêzîyên **Gorbaçov**î û îstismarkirinên wan ji alîyê rêveberên rojavayî ve lê zêde dibin, ev birêveber bêhtir bi pêşxistina avantaja stratejîk mijûl in, ne bi guhertina ramanên xwe yên wêrek.

1 Andreï Gratchev, *Gorbatchev, Şertê Wendakirî ? Ji perestroykayê Heya Jihevketina YKSSê, pêşgotina Hubert Védrine, Armand Colin, Paris, 2011*

2 *Anatoli Tcherniaev, Sovmestnyi Iskhod ("Mijara Gel"), Journal de deux époques (Rojnivîsa du Serdeman). 1972-1991, Rosspen, Moskova, 2008*

3 *Di kitêba bi îngilîzî derçûyî de qala vê heyamê tê kirin: Anatoly Tcherniaev, My Six Years with Gorbatchev (Şeş Salên min bi Gorbaçovî re), Pennsylvanian State University Press, 2000*

Wergera ji fransî: Sevda Orak

Cîhana piçûk a lîberalîzmê: Portekîz

# Li Portekîzê zanîngeha lihevhatinê

Owen Jones *

Avantaja Lîzbonê beramberî Atînayê? "Helwêsta wê ya lihevker a di warê siyasî û civakî de", berî demeke nêz gerînendeyê ofîsa Portekîz a Fona Diravî ya Navneteweyî îkna kir. Ev "aheng" zêdetir ji rizayeke gel a beramberî kemerşidandinê ya ku "rizgarkirina" welat xwe li ser ferz dikir, weke zewaceke ecêb a hundirîn a bijarteyên xwecihî yên (çi bigre) hemû ji navenda heman zanîngehê derketine, tê tarîf kirin.

Dekanê Fakulteya Karsazî û Aborîyê ya Nova ya li Lîzbonê Profesor **Ferreira Machado** dibêje: "*Ez dikarim bi telefonekê bi wezîrekî, serokwezîr û serokdewlet re kom bibim*". Profesor **Machado** zilamekî bi berçavk e û zû bi heyecanê dikeve. Weha xuya dike wekî ku êdî dema wî hatiye û bandora fakulteya wî jî ne hindik e. Lê belê di îlona çûyî de gotareke ***Financial Times*** piştgirî da wî: "*Di dîyara krîza deyna neteweyî ya Portekîzê de şandeyeke pêşdehatîyên Yekîtîya Ewropî û rayedarên Fona Dravî ya Navneteweyî (IMF) çûn seredena vî welatî da ku li ser piştgirîya darayî ya ji bo deynê wî yê 78 mîlyar euroyî gotûbêjê bike. Ev seredan di raya giştî de nehat bihîstin. Rojnamegerên radyo û televîzyonê, ku bi rojan li seranserî bajêr çûn û hatin, li xwe mukir hatin ku wan nikarîye şopa wan kombûnên nepenî û bêdem peyda bikin*". Di naverasta kampanyaya hilbijartinên giştî de gelê Portekîzê lava dikirin ku derbarê vê kombûna sêserî- YE, IMF û Bankeya Navendî ya Ewropî- de tiştan hîn bibe da ku bizanibe ka ew dê doza çi li wan bikin. Profesor **Machado** weha tîne bîra xwe: *"Bi rastî, du alman û danîmarkîyek serê sibê zû bi awayekî dizî ji otêlên xwe derketin da ku digel rayedarên bilind ên Fakulteya Aborîyê ya Zanîngeha Novayê re taştê bixwin. Ev fakulte yek ji du baştirîn dibistanên karsazî û aborîyê yên welêt e. Wan ji dil dixwest ku dîtinên me bibihîsin"*. (1)

Bi korîdorên xwe, ku tê re ba tê û dîwarên xwe yên tazî Nova bêhtir dişibe nexweşxaneyeke xalî ya terkkirî. Wekî li her zanîngehekê, li vê derê jî komên xwendekaran, ku di destê her yek ji wan de çendîn pirtûk hene, li der û dora zanîngehê ne. Tevî ku ev der zanîngeheke dewletî ye jî, divê xwendekarekî lîsansê di salê de 900 euroyan bide û ev hejmar ji bo welatekî wekî Portekîzê ku lê deramedа herî kêm a mehane 485 Euro ye, gelek zêde ye. Xwendekarên wê, ne bi tenê portekîzî ne: Xwendekarên ku bi asta baş a zanîngehê ya navneteweyî bihîstine, ji 30 welatên cuda tên. *Financial Times*, ku navenda wê li Londrayê ye, bernameya mastera darayî ya vê zanîngehê di nav sî zanîngehên herî baş a cîhanê de bi cih dike. Ewên ku li vê derê MBA ya Ewropî diqedînin dikarin 15 caran ji deramedа herî hindik pirtir maeşê bistînin. (2)

Wezîrê darayî yê hikûmeta berê ya sosyalîst û profesorê zanîngeha Novayê Luís Campos e Cunha ji kombûna sêserî re nehatibû vexwendin. Ew wekî ku ne di xema wî de be dibêje: *"da ku dîtinên min werin bihîstin, hewcedarîya min bi taştê nîne."* û lê zêde dike ku wî bi xwe lobî kiriye *"ku tatîl werin kêm kirin û saetên karkirinê serê rojê nîv saetê were dirêjtir kirin. Jixwe di kombûnê de ev pêşnîyar hat pêjirandin". Dema ku min jê pirsî çawa? Wî got: " Min di rojnameyan da tiştên ecêb xerîb nivîsandin û min roportaj dan wan."* Wî bi serbilindî lê zêde kir: *"Gelek caran- di salê de sê çar caran- gotinên min di parlamentoyê de tên dubare kirin. Ev yek tê wê wateyê ku endamên parlamentoyê gotarên min dixwînin"*.

## Coş û dilbijîna ji bo hilhatinê

Profesor **Machado** bi kurtasî dibêje: *"Ew ji elîtekî civakî bêhtir, elîtekî entellektuel in."* Lê belê di navbera elîtên desthilatê de nuans hertim ne zelal in. (3) Nova bûye tramplena siyasetmedarên herî bi bandor ên welêt û herweha ya karsazan. Wezîrê darayî **Vitor Gaspar**, ku ji ber tedbîrên wî yên tesserufê gazin jê tên kirin, xwendekarekî berê yê Novayê ye. Zanîngeh bi beşdarbûna siyasetmedarên mezin mazûvanîya çendîn çalakîyan dike: Wekî mînak di meha yekê de bi beşdarbûna wezîrê tendurustîyê **Paulo Macedo** gotûbêjeke li ser dahatîya sîstema tendurustîyê ya Portekîzê hatiye li dar xistin. Gelek mezûnên Novayê di payeyên bilind ên şirketên mezin de dixebitin. Gerînendeyê giştî yê berê yê *Vodafone Portekîzê* **António Carrapatoso** jî xwendekarekî berê yê Novayê ye. (*ew herweha alîgirê serokwezîr **Pedro Passos Coelho** ye*.) Ev lîste weha dirêj dibe û diçe.

Ji ber ku Portekîz welatekî piçûk e, lewma Nova dikare giranîya xwe bide hîs kirin. Elît ne ewqas gelek in û akademîsyen, siyasetmedar û karsazên sereke hemû hevdu nas dikin. Li gor **Luís Macedo Pint de Sousa**, ku pêşengîya têkoşîna li dij gendelîya li Portekîzê dike, destûra welêt *"pergala derîyê çerxî" teşwîq dike"* ku *" gelek peymanên ku ji alîyê wezîran ve hatine îmze kirin digel şirketên wan kesên xwedî paye ne û ew dê di dahatîyê de bi kêr werin... Li gor destûra me wezîr nikarin bibin endamên parlamentoyê, ku ev yek jî berevajî sîstema li Brîtanyayê ye... An ku ew dikarin ji sektora taybet werin girtin- ku niha piranîya wan jî weha ne."* Û paşê jî wezîrbûn ji bo dahatiyeke tije berjewendî dergeheke zêrîn vedike.

Hêsan e ku were dîtin ka elîtekî weha ji nêz ve girêdayî, ku bala xwe dide siyasetên li gor berjewendîya pîyaseyan, ji bo fikrên dibistanê dikare bibe zêvîyeke berhemdar. Herweha nebûna sazgehên hevbeş, ku bikaribe hin siyasetên din pêşnîyar bike, sedemeke din a vê bandora Novayê ye. **Campos e Cunha** dibêje: "*Li Portekîzê sazgehên serbixwe yên bîr û ramanê (**think tank**) gelek hindink in, heta tunene jî. Lewma zanîngeh meyl dikin ku vê rolê bilîzin*". Ji ber ku “***think tank”***ên bi şêwaza amerîkî yên wekî *Weqfa Heritage* (Mîrat) *û Navenda Pêşketina Amerîkayê*, aktorên payebilind ên muxalefetê yên Partîya Sosyalîst a navend-çep û Sosyal Demokratên navend-rast bi rêk û pêk bi mamosteyên fakulteya Novayê dişêwirin.

Mamosteyên sereke yên Novayê îdîa dikin ku sedema bandora wan ji ber lêkolînên wê yên objektîf in: Ku zanîngeh bi ser pevçûnên nav civaka portekîzî de ye. **Ferreira Machado** îdîa dike ku zanîngeh *"dîtinên serbixwe"* pêşkeş dike ku *"bi hestîyarî nehatine teşe girtin"*. Ew weha dirêjîyê pê dide: *"dîtineke xwedî agahîyan lê belê serbixwe; ew hetirîyê tu lobîyan nîne"*. Lê belê, tevî ku tê îdîa kirin ku îdeolojîya zanîngehê ji hev belav bûye jî, tu hewldan nîne ku ev lihevkirina îdeolojîk were veşartin. Profesor **Ferreira Machado** dîyar dike ku: *"Di nav mirovan de, ku heman dîtina cîhanê par ve dikin, hîmeke hevbeş heye: Di asta têgihiştinê de hevbîrîyek heye ku divê berhemdarî were zêde kirin, pîyaseya serbest hebe, di pîyaseya kedkarîyê de reform werin kirin, bêhtir reqabet û rola dewletê hebe. Di vî warî de lihevkirinek heye. Cihê ku lê gengeşî heye ka di maweya kurt de, an ku sibê em ê çi bikin, ku em jî niha behsa wê dikin. Lê belê li cem me heman hesta cîhetê heye"*. Li ser pirsa; *gelo di Novayê de alîgirên aborîya **Keynesyen** heye*, Profesor **Campos e Cunha** dikene.

Aborîzanên Novayê hevbîr in ku wan di warê pakêta xelaskirina deynên welêt de hin tevkarîyên girîng kirine: Tewangbarkirina pîyaseya kedê, kêmkirina lêçûnên sosyal û bilindkirina Baca Nirxê lê Zêdekirî. An ku heman formula ku li Yûnanistan, Îrlanda, Îspanya, Îtalyayê hatibû sepandin, ku niha jî li Fransayê tê sepandin. Gelo dibe ku bandora Novayê ya li ser kombûna sêserî jê kêmtir bû, ku tê gotin? Gelo ev yek bi tenê ji bo meşrûkirina tedbîrên tesserrufê nebû, ku ji berê de ji alîyê ***Bruksel*** û ***Frankfort***ê (*Paytextê Kentucky li Amerîkayê*) ve hatibûn pejirandin?

Ji Novayê, yan jî ji derekî din derketibe, ne xem e, weha xuya ye ku vê reçeteyê nikarî gelê Portekîzê îqna bike. Dema ku di 24ê meha yanzdeh a 2011ê de du federasyonên sereke yên sendîkayan duyem grêva dîroka Portekîza demokratîk bi rê xist, karkeran li pêşîya Parlamentoyê slogan qêrîyan: *"25ê nîsanê her berdewam, rizgarbûna ji faşîzmê her berdewam."* 25ê nîsana 1974ê de efserên çepgir ên artêşê dîktatorê "Dewleta Nû" ya zordest **Antonio Salazar** daxistin, ku ev jî bû destpêka Şoreşa Qerenfilan. Gelo wateya vê yekê ew e ku demokrasî û siyasetên Novayê şîretan li ser pevçûnê dike?

## "Eger mirovî karibûya navbêrek bidaya demokrasîyê..."

Wekî bersiv Profesor **José Neves Adelino**, ku rêveberîya bernameya MBAyê ya Novayê dike û endamê lijneya rêveberîyê ya çendîn şirketan e dibêje: *"Eynek werê. Min jî behsa vê yekê dikir"*. Ew pergala tendurustîyê nîşan dide û dibêje heta niha *"siyaset ji bo wê yekê bû ku hin kes werin hilbijartin"* û herweha îdîa dike ku sîstemeke serbest a gerdûnî nikare bibe domdar. Profesor **Ferreira Machado** *"Dibêjin bila xizmeta tendurustîyê belaş be û li ser hasilata neteweyî 20 dersed deyn were bar kirin û divê tu bigihîjî merheleyeke weha ku tu bikaribî bi xizmeta tendurustîyê berdewam bikî. Di demokrasîyan de di leha statukoyê de teyamul hene. Çima? Ji ber ku tu dizanî ji ber reforman kî wenda dike, komên baş dîyarkirî, komên fişarêlê yê ku dê qezenc bike berfirehtir e: Nifşên me yên dahatî û hemû civak". Li gor wî çareserî: "Serokeke me ya muxalefetê hebû ku dihat rexne kirin ji ber ku gotibû ka em ji bo şeş mehan demokrasîyê rawestînin! Û helbet wê xanimê piştgirîya wê yekê nedikir -wê dixwest bibêje pevçûna navbera du tiştan. An ku wê digot heger me demokrasî bixista nav parantêzan, wê demê pêkanîna reforman dê hêsantir bibûna"*.

Lê belê hîna hêvîyên **M. Habib** hene: *" Heger rastîyê bibêjim ez bi çavekî erênî li aborîyê dinihêrim û bi dîtina ciwanên me yên 18-19 salî, ez baştir dibim ji ber ku ev nifş dê di asteke berfireh de welêt biguherînin"*. Dekan jî digel wî hevbîr e. *"Di şûna bandorkirina li ser hikûmetê, ew dixwazin guh bidin nifşê nû ya qanûnçêkeran"*. Gelo ew dê werin hilbijartin? Kî dizane. Ew jî dê ji Novayê derkevin? Ew ji vê yekê şik nake.

* Rojnameger. Nivîskarê *Chavs. Nîşandana çîna karker a wekî xebîsan,* Verso, Londra, 2011. (Nîşeya wergêr: "Chav" peyvek e ku li Brîtanyayê ji bo wan xortan tên bi kar anîn ku ji varoşan tên. Wekî peyva "kiro" ku li Tirkîyeyê ji bo kurdan tê bi kar anîn.)

1 Peter Wise, "Portekîz: Radeyeke bandorê", *Financial Times*, Londra, 19.09.2011

2 "Derecekirina Fakulteyên Karsazîyê 2011", *Financial Times*, http://rankings.ft.com

3 Bixwînin, *Manière de voir, hejmar* 122, nîsan-gulan 2012

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

## Dezgeheke ceribandinê

Gerînendeyê Perwerdehîya Birêveber li Dibistana Karsazî û Aborîyê ya Novayê **Nadim Habib** dibêje: "*Carna bi min weha tê ku Portekîz ji bo wan tiştên ku niha li seranserî Ewropayê di astên cuda de pêk tên, were test kirin. Gelo Ewropa naçar bimîne weha berdewam bike, yan mezinbûn û îdealîzmê berdewam bike û ji xwe re rêyekê bibîne ku vegere wê merheleyê ku Ewropa dixwaze bigihîje*". Heger bi rastî jî Portekîz ji bo wan polîtîkayan, ku li dereke din werin sepandin, ceribandinek be, wê demê civakên ewropî ji dema hilweşîna komunîzmê û vir ve li kêleka veguherîna herî mezin a sosyal de ye.

Piştî ku krîzê li Yûnanistan û Îrlandayê xist, Portekîz sêyem welatê Yekîtîya Ewropayê bû ku piştgirîya darayî werdigirt. Di gulana çûyî de beranber pakêta 78 mîlyar euroyî ya ji YE û IMFyê hikûmeta Portekîzê qebûl kir ku heta dawîya salê lihevderneketina budçeya welêt ji 9.1 dersedê Hasilata Neteweyî daxîne 5.9 dersedê û heta 2013ê jî bixîne 3 dersedê. Da ku bigihîjin van armancan **Vitor Gaspar**ê wezîrê darayî dîyar kir ku lêçûnên giştî dê 7 dersedan were qut kirin û heta 2015ê bigihijîn 43.5 derseda Hasilata Neteweyî. Wekî ku **Gaspar** bi xwe dibêje ev yek projeyeke "*bê hempa*" bû ji demeke 50 salî û vir ve. (1)

Pêla pêşîn a radîkaltirîn bernameya arizîkirinê ya dîroka Portekîzê di meha yanzdehê de dest pê kir dema ku dewletê hîseya xwe ya di şirketa enerjîyê ya bi navê ***Energias de Portekîz*** de firot şirketa mezin a çînî ***Three Gorges Corporation***. Îdareya balafirgehê, rêyên hewayî yên neteweyî, av, radyoya neteweyî û transporta giştî jî dê di pêşîya me de werin firotin.

Dema ku sînorên dewletê ji nû ve tên saz kirin, standardên jîyanê yên karkerên bi deramedа hindik û navîn tûşî tengasîyeke şidandî dibin. Baca nirxa lê zêdekirî ji 6 dersedê rabû 23 dersedê, fatoreyên enerjîyê yên portekîzîyan bilind bû û par baceke lêzêde ya deramade bi rêjeya 50 dersedê maeşên meha li ser hemû karkeran hat ferz kirin. Wekî li welatên din ên Ewropaya Başûr karmendên giştî piranî bi teqsîdan pereyê xwe distînin; Niha ji wan kesan, ku mehê zêdeyî 1000 euroyan qezenc dikin, du teqsîd tên birîn. Heger ew hemû bi giştî werin nirxandin, karmendên sektora giştî dora 25 dersedê deramedа xwe ji dest dan. (2) Sîgortaya bêkarîyê, ku bêkarî her ku diçe mezintir dibe, bi qasî 17 dersedan hat birîn û dikare herî zêde 18 mehan were stendin. Rewşa xebatkarên sektora taybet jî baştir nîne: Wekî mînak hikûmetê saetên xebatê yên rojane nîv saet dirêjtir kir, an ku di salê de 15 rojên xebata bêpere.

Ji niha de buhayên cidî yên vê seferberîya îdeolojîk hene. Bankaya Navendî ya Portekîzê bi van gotinan: Ji ber ku di taleba neteweyî de ketineke xerabtir pêk hat, ku nedihat payîn- ku tedbîrên tesserrufê aborîya welêt heland- di destpêka meha yekê de gumanên aborî daxistin. Bankaya Navendî ji bo sala pêşîya me 3.1 dersed nakokî guman dike. (3) Dema ku acenteya kredîyê ***Standard & Poor*** notên neh welatên ewropî kêmtir kirin, rewşeke kambax ket para Portekîzê. Acenteya kredîya biryara xwe bi van gotinan mafdar nîşan da: "*Em bawer dikin ku pêvajoyeke reformê, ku bi tenê li ser esasa tedbîrên tesserufê were bi rê ve birin, rîska xwe bi xwe têkbirinê jî bi xwe re tîne. Ji ber ku ji ber fikarên serfkaran ên ji ber wendakirina karên wan û kêmbûna deramedа wan taleba nav welêt jî dikeve û ev yek jî deramedа neteweyî ya bacan kêmtir dike*". (4) Portekîz di dawîya 2011ê de gihîşt mebestên xwe yên lihevderneketina budçeyê, lê belê ev bi tenê ji ber wê yekê bû ku Portekîzê dest avêt dora 5.6 mîlyar euro ya fona teqawîdbûnê. (5)

1 *Financial Times*, 31.08.2011

2 "Tirsa ji ber reformên "kozmetîk", ji ber ku tedbîrên Portekîzê dev li mirovan dike", *Financial Times*, 24.10.2011

3 Dîmena aborî ya Portekîzê kêmtir dibe, *Wall Street Journal*, 10.01.2012

4 "Kengî, dê kengî Ewropa rastîyan bibîne?", *Daily Telegraph*, Londra, 16.01.2012

5 'Portekîz dest diavêje fonên teqawîdîyê da ku bigihîje armancên xwe' *Daily Telegraph*, 02.12.2011

Krîza yûnanî ne nadir e. Lê belê, welatên din ên di bin barê giran ê deynan de mayî, wek Arjantîna dehsalên 1990-2000ê, biryara êdî deynên xwe nedin girt. Ev meseleya nîşandêr hem mantiqê ku ber bi bobelatê ve diajo, hem mekanîzmayên ku dikarin rêyeke derketina ji tengasîyê bidin Atînayê, xuya dikin.

## GELO KEMBERŞIDANDINA ABORÎ QEDEREK E?

# Li himberî deyndêran, bêrûtîya arjantînî û tirsonekîya yûnanî

MAURICE LEMOINE *

Di serî de fikireke gelek zîrek hebû. Gava ku tê ser kar, 1989ê (1) ji bo ku dawîyê li enflasyona ku welêt dide ber pêlên xwe yên rûxîner bîne, serokkomarê peronîst **Carlos Menem** –tevlî superwezîrê xwe yê aborîyê **Domingo Cavallo** yê li Harvardê perwerdebûyî û kevnememûrê dîktatorîyê (1976-1983) – rêjeya pevguherandina dovîza arjantînî bi awayekî hişk asê dike: 1 peso bi 1 dolarê. Ew vê pergala bi navê *"currency board"* di Destûra Bingehîn de dide nivîsandin. Ev siyaseta ku sifeta *"big bang"* lê hatiye danîn û ji destpêkê ve Fona Diravî ya Navneteweyî (FDN) teşwîqî wê kir, pêşî bi ser dikeve: Enflasyon ji holê radibe û rabûn xurt dibe. *1ê çileya 2001ê, Yûnanistan şertên Maastrichtê temam dike û tevlî devera euroyê dibe. Salek bi şûn ve, diravên bi dovîza nû derbkirî cihê diraxmîyê, kevnepereyê neteweyî digirin.*

Li pey krîza meksîkî (1994-1995), ***Buenos Aires*** zehmetîyan dikişîne ji bo ku xwe li bazaran fînanse bike: Zêdebûna rêjeyên faîzê –ku digihîjin % 20ê– li ser budceya wê giran dibe. Piştî çend krîzên ku li neteweyên bipêşdikevin xist (Asyaya başûr-rojavayî, Rûsya, Brazîl), nirxê dolara veberanîna penahîyê bilind dibe. Zewaca evîna *peso* û bileta kesk, vedigere li Buenos Airesê dixe: Hikûmeta ku tevahîya xweserîya Bankaya Navendî jê standibû, desteserîya siyaseta xwe ya diravî jî ji dest da. Hin cîranên mezin ên wek Brazîlê nirxa dovîza xwe nizm dikin û *dolar* li gor *euro*yê bilind dibe; wek encam, Arjantîn temamîya reqabetkarîya xwe di van bazarên nêz û dûr de winda dike. Bi vî rengî sala 1988ê bû sala derbasbûna ji mezinbûna aborîyê ber bi piçûkbûna aborîyê ve. *Li gel têketina euroyê, pîşesazîya yûnanî ji ber xurtbûna vê diravê li ber diraxmîyê zehmetîyan dikişîne: hilberîna wê "giranbiha" dibe.*

Dema ku, 24ê cotmeha 1999ê, **Menem** cihê xwe dide **Fernando de la Rúa** ê serokê radîkal ê koalîsyoneke navendçep, Bereya ji bo welatekî piştgirîya civakî (Frepaso), yê ku dûrî fikirên kevneserokwezîrê yûnanî **George Papandreu** nasekine, hingê fînans kavil bûne. Li gor hejmarên fermî, ji % 40 ji sî û şeş mîlyon arjantînîyan di binê sînorê feqîrîyê de dijîn. FDNa parêzvana kamil û herheyî ya cinsê mirovî soza deynekî 10 mîlyar dolaran dide hikûmeta nû, da ku ew dîsa deynên xwe fînanse bike, bi şertê ku ew bernameyeke kemerşidandinê bi cih bike. Desthilata bi qasî xulamekî nû rêzgir û dixwaze rê li ber çi muhletê, yan nebûna peredayînê bigre –deynê dewletê digihîje 147.8 mîlyar dolaran–, desthilat "planeke sererastkirina strukturel" saz dike. Hezîrana 2000ê, greveke giştî ya sî û pênc rojan welêt ditevizîne.

*Li 30ê mijdara 2009ê, tevî ku wezîrên fînansê yên ewropî endîşeyên xwe tînin zimên, Papandréou –yê ku şûngirê serokwezîrekî muhafezekar,* ***Kóstas Karamanlís*** *e– lê mikûr tê ku aborîya yûnanî di bin "lênêrîna ji nêz" de ye. Roja 3ê adara 2010ê, ew plana kemerşidandinê ya pêşî îlan dike.*

### Planên rizgarîya ji krîzê

Komeke aborînasên FDNê, Bankaya Cîhanî (BC) û Bankaya Navamerîkî ya Pêşketinê (BNP) li ser "planeke rizgarîyê" dixebitin –ku îlla wê bibe ya dawî. *"FDN wê rê nede Arjantînê ku ji alîkarîya sozdayî sûdê werbigre, heta ku hikûmet koma biryarên ji hêla serokkomar ve îlankirî bi zagon an, bi biryarnameyê nexe dewrê"* (2), **Stanley Fischerê** birêveberê giştî yê vê binesazîya ku, pêwîst be, carina pir xirab jî tev digere, roja 23ê mijdara 2000ê hişyar dike. Lewre jî, ***De la Rúa*** biryarnameyeke weha îlan dike ku bermayîyên xizmeta umûmî ya teqawidbûnê ji hev dixe, ewlehîya civakî ji rê derdixe, bazara kar sist dike û sektora tenduristîyê lîberal dike.

*Roja 23ê nîsana 2010ê, Atîna deynekî pêşî ya 45 mîlyar euroyan ji Yekîtîya Ewropayê û FDNê distîne.*

Qurbanên pêşî yên pev-çûnên di nav polîs û xwe-pêşandêran de dikevin rojevê. *Escraches* –dijûn, kevir an hêkên avêtî, êrişên fîzîkî–, rêbirîn û konserên beroşan *(cacerolazos)* li hev zêde dibin. Roja 18ê kanûna 2000ê, bi bikaranîneke aqilane ya bêkêrîyan, hevkarîyeke fînanskerên navneteweyî di bin rêveberîya FDNê de planeke "alîkarîyê" ya nû, bi mîqdareke 39.7 mîlyar dolaran di sê salan de, pêşkêşî ***Buenos Aires***ê dike. Bi xêra avêtina van gavan, Arjantîn xilas bûye! ***De la Rúa*** weha kêmkirineke nû ya mesrefên dewletê îlan dike û 20ê adara 2001ê, **Cavallo** yê "peso-dolar" wek wezîrê aborîyê hildibijêre. Vegera wî ya ku kêfa Borsa, FDN û bazaran (ji bo kêlîyekê) tîne, kelecana *Financial Times* jî radike: ji ber ku encamên wî *"navekî efsanewî li nav veberhênerên navneteweyî û siyasetnasên dinyayê jê re peyda kir"* (3). Hêvîyên serokwezîrê brîtanî **Anthony Blair** û serokkomarê amerîkî **George W. Bush** digihîjin esmanan û ew kêfxweşîya xwe bi raya giştî re parve dikin.

*Roja 2ê gulana 2010ê, ji bo* "dawîlêanîna krîzê", *wezîrên fînansê yên ewropî "planeke xilasîyê" ya 110 mîlyar euroyan pêşkêşî Yûnanistanê dikin.*

### Hertim ji gel fedakarî tê xwestin

Ji bo ku rê li ber nebûna dana deynan bigirin û ji ber ku ku mihleteke yekalî bi awayekî dogmatîk wek nemumkin tê red kirin, Cavallo "megapevguhertin"ê diafirîne, ku bi riya wê senedên deynê demkurt (29.5 mîlyar dolaran) bi senedên deynê demdirêj (heta sî salan) tên guhertin, lê belê di gel faîzên pir bilind –ev jî hatina bobelatê bi lez dike. Bi pey re, wî berê xwe da "sifir ziyanên



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Ka**, teknîka tevlihev, 77 x 54 cm

budceyî" û meaş û pansîyonên bêhtirî 500 peso % 13 kêm kirin, gaveke ku zerar da % 92 xebatkarên dewletê û % 15 teqawidan. Bi sedan şirketên piçûk û navincî (ŞPN) îflas kirin. Bi rengê webaya Çaxa Navîn, rezaleta aborî weha kir ku *piqeteros* –bêkarên ku çalakîyên rêbirînê pêk anîn– bi sedan rê girtin û girseyeke arjantînîyan jî greveke giştî roja 20ê tîrmeha 2001ê da dest pê kirin. Ajansên îdareya rîskan ***Standard & Poor's*** û ***Moody's*** xuya dikin ku dibe ew Arjantînê wek welatekî *"di rawestîyana teknîk ya peredayînê de"* rêz bikin. Berdevkekî malîyeya amerîkî peyamê temam dike û dibêje: *"Berî ku rewşa hevsengîya dilxwaz pêk were, bi ihtîmaleke mezin wê pêwîst be ku gelê Arjantînê gelek fedakarîyan bike".* (4)

*Roja 15ê hezîrana 2011ê, greveke giştî Yûnanistanê felç dike: Gel li hember bernameyeke kemerşidandinê ya nû û ji bo xilaskirina 28 mîlyar euroyan protesto dike. Li gel pevçûnên pirhejmar bi polîsan re, bername 29ê hezîranê hat pejirandin û 22ê tîrmehê rê li ber peredayîna planeke nû ya alîkarîyê ya 109 mîlyar euroyan vekir.*

Banka nikarin ji daxwazên vekişandina pereyê bi peso û dolaran re bibin bersiv û ji 3ê kanûnê pê ve, hikûmet biryarên sert ji bo bisînorkirina derketina pereyî ber bi derveyî welêt ve digre. Jê bêhtir, ew nahêle ku tasarufdar bigihîjin pereyê pêşin ê hesabên wan ên bankeyî û weha *corralito* ("bera piçûk") dixe dewrê. Gelo ev bes e? Bi rûdanka çakîyê, durûtî belav dibe: Tevî ku qezencên bacî li mijdarê rekoreke nû ya daketinê bi dest xist (- % 11.6), ji ber planên kemerşidandinê yên ku çalakîya aborî tevizand û paşxistineke sêsalî bi xwe re anî, ajansa ***Fitch*** nota deynê dewletê ya welêt ji **C**yê dadixe **DDD**yê (nedana deyna). FDN dide xuya kirin ku ew ê 1.26 mîlyar dolarên berê pejirandî nede.

Greva giştî ya heftem! Ji 12ê kanûnê ve, xwepêşandanên berfireh belav dibin û tên perçiqandin (heft mirî, sê sed û heftê û heşt birîndar). Ew rê li ber talankirina supermarket û dikanan vedikin, bi destê xizanên çi alîkarîya wan a civakî nemaye. Sinifa navîn dengê *cacerolazosên* xwe derdixe. Bê al û rayedar, bi sedan hezar kesên nerazî wek behreke bi hêrs pêl û bang didin. Bersiva tenê ya ***De la Rúa*** jî îlankirina rewşa awarte û xurtkirina zilma polîsî ye: Sî û pênc mirî û bêhtir ji çar hezar û pênc sed girtî. Lê belê, çalakbarîya gel qels nabe. Roja 19ê kanûna 2001ê, hikûmet bi pey Cavallo yê nefretkirî îstîfa dike. Dotira rojê, **De la Rúa** wekaleta xwe ya li **Casa Rosadayê** nîvco dihêle û siwarî helîkopterekê dibe.

*Rojên 19 û 20ê cotmeha 2011ê, greveke giştî û xwepêşandanên bi şiddet Yûnanistanê ditevizînin;* ***Dimitris Kotsaridisê*** *xwepêşandêr jîyana xwe ji dest dide.*

Tevî dîyarkirina bêhişîya şertên FDNê, Banka Cîhanî û hogirên wan (rengê "troykayekê"), **Rodríguez Saáy**ê peronîst ji hêla Kongreyê ve wek serokkomar tê hilbijartin. Li ber Meclisê, ew dibêje ku ew ê qurûşeke ji deynî jî nede. Ew doza siyaseteke nûdestpêkirinê dike, behsa sazkirina mîlyonek karan û dixwaze biryarên kêmkirina meaşên teqawidîyê û sistkirina hiqûqa kar betal bike. Ev qerarên pêşî –ku *"ji îmaja nûker û hevdem a serokkomarê demkî dixwaze nîşan bide bêhtir, dişibin gelperestîya herî paşvemayî"*– bazaran dixin endîşeyê (berdevkê wan ê li vir, rojnameya spanyolî *El País* e, roja 28ê kanûna 2001ê).

### Serok tên, serok diçin

Gel çareyên berbiçav dixwaze û xwepêşandan ji rê derdikevin. *"Çareya min tuneye û ez îstîfaya xwe ya bêveger pêşkêş dikim"*, Saá dibêje û heft rojên piştî hatina xwe ya li ser kar, dev ji dozê berdide.

**Eduardo Duhalde** yê peronîst jî, ji bo dawîya wekaletê, yanî heta kanûna 2003ê, tê tayîn kirin. Ew di panzdeh rojan de serokkomarê pêncem e. (5) Hikûmeta nûhatî "qanûneke awarte" dişîne Meclisê; ev qanûna 6ê çileya 2002yê pesindkirî jî, guhertinên bingehîn di warê siyaseta aborî de bi xwe re tîne. Ji bo nûdestpêkirina çalakîyê, wê dawîya "pevgherandina sabit a dovîzan" ya 1991ê ferzkirî, bê anîn û nirxa pesoyê % 30 bê daxistin. *"Axaftin û gavên avêtî hîn populîst in, lê belê bidîqattir in"*, *El País* 3ê çileyê dinivîsîne. "Populîst"? Jixwe: Rîsk heye ku şirketên pirneteweyî yên spanî, ku li Arjantînê wek li welatekî dagirkirî tev digerin û niha ji alîyê Borsaya Madrîdê ve bi giranî tên ceza kirin, ji ber daxistina nirxê 3 mîlyar euroyan winda bikin.

*Bijarteya parastina bi her awayî ya dewsa wê di devera euroyê de, riya daxistina nirxa pereyî ji bo hewldana nûdestpêkirina îxracatan li ber Yûnanistanê digre.*

Fîrmayên xwedî konsesîyonên xizmetên dewletî yên taybetkirî ku piranîya wan ji derveyê welêt hatine, zêdekirinên buhayan ji % 40 heta % 260 dixwazin. *"Di jîyana min de, tu cara evqas telefonên hemû şirketên li Arjantînê bicihbûyî ji min re nehatibûn ku nedixwestin em dest bidin imtiyazên wan"*, serokkomar **Duhalde** bi pey re got. (6) Roja 27ê çileyê, komîserê ewropî yê berpirsê karên diravî **Pedro Solbes** weha hişyar dike ku rengê tehdîdan digre, û *"kêmanî û nakokî"* yên bernameya aborî ya arjantînî şermezar dike. Bankayên *Crédit Agricole, Banco Santander* û *Bank of Nova Scotia*

direvin û bi dehan hezar arjantînîyî bê abor [û pere] dihêlin.

Tevî daxuyanîyên fermî yên ku kemerşidandinê diparêzin, hikûmet ji nerazîbûna veberhênerên bîyanî, Dewletên Yekbûyî yan FDNê bêhtir, ji teqîneke civakî ya din ditirse. Lewre jî, ew mihleta ku Saá îlan kiribû, berdewam dike. FDN ji serokkomar *"planeke lihevkirî"* dixwaze û weha bersivê dide: Heta siyaseta heyî berdewam be, ew ê tu alîkarîyê nede û ji bo dayîna deynî salek mohletê dide Arjantînê.

*Roja 31ê cotmeha 2011ê, Papandréou dide zanîn ku ew ê peymana zîrveya ewropî ya 27ê cotmehê (ya ku dîsa hedefa "rizgarkirina" Yûnanistanê bi zêde kemerşidandinê danîbû ber xwe) têxe referandûmê. Piştî nerazîbûnên Almanya, Fransa, Bruksel û FDNê, ew 3ê mijdarê ji ya xwe dadikeve.*

Di axaftina xwe ya peywirgirtinê de, **Duhalde** weha xuya kiribû ku depoyên bankeyî yên ji ber *corralitoyê* asêmayî dê bi dovîza esl bên vegerandin. Lê belê, ew soza xwe nayîne cih û dide zanîn ku tasarufdar ê pereyê xwe tenê bi pesoyan û ne bi dolaran werbigrin, li ser bingeha 1.40 peso ji bo dolarekê, tevî ku bi rêjeya veguhastinê ya serbest, dolarek jixwe bi 1.65 peso bû. Li meha nîsanê, FDNê ku tiştên berevajî hev dibêje –yan jî, belkî, qet nizane çi bike!–, 710 mîlyon dolaran ji bo fînansmana ziyana budceya wilayetan pêşkêş dike. **Duhalde**yê ku bi qasî muxatabên xwe heyranê mîzahên dubare ye, sozê dide ku ew ê ji mesrefên dewletî kêm bike. Di sê mehên rabihurî de, şirketan sed û heftê hezar kes ji kar avêtin; bêkarî bi fermî gihîşt % 25ê. Di eyaleta Buenos Airesê de, betalkirina borsayan sed û sî hezar şagirdên taxên xizan ji dibistanan derxistin. Daxistina nirxê zêdekirina buhayê berhemên neteweyî û itxalkirî ya heta % 30 (% 70 ji bo êrd) li ser bazirganan hat ferz kirin.

*Roja 20ê sibata 2012ê, wezîrên fînansê yên devera euroyê li hev tên ku ew ê alîkarîyeke zêde ya 130 mîlyar euro di berdêla biryarên nû yên kemerşidandinê de bidin Yûnanistanê,. Wezîrê holandî yê fînansê Jan Kees de Fager dixwaze ku Atîna di bin* "çavdêrîyeke herdemîn" *a Yekîtîya Ewropayê û FDNê de bimîne.*

Çavdêrî? Li Arjantînayê, mantiqekî cuda xwe ferz dike.

### Siyasetmedar, endamên hikûmetê, dadgêr êdî newêrin derkevin derve

Ji dawîya sala 2001ê, meclisên gelerî li her derî ava bûn, her weke rêxistinên bêkar û *piqueterosan*, şebekeyên pevguhastina milkan, koordînasyonên tenduristî an perwerdeyê; karker bi rengê xwebirêvebirinê kargehên devjêberdayî dîsa didin şixulandin. (7) Siyasetmedar, endamên hikûmetê, dadgêr êdî newêrin derkevin derve: Ew zêde tima û bertîlxurbûn; tevahîya welêt ji wan nefretê dike. Kabûsa kavilî serîhildana civatên cotyaran bi xwe re tîne. Li bajaran, *cacerolazos* dîsa dest pê dikin; sendîkayên bêkaran û yên din, rûniştevanên kevîyên bajaran ên birçîmayî, riya têketina paytextê asê dikin. Di kaoseke tevahî de, arjantînî bi banga *"Que sa vayan todos!" ("Bila hemû herin!")* dîsa isyan dikin û du mirî û sed û nod birîndaran li dû xwe dihêlin (herweha sed û şêst girtî).

Roja 26ê hezîrana 2002yê, perçiqandina hovane ya xwepêşandaneke *piqueterosan* -"qetlîama Avellanedayê"- dibe sedema du mirîyên din û sî û sisê kesên bi guleyan birîndar



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Gakovî**, kolaj, 46 x 45 cm

bûyî. Li hember nerazîbûna gel, Duhalde hilbijartinên şeş mehan pêşxistî, îlan dike.

Meha kanûnê, di kolanên Buenos Airesê de, nêzî sed hezar kesan dîsa dimeşin û "mecliseke gel" dixwazin ku tê de wê "guhertina radîkal a modela aborî" bê nîqaş kirin. Muzakereyên li gel FDNê yên ji kanûna 2001ê ve rawestandî, asêmayî dimînin. Ji bo pir kesan, Arjantîna ku wek Iraq, Lîberya an Somalyayê bûye paryayeke fînansî, ji xwe di gorê de ye. Civaknasê fransî **Alain Touraine** weha wê bi temamî bin ax dike: *"Îmkana wê tuneye ku xwe biguherîne û biryaran bigre. Wek yekîne, wek welat û wek pergala siyasî, ew miriye"*. (8) Belkî miriye, lê hîn dillive. Hem jî pir dilive.

Di ber kampanyaya hilbijartinan de, sê namzed li ser navê peronîsmê derdikevin pêş dengdaran: **Carlos Menem**, **Saá**yê serokkomarê demkurt û **Nestor Kirchner**, bi raya giştî nenas, lê belê walîyê navend-çepgir a eyaleta Santa Cruz (Patagonya). Li roja 27ê nîsana 2003ê, Kirchner û Menem bi ser dikevin, yê pêşî bi % 24.34ê dengan û yên din bi % 21.9ê dengan. Roja 14ê gulanê, Menemê ku anketan wek " têkçûyî-perçiqî" nîşan dida –û dabû zanîn ku, eger ew bê hilbijartin, ew ê ji bo dawîlêanîna xecirê bang li artêşê bike –biryar dide ku beşdarî dora duyem nebe. Roja 25ê gulanê, di axaftina peywirgirtinê de, Kirchner xwe wek parêzvanê edaleta civakî û roleke zêde ya dewletê xuya dike, da ku *"wekheviyê li şûna bazarê li cihên bazar were qewirandin bi cih bike"*. Tevî ku Dewletên Yekbûyî bi tenê memûrekî rêza duyem şand, sekreterê îkamet û pêşxistina bajarî **Mel Martinez**, her kes baş dibîne ku ji heyetên bîyanî, xelk herî pir ji bo serokkomarê kubayî **Fidel Castro**, yê venezuelî **Hugo Chávez** û yê brazilî **Luiz Inácio Lula da Silva** li çepikan dixe.

Veberhênerên bîyanî hê jî nûnirxandineke berfireh ya buhayên xizmetên dewletî yên taybetkirî dixwazin (biryareke ku FDN jî dixwaze). Herçî **Kirchner** û wezîrê wî yê aborîyê **Roberto Lavagna**, biryara çavdêrîya têketinên malîyeya spekulatîv didin û zêdebûneke % 50 a meaşê asgarî ji bo nûdestpêkirina danûstandinê îlan dikin.

### Arjantîn riyeke din dide ber xwe

Ji hingê ve, serokkomar siyaseteke berevajî ya ku welat xira kiribû dimeşîne. Ew "têkilîya yekgirtî" ya ji salên 1990ê ve li gel Dewletên Yekbûyî hebû, qût dike û berê xwe dide hêla pêşverû ya latînî-amerîkî. Ew rola îradeya di siyasetê de û rola dewletê ya di aborîyê de dîsa binxêz dike, saxîya fînansî û pêşketina parastinên civakî bi hev ve girêdide, her weke nûsazkirina erza pîşesaz û piştgirîya teleba gel. Ji îlona 2002yê ve, ji ber ji nirxketina xurt a pesoyê ku, bi parastina pîşesazîyê, rê dide vegirtina bazara navxweyî û şûngirtina hin îtxalatan, mezinbûna aborîyê vedigere; rêjeya wê jî ji dînamîzma îxracatan sûdê werdigre û pir bilind dibe.

Jixwe, FDNa ku şahida vê mezinbûna aborîyê bû ji Buenos Airesê dixwaze ku ew beşeke ji zêdeyîya qezencên fînansî yên xwe yên bacî ji deynî re veqetîne. Bersiva **Kirchner** jî ev e ku ew ê dîsa dest bi dana deynî bike, heke aktorên fînansî pareke deynê wan betal bikin. Li îlona 2003yê, bi boneya meclisên giştî yên FDNê û Bankaya Cîhanî ku li Dubayê pêk tên, ew bi xwe erza xwe ya *" te divê qebûl bike, te divê dev jê berde"* tarîf dike û li şûna ku serê xwe li bazarê bitewîne, ew yekser pêre muzakereyê dike. Ew weha ji cendirmeyên diravî mihletekê distîne ku vegerandina 12.5 mîlyar dolaran bi sê salan (heta îlona 2006ê) taloq dike, tarîxa peredayîna 2.43 mîlyar dolaran, mîqdara deynê Aarjantînê diviyabû heta hingê bida, dirêj dike û noqteya herî girîng, red dike ku soza bicihanîna çarenameyên adetî yên Fonê bide.

Vê pozîsyona tund encam da, û struktura ku 25ê sibata 2005ê hat bi dest xistin, emsaleke girîng û heta mînakek jî çêkir. Wê rojê, Arjantînê kêmkirineke deynê dewletî, çi navxweyî û çi derveyî (178.7 mîlyar dolaran), ferz kir, bi rêjeke daxistineke % 75 li ser 82 mîlyar dolaran – daxistina herî mezin a herdemî. (9) Ji vê miqdarê, % 43.5 di destên tasarufdarên takekesî û neniştecih de bû (piranîya wan jî îtalî û alman), % 34.5 aîdê veberhênerên sazûmanî yên bîyanî û % 22 di bin xwedîtîya arjantînîyan de bû. Mîqdarên ji FDNê, Bankaya Cîhanî û sazûmanên navneteweyî yên din ve hatî xwestin, neketin ber çarçoveya peymanê. (10)

Jê re *"populîst"* dibêjin û ji ber redkirina krîmînalîzekirina protestoyên civakî rexneyan lê dikin, carina bi otorîtarîzmê jî wî gunehbar dikin, lê serokkomar **Kirchner**, tevî ku hemû pirsgirêkên welatê xwe çareser nekiribin jî, hejmareke şirketên stratejîk dîsa neteweyî kirin –posta û teleragihandin, av, veguhastina hewayî–, bernameyên civakî yên girîng fînanse kirin û rêjeya xizanîyê di çar salan de daxist nîvî. *"Me ji bo deynê herî giran ê dinyayê, muzakereya herî serkeftî meşand"*, wî vê roja 25ê sibata 2005ê li Dubayê îfade dikir. Meha kanûna din, bi xêra alîkarîya Venezuelayê (ku bi qasî 1.6 mîlyar dolarên deyn standin), welat bi yekcarî deynê FDNê lê vegerand (9.8 mîlyar dolar). Dîsa jî, rexne lê hatin girtin. Lê belê, ji bo Buenos Airesê, armanca sereke ya avêtina vê gavê ev bû ku berpirsyarên bobelata 2001-2002ê dîsa destê xwe di rêvebirina karên welêt wernedin.

Bi vedîtina hikumdarîya xwe, welat bi awayekî bi heybet rabû, heta ku hilberîna hindûrîn a brut (HHB) li nav 2003 û 2011ê sê qatan bilind bû. Baş tê zanîn ku sektora îxracatan a yûnanî û ya arjantînî ne yek in û ji 2001ê ve, Buenos Airesê ji çakîya aborîya dinyayî ya bi xêra kredîya erzan û taleba çînî ya maddeyên xam feyda wergirtiye. Atîna nikare ji derdoreke wisa sûdê werbigre da ku dîsa rabe ser xwe.Lê dîsa jî, divê ew ji vê serhatîya berê dersê bistîne. Dersa ku sala din, **Joseph Stiglitz**ê wergirê 2001ê yê xelata ilmên aborî yên Bankaya Swêdê ji bo bîranîna **Alfred Nobel**, bi çavdêrîya karesata arjantînî, weha gotibû: *"Her aborînasekî/e ser xwe dê pêş bidîta ku siyasetên kemerşidandinê wê bêyî gihîştina armancên budceyî ber bi hêdîkirineke çalakîyê ve bibira"*. (11)

Û îcar heke em niha li rewşa Yûnanistanê bihizirin?

* Rojnamevan.

1 Bi navincî % 1 105 li nav 1985 û 1990ê

2 *El País*, Madrîd, 24 mijdar 2000

3 Vegotî di *Courrier international*, Parîs, 20 kanûn 2001

4 *El Nuevo Herald*, Mîamî, 14 tîrmeh 2001

5 M. Ramón Puerta di navbera 21 û 23yê kanûna 2001ê de dibe cîgirê serok û Eduardo Camaño jî ji 31ê kanûna 2001ê heta 2yê çileyê 2002yê (yê vî jî dîsa cîgirî bûye). (11) Straits Times, Singapore 10 çile 2002

6 *Le Monde*, 8 çile 2002

7 Bixwînin Cécile Raimbeau, "En Argentine, occuper, résister, produire/li Arjantînê, dagirkirin, berxwedan, hilberandin", *Le Monde diplomatique*, îlon 2005

8 *El País*, 14 nîsan 2002

9 Li dawîya muzakereyên dûr û dirêj li gel deyndêrên ku ew red kiribû, ev daxistina % 75 a2010ê ji bo % 93 mîqdarên têkildar hat qebûl kirin

10 Li nav 2001 û 2004ê, Buenos Airesê bêhtirî 10 mîlyar dolaran dan wan. Arjantîn hîn deyndara Kluba Parîsê ye ji bo 6.7 mîlyar dolaran (bêyî faîzan); mijdara 2010ê, vê klûbê muzakereyeke nû ya dayîna vî deynî qebûl kir, lê belê, wek hikûmeta arjantînî ji dû salan ve dixwest, bê destêwerdana FDNê

11 *Les Echos*, Parîs, 21 çile 2002

Wergera ji fransî: Simko Destan

## Hejmareke mezin a selefan

**1868: Dewletên Yekbûyî**
Li dawîya şerê navxweyî, Waşîngton deynê Konfederasyonê *"tuneyî"* îlan dike.

**1898: Kuba**
Piştî serkeftina wan li dij Spanyayê, Dewletên Yekbûyî deynên Madrîdê li ser gelê kubayî vala derdixînin.

**1918: Yekîtîya Sovyetan**
Bolşevîk deynê çarî red dikin.

**1998: Rûsya**
Moskva rawestandina betalkirina deynê welatên Kluba Parîsê (1) û bankayên ferdî yên li xwe îlan dike.

**2003: Iraq**
Dewletên Yekbûyî deynê Iraqê "erjeng" dide xuya kirin û ji Almanya, Fransa û Rûsyayê dixwaze ku dev ji deynên xwe berdin.


**2007: Ekwador**
Audîteke nerewatîya beşeke mezin a deynê dewletî îlan dike. Quîto li ser deyndêrên xwe ferz dike ku senedên layiqî 3.2 mîlyar dolaran bi 900 mîlyon dolaran dîsa bistînin.

**2008: Îslanda**
Gelê îslandî li hember dayîna deynekî bi aktîvîteyên bankaya ferdî Landanski ve girêdayî protesto dikin. (2) Di bin metirsîya zextên hikûmetên brîtanî û holandî û veberhêneran de, ajansa Fîtch dîsa roja 17ê sibata 2012ê "nota" welêt ji BB+ bo BBB- bilind dike.

*Ji pêşkêşîya "Efsaneya deynê erjeng" a Claude Quémar (Komîteya Betalkirina Deynê Cîhana Sêyem, CATDM), Liege, 22 û 23 cotmehên 2011ê, û ji pirtûka* AAA. Audit Annulation Autre politique, *Damien Millet û Eric Toussaint, Seuil, Parîs, 2012, hat girtin.*

1 Komeke nefermî ya deyndêrên dewletî. Endamên herdemîn ev in: Almanya, Awustralya, Awusturya, Belçîka, Danîmark, Dewletên Yekbûyî, Fînlanda, Fransa, Holanda, Îrlanda, Îtalya, Japon, Kanada, Keyatîya Yekgirtî, Norweç, Rûsya, Spanya, Federasyona Swedê û Swîsre.

2 Bixwînin, Silla Sigurgeirsdóttir û Robert Wade, "Quand le peuple islandais vote contre les banquiers/Dema ku gelê îslandî deng li dijî bankevanan dide", *Le Monde diplomatique*, gulan 2011



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Keç**, teknîka tevlihev, 49 x 39 cm



ÇIRÎYA PÊŞÎN 1996

### BIRÎNÊN VEKIRÎ YÊN ROJHILATÊ NÊZÎK

# Belengazîya kurdan

KENDAL NEZAN

Gelek sahneyên xwîndar yên serhildanê, artêşa îsraîlî li gel peymanên Osloyê dikeve herêmên otonom, endamên hikûmeta filistînî di bin zexta polîsan de, bi dehan kesên mirî: Ji Întifada û vir de Quds, Xeze û ”Cisjourdanie” tu caran tevlihevîyeke evqas mezin nedîtibû. Ji ber serhişkîya hikûmeta Netanyahû, aştîya hesas ku sê sal berê bi destgirtina Îtzak Rabîn û Yasser Arafat de hatibû îmze kirin û Îsraîl û cîranên wan yên ereb li hev dianî, li ber têkçûnê ye. Ev rewş talûkeyeke gelek mezin li hember pergala ku amerîkîyan piştî Şerê kendavê li dar xistibû, pêk tîne. Li alîyê din artêşa Enqerê li Kurdistana Tirkiyeyê operasyonên bêhempa dikin û krîza nû ya Kurdistana Îraqê, ji Bexdayê re bû rewşeke serkeftî. Bi xêra hevkarîya hikûmeta Seddam û Partîya Demokrat a Kurdistanê, ya birêz Mesûd Barzanî, leşkerên Seddam car din li bakurê Iraqê bi cî bûn. Her wek bedbextewarîya filistînîyan, ya ji bo kurdan berdewam e.

Mudaxeleya 31ê meha tebaxa bihurî, ya artêşa Iraqê li hember Hewlêrê, dibe îşareta balkêş ya têkçûneke xemgîn ya tecrûba otonomîya xweser û rêveberîya kurdan û herweha siyaseta amerîkî li gel kurdên Iraqê. Ev dîmenên ku kezebê dişewitînin, yên şefê kurd **Mesûd Barzanî**, ku gazî hawarê ji qesasê gelê xwe dike, li alîyê din muxalifê wî birêz **Celal Talabanî** bi Îranê re hevkarîyê dike, ev Îrana ku di herêmê de ji bo Washingtonê wek dijmin tê hesab kirin, ev bûyer di demeke wusa de ku alîkarê wezareta derve ya amerîkî, **Robert Pelletreau** li navçeyê ji bo li hevhatinan beşdar bû, vê rewşê du fîyasko bi hev re amade dikir.

Ev bûyer di dema kampanya hilbijartinên amerîkî de pêk hatin, dagîrkirina bakurê Iraqê amerîkî aciz kirin û bi avêtina çil mîsîlan li ser herêmên leşkerî yên başûrê Iraqê bersiv dan, herweha navçeyên qedexe yên ji artêşa hewayî ya **Seddam** re firehtir kirin ji paralela 32yê derxistin paralela 33yê. Li gel van tedbîran jî rewş nehat guhertin. *Partîya Demokrat a Kurdistan*ê (PDK) ku ji Bexdayê alîkarî digirt, di nav hefteyekê de hemû hêzên *Yekîtîya Niştimanî Kurdistan* (YNK) ya birêz **Celal Talabanî** ji meqerên wan yên Hewlêr û Silêmanîyê derxistin û bi vî awayî kontrola hemû "herêmên parastî" girt bin destê xwe. Kongreya Neteweyî ya Iraqê ku ji alîyê Washingtonê ve, li hember Seddam ji tevgerên cuda û sempatîzanên rojava pêk hatibû, hatibû damezirandin, bi carek de bi vê sedemê parçe bû. Di vê gavê de, Pentagonê bi lez û bez 2.500 kesên ku ji bo di warên cuda yên leşkerî û sîvîl de xebitîbûn, bi rêya Tirkîyeyê şandin Amerîkayê.

Di vê rewşa nû ya şanîdana hêzan de, Washington bi taybetmendî îzole ye. Herweha hevalbendên wan yên herêmê, Tirkîye û Erebistana Suûdîyê jî hevkarîyê qebûl nakin û di heman demê de, Fransa û Rûsya faalîyetên Amerîkayê rexne dikin. Hevbendîya ku di şerê Kendavê de, ji bo ku Kuweytê azad bike, belav bûye û bi temamî kişîyaye ser aksa anglo-sakson, ji alîyê din, xwedîyê Bexdayê dide şanî dan ku ew hîn jî li meydanê ye û hinekan xwest wî zû veşêrin, lê ew bi ordîya xwe her dîyar e û wext ji bo wî kar dike.

Ji bo ku du mîlyon kurdên ku ji êrişên Seddam revîyabûn û penaberî sînorên Îran û Tirkîyeyê bibûn, biparêzin, bi pêşengîya Fransa û alîkarîya Amerîka û Ingilîstanê ji alîyê Hevbendîyê ve, di nîsana 1991ê de "herêmên parastî" yên bakûrê Iraqê hatibûn tesbît kirin. Ev herêm, ji alîyê welatên Rojava ve li ser paralela 36ê bi tedbîrên hewayî dihatin parastin û bi xêra van derfetan, kurdên koçber û penaber karibûn vegerin malên xwe.

Lê mixabin ku ev operasyona humanîst, bi projeyên polîtîk nehat domandin, ku fersendên aborî û fînansî bidin penaberên qezezade, da ku bikaribin sîstemeke aborî û xweserî li dar xin û welatê xwe hêdi hêdî ji nû ve ava bikin. Ji ber ku diktatorê Iraqê 4.500 gund û bi qasî bîst bajaran bi temamî ji holê rakiribûn û herweha navçeyên çandinîyê û mêrgên heywanan hatibûn texrîb kirin. Hêzên Hevbend, ji alîkî ve, li ser zextên Tirkîyeyê ku tehamûla wê bi serkeftin û rêxistinîya tu kurdan tuneye, herweha yên dervayî sînorê xwe jî, ji alîyê din ji ber tirsa rexneyên welatên ereb, ku ji parçebûna Iraqê ditirsin, Hêzên Hevbend, çar mîlyon kurd di van "herêmên parastî" de, ku heft caran ji Libnanê mezintir e, bi tenê, terkî qedera xwe kirin.

Kurdên Iraqê, ku ji şerekî sî salî xelas bûne, di vê herêmê de tenê bi serê xwe mane, herêmên ku tu rêya deryayê ku wan bi dinyayê ve girê de tuneye, her çar alîyên wan bi dewletên dijraber ve dorlêgirtî ye, di bin ambargoya navneteweyî ya li hember Iraqê de ku destûra tu ekîpmanên teknîkî û fersendê nade ku projeyên pêşketinê pêk bên. Ev îzolekirin, tenêhîştin, ku di oktobera 1991ê de hatibû pêk anîn, û bi blokeya hundurîn rewş hîn girantir dibe, Bexdayê hemû memûrên xwe ji herêmên kurdan paşde kişandine û benzîn û mazot û hemû berhemên petrolê ji bo vê herêmê qedexe kiriye.

Herweha, dema artêşa Iraqê ji Kurdistanê vekişîya, bi xwe re dîska sîstema - navendî ya telefona bajarê Dihokê bar kir, bir. Ji bo ku bikaribin sîstema telefonê bi cîh bikin, hinek Rêxistinên Dervayî Hikûmetan (OGN) yên fransî bi mehan ji bo vî karî xebitîn û bihayê wê tenê 20 000 frank bû, ji ber ambargoyê ev xebat bi ser nediket. Herweha, berpirsîyarên Neteweyên Yekgirtî jî, nehîştin ku rafînereke biçûk jî li Kurdistanê bê ava kirin, halbûkî gelek bîrên petrolê amade bûn ji bo bên bi kar anin û dê bi hêsanî ihtiyaca enerjîya Kurdistanê bihata temîn kirin, bihayê wê jî ne ji çara yekê ku Neteweyên Yekgirtî dide Iraqê ji bo kirîna petrolê, bi ser de jî bi fiyeta dolarê ve bihayê wê gelek bilindtir dibe. Ji sed dolarên ku Neteweyên Yekgirtî dide Bexdayê, bi tenê çar dolar digihîje herêmên kurdan.

Di van şertan de, bi alîkarîya NGO yên Rojava, kurdan piranîya gundên xwe ji nû ve ava kirin, ji nû ve dest bi xebatên çandî kirin, dibistanên xwe ji nû ve vekirin, herweha sê universîteyan jî dest bi faalîyetên xwe kir. Bi civîna sala1988ê, heşt partîyên polîtîk di Enîyekê de gihaştin hev û li ser şertên hilbijartinê li hev kirin, bi vê babetê hilbijartinên azad di gulana 1992yê de li dar ketin û di dewama wê de Parlamento û Hikûmeta Herêmî hate damezirandin. PDK di hilbijartinê de, ji % 45,2yê dengan girt û ji 100 kursîyan 51 cih (kursî) bi dest xistin. YNKê jî 49 kursî bi dest xistin. PDK ya Barzanî ji kursîyên xwe yek da YNKê, bi vî awayî her du partîyên bingehîn yên welat bi wekhevî kursîyên Parlamentoyê li hev par kirin. Birêz Talabanî, piştî hilbijartinê spasîya gelê kurd dikir "yekîtîya gelê kurd " pîroz dikir, û son dixwar ku careke din tu caran dê kurd şerê birakujîyê nekin. Şeş rêxistinên din yên ku baraja ji % 5 derbas nekirin, nikaribûn nûnerên xwe bişînin meclisê.

Ji ber tirsa zextên welatên cîran, Parlamentoya Kurdan, beyanek da ku: Parlamentoya Kurdistanê tereftara federalîzma di nav sînorên yekîtîya Iraqê de ye. Tê zanîn ku yê nekêfxweş (1), hikûmeta tirk ji bo ku bikaribe "şerê xwe yê qirêjî" ya li hember gerîlayên kurd li ser erda xwe bidomîne, bi eşkere gelek caran sînorên xwe derbas kir û derbasî alîyê din yê Kurdistana Iraqê bû, da ku bikaribe kampên PKKê ji holê rake. Halbûkî hîn ji oktobera 1992yê û vir de, peşmergeyên kurdan ji bo tu sedeman ji mudaxeleya ordîya tirk re nehêlin, gerîlayên PKK ji herêmê derxistibûn.


Li gel hemû xebatên ku ji du salan û vir de hatin meşandin, tu welatên Rojava alîkarîya rêveberîya nû ya kurdan nekir. Tirkîye her qaweta xwe bi kar tîne û li gel 35 000 hezar leşkerên xwe, di 20ê adara 1995ê de, sînor derbas kir û "Herêmên Parastî" vegirt û di nav meh û nîvekê de, kuştin û xerakirina gundan dewam kir.

Ji ber bê îmkanîyan, rêveberîya taze ya kurdan, nikaribû hêzên ewlekarîyê û polîsên otonom bi cîh bînin, herweha nikaribûn maaşên memûrên xwe jî bidin da ku xizmetên herî bingehîn bi cîh bînin. Pêşmergeyên partîyan bi tecrûbeyên dema pêşmergetîyê, derbasî hêzên ewlekarîyê bûn. Li hember zêdebûna sûcên cûre cûre, welatekî ku di bin nîrê xizanîyê de, bêkarîyek ku ji nîvê hêza gel ya aktif zêdetir dide ber xwe, li hember grupên çekdar ên îslamîst ku bi perê Îranê tên xwedî kirin û hewqas jî li hember provokatorên ku ji Bexda û ji welatên cîran derbas dibin, hêzên pêşmergeyên her du partîyan hêzên xwe kirin yek û hêjmarên xwe gelek zêde kirin û bûn "liqên leşkerî" ji bo parlamentoyeke ku tu otorîteyeka wê ya rastîn li ser wan tuneye. Rastî ew e ku ev, hêzên leşkerî bi otorîteya birêz Barzanî û Talabanî ve girêdayî ne

Ev tişt hemû bi hikûmetê ve ne girêdayî ye: "Dewletên cîran û yên Rojava nexwest hikûmeta me nas bikin, bi kurtî xwe îfade dikin, ger fonksîyonên me fermî bûna kesî em qebûl nedikirin û nas nedikirin. Van mantiq û ededên berê wusa dikir ku her partî hemû alîkarîyên ku ji derve dihatin dikişandin ber bi xwe ve.

Bi ser de, Amerîka ku ji gulana 1991ê û vir de, bi dîrektîfeke dizî, lê bi destûra serokkomar biryar dabû ku rejîma Seddam ji dengeyê bixin û destabîlîze bikin, ji bo vê yekê jî amade bûn ku alîkarîya muxalefeta Iraqê û ya kurdan bikin, bi ihtimaleke mezin her du serokên kurdan jî. Ji sed mîlyonên ku ji alî CIAyê ve dabeşi Kongreya Neteweyî ya Iraqê ku baza wê li Londonê ye û herweha "Neteweyên Yekgirtî " ku baza wê jî li Amanê ye, para xwe stendibûn. (2) Ev program, ku %10ê ji angajmana Amerîkayê ye, da ku bikaribe rejîma Seddam aciz bike û ji hêz bixe, bi xwe re hinek nerehetîyên din jî peyda kirin, heta ku Tirkîyeyê dest pê kir, bêyî tu sedeman ji avakirina artêşeke kurdan bitirse.

Di civateke parçebûyî, texrîbkirî û bi ser de ji sî salan û vir de ye, ji bin nîrê diktatorîyekê derdikeve, bê guman ji kultura lihevkirin û hacetên navçînî mahrûm dimîne, ji ber vê yekê jî, mesela hêzên mîlîsan, dikare gelek caran bi hêsanî ber bi şerê hundurî û birakujîyê ve here. Ev rewş, dema ku hukmê birêveberî û îdarî ji îmkanên ku bikaribe pewistîyan temîn bike û çareyekê ji xizanîyê re peyda bike, mahrûm be, hîn hêsantir e, ji ber ku di qata gel de, bawerî tê şikandin û îtîbar namîne. Tê gotin têkçûn bê xwedî ye, sêwî ye, ji ber wê jî; her du partî jî berpirsîyarîya kêmasîyên



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Pasîfîk**, kolaj, 50 x 65 cm



rewşê qebûl nakin û xeletîyan davêjin ser hev û du. Hevdu bi dizîya peran û bi destxistina îmtîyazan sûcdar dikin. Dubendîyên kevin bi halekî nexweşî ji nû ve dest pê dikin.

Di dewama şerê 1994ê de, serokên her du partîyan jî sond xwarin ku bivirên şer veşêrin û xeletîyên ku peyda bibûn, li paş xwe bihêlin û lêborîn xwestin. Meclis cardin ji nû ve civîya, her du serokên dijraber yên her du partîyan ji gel û ji Parlamentoyê lêborîn xwest, ji ber ku nikaribûn şerê birakujîyê bidin sekinandin. Paşîyê delegasyonên her du partîyan jî hatin Parîsê, bi alîkarîya Koşka Elysée, bi nepenî bi qasî hefteyekê li ser pirsgirêk û nakokîyên xwe niqaş kirin û şêwirîn. Lihevkirinên ku hatin îmze kirin dan zanîn ku dê hêzên mîlîs werin belav kirin, di şûna wan de dê hêzên polîs yên otonom di bin otorîteya hikûmetê de bên damezirandin.

Tirkîye, çawa ku ji vê bûyerê agahdar bû, hêç bû û derhal, rasterast tofaneke dîplomatîk û çapemenîyê li hember talûkeya avakirina ***Dewleteke Kurdî*** ya dahatûyê derxist. Ji bo Ankarayê aciz nekin, Amerîka û dewletên Hevbend, ev lihevhatin û peymanên girîng destek nekirin, ev destek dikaribû biba asteng li hember şerên sîvîl û birakujîyê. Di hevdîtineke me de, ku bi Serokkomar François Mitterand re, di 19ê îlona 1994ê de li Qesra Elysée pêkhatibû, Mitterand bi şêweyekî tahlane weha digot: *"Tirk dibêjin ku kurdên Iraqê dixwazin dewleteke ava bikin, Amerîka jî, naxwaze dilê tirkan bişkîne, nîyeta kurdan ji bo min di cîhê xwe de ye û rewa ye, lê belê di vê rewşê de, ne hevalbendên min, ne jî hikûmeta min dê min taqîp nekin. Ew hîn jî tesewir nakin ku rewş dê çawa birize".*

Ev rizîn bû ku di meha 12ê ya 1994ê de şer ji nû ve dest pê kir, YNK ya Talabanî êrişî Hewlêrê ku paytexta hikûmet û Parlamentoya kurdan e, kir û hemû dezgehên ku hatibûn ava kirin li gel Parlamentoyê felc kirin. Di behara 1995ê de, ji ber xerabûna rewşê, wezareta karê derve ya amerîkî berpirsîyarek xwe şand da ku bikaribe di navbeyna her du fraksîyonên kurdan de navçîtîyê bike, wezîfe bi agirbestê di meha tebaxê de li bajarê ***Drogheda*** li Irlandayê qediya. Peymanê da qebûl kirin ku hêzên YNK divê ji Hewlêrê xwe vekişin û komisyoneke otonom bikaribe karên gumrikê yên sînorên Tirkîye û Îranê ku ji alîyê PDK ve dihate kontrol kirin, bimeşîne û "maf û baca gumrikê" bi rê ve bibe. Ji bo ev yek pêk were, pewist bû ku monîtorên ku bihayê wan sê mîlyon doleran derbas nedikir, bihayekî bê qîmet, fîyetê sê fuzeyên Cruis!, bihata dayîn. Li gel wê jî Washingtonê ev alîkarî neda ser milê xwe, ji ber vê yekê jî serokên kurdan bi vê navbendîyê bawer nedikirin û cidî nedigirtin. Di heman wextê de, Îran jî ku di vê herêma stratejîk de, bi Amerîkayê re qayîşê dikişîne, bi eşkere da dîyar kirin ku ew jî amade ye ku navbendîyê bike û bi vî awayî li gel Sûrîyê bikaribe "aştîya ku Amerîka" li dar xistibû, têk bibe.

## "Barzanîland" li hember "Talabanîland"

Ji ber şerê çekdarî û taybetmendîyên herêmî, Kurdistana Iraqê bû du beş, li alîyekî bakurê Kurdistanê, ku ji başûrê Hewlêrê dest pê dike û seranser ber bi sînorên Tirkîyê ve dikişe. Li alîyê din "Talabanîland" ji Hewlêrê dest pê dike û li sînorê Îranê diqede. Di vir de coxrafyayê roleke mezin lîst û hevalbendî li gor wê şekil girtin. Vê rewşa nexweş wisa dikir ku serokên kurdan bêtir xwe wek şefên fraksîyonên xwe didîtin û derdên wan bi tenê dor û dera wan bû.

Mesûd Barzanî demekê xwest ku bi Tirkîyê re hevkarîyê çêke, derdê mezin wê demê ew bû ku bikaribe enerjîya bajaran garantî bike, lê ji ber bilindkirina bihayên bê sînor ev hevkarî hat birîn, lê Tirkîyeyê vê carê ji wan xwest ku li hember enerjîyê şerê PKK bikin. Di vê gavê de, bi Bexdayê re jî têkilîyên "bazirganî"yê dest pê kirin, ji bo elektrîk û gaza ku ji Bexdayê bihata, divê hesab bi doleran bihata dayîn. Kurdan êdî bawerîya xwe bi sozên amerîkîyan nedianîn, li gel dijminatîya wan li hember Seddam, dîsa jî bawer dikirin ku dê Seddam li ser hikum bihêlin û ji bo berjewendîyên xwe wek sala 1975ê (3) dikarin wan dîsa bikin qurban. Birêz Barzanî, bi Bexdayê re dest bi "dîyalogên siyasî" kiribû û di paşîya meha tebaxê de ji bo vê "dîyalogê" dê weha bigota: " Ev dîyalog", "jesteke bêhêvîtîyê bû", "banga hawarekê bû li hember êrişên hêzên YNKê di bin desteka Iranê de."

Ger gotin were ser birêz Talabanî, ew jî tam di destpêka koçberîya ji reva mirinê de, di sala 1991ê de, li hember kamerayên televîzyonan bi ramîsanên xwe ev dîyalog ji berê ve pêkanî bû. Wî jî digot: "ev dîyalog ji bêçareyî bû, divê gel nan û xwarin bi dest xista û derîyek ji dinya derva re vebûya". Bê gûman ev derîyê dinya derve, derîyê Îranê bû û bi şert û şirûtên Tehranê bûn. Bi vî awayî ji dervayî pesndayîna bilind ya Ayetullah Xumeynî û komara îslamîst, herweha navçeyên xwe jî, ji hêzên leşkerî yên ordîya El Bedr (muxalefeta şiî ya iraqî) û pasdarên şoreşa Îranê re vekir. Vê yekê ji têr nekir: Di dawîya meha tîrmehê de, hêzeke ji 3 000 pasdaran pêkhatî û di bin qumandarîya **Sahrarûdî** de ketin Kurdistana Iraqê, ev şexs yek ji qesasên serokê gelê kurd yê Iranê Ebdurehman Qasimlo bû. (4)

Piştî ku li Silêmanîyê bi cîh bûn, pasdar di cîhê xwe de nesekinîn, çûn sed kilometre wirdetir li Koy-Sancakê li ser axa di bin kontrola birêz Talabanî de, kampên kurdên Îranê bombe kirin. Birêz Barzanî, meşa wan li ser axa xwe qedexe kir, Sahrarûdî ew tehdît kir û soza "cezayekî nimûneyî" ji bo wî da.

Du hefte bi şûn ve, di 17 tebexa 96ê de, artêşa Îranê ji dûr ve bi topan agir reşand ser navçeyên Çoman û Hacî Umranê, li ser rêya stratejîk Hamilton, li alîyê din, YNK ji çend cepheyan ve êrişên xwe didomandin. Li gel şaşmayîna Amerîkayê agirbest şikestibû, li gel ku alîkarê wezareta karên dervê Robert Pelletreau, ev agirbest bi cîh anîbû, ji bo ku her du serokên kurd rêya maqûlîyê bigrin. Birêz Barzanî digot ku ew ji alîyê hêzên YNKê û pasdarên Îranê ve dorgirtî ye û ji ber vê jî berê ji amerîkîyan alîkarî xwest, li gel bersîva neyînî di 22 meha tebaxê de, li hember dagîrkirina Îranê û hevkara wê YNKê, ji Seddam Husên alîkarî xwest.

Şerê birakujîyê ku li Kurdistana Iraqê, ji gulana 94ê vir de dem dem berdewam bû, ji du hezaran zêdetir kes hatibûn kuştin, vê carê li ser olçekek hîn mezintir û xedartir dê bidomîya, vî şerî di demeke muwaqet de bi serkeftina PDKê domand, bi xêra hevkarîya bi Bexdyê re, di demeke nêz de her sê navçeyên Kurdistana otonom ketin bin destên KDPê. Îran nehat hawara birêz Talabanî, bi fikra ku hêvî dikir bi temamî bişkê da ku hemû şertên xwe pê bide qebûl kirin.

Ji ber hêza xwe ku ji serkeftinê bi dest xistibû, birêz Barzanî hewl da ku xeletîyan û texrîbatan tamîr bike; ji bo vê jî soz da ku ber bi dawîya 96ê hilbijartinên parlamentoyê li dar xe, di vê gavê de, efûya tevayî ji bo hemû kesên ku beşdarî şerê birakujîyê bibûn beyan kir. Herweha ji bo birêz Celal Talabanî jî, hemû partîyên ku çekên xwe danîyana, azad bûn ku beşdarî hilbijartina bibana û li hember Bexdayê serxwebûna xwe jî dîyar kir. Li gel hevkarîyek demek kurt û ji bo operasyonek taybetî, li gel Bexdayê, Barzanî da xuya kirin helwêst ew e ku di nav Iraqê de, hevkarîyeke federal pêk bê. Bi vê sedemê jî, ji serokkomarê Amerîkayê Clinton re nameyek nivisand û xwest ku hêzên amerîkî û yên hevbendîyê, wan li hember êrişên Bexdayê biparêzin. Ji bo vê jî garantîyên nivîskî dixwest û herweha ji bo ku bikaribin otonomîya xwe li hember Bexdayê biparêzin, çekên giran hêvî dikirin. Vê carê Washingtonê bersiv da û birêz Robert Pelletreau derhal şand herêmê da ku bikaribe 18ê meha îlona 96ê, li Tirkîyê wî qebûl bike.



MUZAFFER ORUÇOĞLU: **Perspektîf**, teknîka tevlihev, 117 x 58 cm

Wekî din li Enqereyê, birêz Barzanî da xuya kirin ku, dê ewlekarîya rêya petrolê (oléoduc) garantî bike û li gel wî hemû bazar û bazirganîya ku ji sînorên wî derbas dibin, biparêze û wekî din jî parastineke mezin ji hindikayîya tirkmen re garantî bike. Li hember vê jî "ez ji Amerîka, dewletên hevbendîyê û ji Tirkîyê dixwazim ku dewleta me ya federal binasin".

Di vê gavê de, ji bo şanî bidin ku pêvajo bi halekî normal dimeşe, Parlamento li Hewlêrê civîya, di civînê de şêst û neh mebûs amade bûn, destûr dan birêz Roj Nûrî Şaweys (PDK) ku bêrê cîgirê serokwezîr bû, da ku kabîneya nûh ava bike ku heta nuha ji alîyê endamekî YNKê ve dihate meşandin. Delegasyonek jî çû Îranê da ku li gel birêz Talabanî biaxifin ku ji nû ve şerê çekdarî nedomîne û vegere Kurdistanê. Lê wisa dîyar e ku ev înîsîyatîf dê bi dijwarî bikaribin kurdên Iraqê iqna bikin, bawerî û hêvîyan ji bo rojên dehatû bidin wan.

Di nav sîh salên şer de, pênc salên nedîyar de, gelê kurd wisa dîyar e hemû hêvî û bawerîyên xwe li hember serokên kurdan winda kirine û herweha li hember Dewletên Rojava jî. Ev gel li hêvîya hêzekê ye ku bikaribe ji wan re xwarin û aşîtîyê bîne, di hêvîya xewneke ji bo azadîyê ku bidestxistina wê gelek dijwar e. Bedbextîya, xemgînîya kurdan, welê dîyar e dê hê berdewam be.

1 Kendal Nezan, "Dernier quart d'heure pour l'armée turque" (*Çaryeka dawîn ji bo artêşa tirkan*) , et Jean-François Perouse, "Terre brûlée au Kurdistan" (*Axa şewitandî li Kurdistanê*), di nav "Conflits fin de siècle" (*Konflîktên dawîya sedsalê*), *Manière de voir* , no 29, Sibat 1996

2 *Cf. The Washington Post* , 16-09-1996

3 Di 6ê Gulana 1975ê de, di navbeyna Iraq û Îranê de, li Cezayîrê hate îmze kirin, ji alîyê DYA ve dihat destek kirin, bi lihevhatinê pirsgirêka hidûdên di navbeyna her du welatan de çareser dibû û hemû şêwe alîkarîya Iranê ji serhildana kurdan re dihate sekinandin, bi vê bûyerê serhildana kurdên Iraqê di nav çend hefteyan de têk çû

4 Sektreterê giştî yê Partîya Demokrat a Kurdistanê li Îranê, Dr. Ebdurehman Qasimlo, di 13ê tebaxa 1989ê de li Vîyanayê (Awistirya) ji alîyê ajanên rejîma Îranê ve hate kuştin

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin

Darbeya leşkerî ku 22yê adarê li Malîyê rêjîma "nimûneyî" ya serokkomar Amadou Toumani Touré hilweşand, li tevliheviya herêmê zêde bû. Li Mexreba îslamî koma saharo-sahelî, ku bi serhildanên nû yên tevgera tûareg re rûbirû ye, serê xwe bi komên xwedî çek re dieşîne; yên ku xwe girêdayî El-Qaîdeyê îlan dikin.

## ENCAMEKE ŞERÊ LI LÎBYAYÊ

# Çawa Sahel veguherî bombeyeke li ber teqînê

PHILIPPE LEYMARIE *

Bêkêrbûn…jênehatîbûna têkoşîna li dijî serhildan û komên terorîst yên li Bakur … ": Leşkerên ciwan ên bi cilên kamûflajê yên ku di 22yê adarê de li ***Bamako*** desthilatdarî bi dest xist, nikarîbûn gotinên hişktir li dijî şefê xwe yê kevin bi kar bînin, serokomar û kevne-general **Amadou Toumani Touré** ku demeke dirêj weke "leşkerê demokrasîyê" dihat nas kirin. Di adara 1991ê de, wî di darbeya li dijî general **Musa Traoré** de cîh girtibû û xwe kir serokê Komîteya Muweqet ji bo rizgarkirina gel. Di encama konferanseke neteweyî de li pey hilbijartinan wî desthilatdarî dabû destê sîvîlan. Ew di sala 2002yê de ketibû nav polîtîkayê û bûbû serokkomar û diviyabû di 20ê nîsana bê de piştî hilbijartina xelefê xwe, wezîfeya xwe bi dawî bîne.

Tevî ku îdia dikir ku "nedixwest dest bavêje demokrasîyê, lê bi tenê dixwest yekitîya neteweyî û yekparebûna erdî pêk bîne", Komîteya Neteweyî ji bo Piştrastkirina Demokrasîyê û Xurtkirina Dewletê (KNPDXD) [erkên] sazî[yan] betal kirin û dawî li pêvajoya hilbijartinan anî. Tu tişt vê bawerîyê piştrast nake ku ev rejîma leşkerî ku herkes wê mehkûm dike, wê bikaribe rewşa Bakurê bêxwedî, ku sînorê wê bi Cezayîr û Nîjerê re heye li gor berjewendîyên xwe biguherîne.

Tûrîzma ku yekane çalakîya aborî ya warên Sahelê yên kêm mirov lê dimînin e, li ber nemanê ye. Tu turîst nayên serdana herêma cezayîrî-malîyî bi navê ***Taûdenî***, nayên ***Aîr***ê li Nijerê û nayên ***Adrar***ê li Morîtanyayê (*li nexşeyê binêrin*). Bi ser de jî, van mehên dawîyê, vegera bi hezaran leşkeran -bi piranî tûareg in- ketina pêşbazîya çekdarbûnê û zêdebûna bazirganîya kokaînê, yan jî cixareyan, belavbûna şerekî pêk anîn ku li başûrê Cezayîrê, li bakurê Malî û Nijerê û li beşeke Morîtanyayê li hevîya teqînê bû. **Maurice Freund** ku acîz e "*bi dîtina zarokên 15 salî yên xwedî kalaşnîkov ku bûne fermandarên Gaoyê*" wisa nerazîbûna xwe nîşan dide: *"Min tu caran bîr nebir ku rojekê çend qeşmerên dîn ên di bin tesîra tevliheviyên salên 1990ê de li Cezayîr qewimî, wê bikaribin warê Saharo-sahelî veguherînin Far West* [navê li Ewropayê li Wild West –Rojavayê Kovî– a amerîkî tê kirin; nota wergêr], *ku wê bikaribin gelê heremê bitirsînin û serî li wan bitewînin"*. Organîzatorê tûrên tûrîstîk yê Point-Afrique ku wî bi xwe sala 1996ê ava kiribû, piştî rehîngirtina tûrîstên fransî di sala 2007ê de li Morîtanyayê û piştî rehîngirtina karkerên Areva li Bakurê Nîjerê di sala 2010ê de, neçar ma ji herêmê derkeve.

Serhildana "mirovên şîn" di 17ê çileyê 2012ê de bi êrişekê bi ser bajarê Menaka li Bakurê Malîyê dest pê kir, di pey re jî bi hefteyan çalakîyên serkeftî li dijî garnîzonên arteşa malîyî pêk hatin, yek ji wan standina baregeha leşkerî ya Tessalit di 11ê adarê de bû. Wisa tê bawer kirin ku Tevgera Neteweyî ji bo Azadîya Azawadê (TNAA) ku 2011ê de saz bû, xwedî bi hezaran şoreşger e ku çarsed ji wan kevne-eskerên bereya pêş ên serokê Lîbyayê Muemmer Qedafî ne. Ev tevger ji sala 2012ê û vir ve bi hevkarîya tevgera ***Ensar Dîn*** têdikoşe û girêdayîyê El-Qaîdeya Mexreba Islamî (AQMI) ye ku îdîa dike îro piranîya Bakur-rojhilatê Malîyê kontrol dike.

TNAAyê ku serhildanê tûaregan yên salên 1963, 1990 û 2006ê bi bîr tîne, doza serxwebûna sê herêmên bakur dike, ***Tombûktû***, ***Gao*** û ***Kîdal,*** yanî ji 800 000 km2 bêhtir û % 65ê erdên welatê Malîyê (carek û nîv ji erdê Franseyê mezintir e) pêk tîne, lê belê bi tenê yek ji dehê nufûsa welêt a ku li gor texmînan biqasî çardeh mîlyon e, lê dimînin û ew jî li ser sêzdeh "xelekan" (komên civakan/ şaredarîyan) belavbûyî ne. (1)

Serokê mekteba siyasî ya TNAAyê ***Mahmoud Ag Aghaly*** binê vê yekê xêz dike: *"Hê di sala 1957ê de tûaregan ji fransîyan re gotibû* [mêtingeran] *ku wan nedixwest erdê wan bibe perçeyek ji Komara Malîyê. Û ji sîh salan û vir ve bi hikûmetê re tê axaftin û peyman tên mohr kirin, lê tu feydeya wan nîne". (2)* Li gor yên ku serxwebûnê dixwazin, hikûmetê Bakurê Malîyê tenê hiştiye. Serokkomar bixwe ev yek qebûl dikir: "[Li wir] *rê, navendên tenduristîyê, dibistan, bîr û avahîyên bingehîn ji bo jîyana rojane nînin. Rastî ev e ku tu tişt lê nîne. Ciwanekî ku lê dijî tu şansê wî yê zewicîn, an jî biserkeftinê tuneye, bi tenê heke erebeyekê bidize û tev li qeçaxçîyan bibin, dikarin bi ser kevin* (3)... "

### Cezayîr: Hem sedem hem jî derman

Hikumeta ***Malîyê*** hezar leşker şandin ***Gaoyê, Kîdalê*** û ***Menaka*** ku pêncsed ji wan mîlîsên ***tûareg*** û erebên tev li wan bûyî ne. Lê motîvasyona wan pir kêm e –di nav efserên payebilind de jî hejmara yên ku ji eskerîyê direvin pir bilind e– û piştî rêzek biserketinên serhildêran êdî carinan teçhîzata wan kêm e û têrê nake. Di dema aşitîyê de jî tu caran ji arteşa **Bamako** nehat ku tevahîya neh sed kîlometroyên sînorê xwe bi ***Morîtanya***yê re, an jî hezar û dused kîlometroyên sînorê xwe yê bi Cezayîrê re kontrol bike.

Tevî ku îhtîmal hebû ku vî şerê nû zirar bida dawîya dewra serokkomarîya wî û têsîreke xirab li hilbijartinên serokkomarîyê yên 20ê nîsanê bike jî, **Touré** hîn weke fîlosofan xeber dida: *"Ev pêncî sal in ku pirsgirêka bakur heye. Mezinên me pê eleqedar dibûn, em pê eleqedar in û yên piştî me wê pê eleqedar bibin. Ev pirsgirêk wê di rojekê de xilas nebe*". (4) Li gor wî sedema nemumkinîyeta kontrolkirina herêma saharo-sahelî ew e ku sînorên welatan ne xema serhildêr, mîlîtan, bazirgan û bazirganên narkotîkê ne, ew vê herêmê ku mezinahîya wê weke ewropayê ye ji serîyekî heta serîyê din derbas dikin.

Komîteya Fermandarîya Giştî ya Artêşê ya li ser kar e (KFGAK) ku di sala 2010ê de li ***Tamanrasset***ê hat saz kirin, ji hevkarî nekirina şênîyên Saharayê aciz e. **Morîtanya** ku têkîlîyên pir xurt bi berpirsîyarên perwedeya ***Fermandarîya Operasîyonên Taybet*** (FOT) re danîne û "hertiştî bi ewlekarîyê dixwaze; Malî pêşketineke demdirêj dixwaze, ku bi tenê ev dikare sedemên tevlîbûna di nav tevgerên tuareg de an di nav *katiba*'yan (komen şoreşgerî) yên AQMIyê ji holê rake.


Ji bo **Barnako**, Cezayîr hem sedem, hem jî dermanê pirsgirêkên ewlekarîyê ye ku elaqedarî terorîzmê ne. Koka ***Koma Selefî ji bo Waaz û Têkoşînê*** (KSWT), ku di sala 2007ê de navê xwe kir ***AQMI*** bi rastî jî ***Komên Îslamîst ên Xwedî Çek*** (KÎXÇ) yên cezayîrî ne û bi tenê îstîxbarat û hêzên ewlekarîyê yên vî welatî dikarin ji heqê wan derkevin. Li alîyekî din, tê bawer kirin ku bi 6 mîlyar euroyên budceya xwe ya bergirîyê (sîh caran ji budceya bergirîya Malîyê zêdetir e), wê paytext Cezayîr bikaribe qanûnên xwe li ser Saharayê ferz bike. Li gor serokkomar Touré herî bakurê Malîyê, ku li gor texmînan rêhîngirên AQMIyê xwe spartinê û lê veşartine, di rastîyê de parçeyekî welatê Cezayîrê ye: *"Li gor min Gao,Tessalit û Kîdal wilayetên dawî yên welate we ne. Dîroka welatê we girêdayîyê vê herêmê ye"*. (5)

### Rîska belavbûnê

Tevî ku şewata li Bakurê Malîyê tevahîya herêmê tehdît dike jî, meyla tevlihevkirina terorîzmê bi sucdarî û bi daxwaza gihandina hev a gelekî parçebûyî ancax têgihîştina bûyeran zehmetir bike. (6) Bi ser de jî ji holê rakirina albay **Qedafî** ku xwe weke qralê Saharayê, an Sahelê (7) didît, destûr da ku yek ji rikeberên AQMIyê kêm bibe û stoka wê ya sîlehan zêdetir bibe.

Li gorserokkomarê Nîjerê **Mahamadu Isufu**, serhildana tûareg *"yek ji encamên krîza Lîbyayê ye"*. (8) Herçî TNAA ku wisa xuya ye ji Ensar Dînê veqetiyaye, ji xwe re qedexe kiriye ku bi AQMIyê re têkoşîneke hevpar bimeşîne: Kiryarên AQMIyê erdê welatê me qirêj dikin û eger bidomin jî sucê desthilatdarîya **Bamako** ye. Tişta em ji civaka navneteweyî re dibêjin ev e: "*Serbixwebûnê bidin û wê li Malîyê dawî li AQMIyê bê"*. (9)

Li Fransayê ku bavê sîyasî yê adetî yê vê jêrherêmê ye, ev arguman guhdarên xwe dibîne. AQMI ji ber heman sedemên ku berîya du salan li dar bûn, ji Fransayê aciz e:




Çavkanî: «Géopolitique du Sahara (Jeopolîtîkayê Saharayê)», Hérodote, hejmar 142, La Découverte, 2011; Armelle Choplin û Olivier Pliez (Birêveber), «Sahara et Sahel, territoires pluriels (Sahara û Sahel, erdên pirreng)», Mappemonde, hejmar 103, 2011; Atlas de l'Afrique, Les Editions du Jaguar, 2009 ; www.reliefweb.int ; Buroya Neteweyên Yekbûyî ji bo Kordînasyona Karûbarên Mirovî, www.unocha.org, 2012; Algeria-Watch, 2012.

Dagîrkirina leşkerî li Afganistanê, dîplomasîya hevalbenda Îsraîlê, qedexekirina sergirtina temamî li qadên gelemperîyê welêt, destdanîna ser uranyûma Nîjerê, êrişên komando ji bo serbestkirina rehînan li Nîjer û li Malîyê…

Li Bamakoyê, peşnîyarên ku wezîrê karên derve yê fransî Alain Juppé kiribûn qet baş nehatibûn nirxandin – hevdîtinên bi hemû alîyan re, TNAA jî di nav de; bicîhanîna şertên peymanên kevin; hewldana pêkanîna pêşketineke li bakûrê welêt -ev peşnîyar ji alîyê welatekî hatibû kirin ku bûbû sedema teqîna tevlihevîya li Lîbyayê, û niha piştgirîya welatê hêremê dike da ku ew "*baştir xwe bi rêk xin*". Îhtîmaleke mezin e ku ji alîyê Fransayê ve bilêz şermezarkirina rêjîma leşkerî ku 22ê adarê xwe bi cîh kir, û cemidandina hevkarîya navbera herdû welatan de, dîsa nayên fêm kirin.

### DYA nayê xwestin

Herçî Dewletên Yekbûyî yên Amerîka ye ku Saharayê weke bereyeke "şerê li dijî terorîzmê" dibîne, bi hêzên xwe yên taybet û "guhên wan yên mezin [îstîxbarat; nota wergêr]" mudaxale dikin. Ew dixwazin şefên AQMIyê ji holê rakin, lê rastî astenga Cezayîrê li ber wan danî tên, Cezayîrê firîna balafirên bê pîlot yên ***Central Intelligence Agency*** (CIA), yan jî yên ***Us Airforceê*** qedexe kir. Herwiha astengeke din ku Dewletên Yekbûyî rastî wê tê nebawerî ye, ya ku piranîya welatên nêzî Saharayê hîs dikin. Tirsa wan ew e ku zêde xuyakirina rengê amerîkî li herêmê, çawa ku li Afganîstanê qewimî, wê agir gur bike.

Herêm veguherî bombeyeke li ber teqînê. Ji bo herkesî rîska belavbûna tevlihevîyê heye ku li Sahelê diqewime, yanî tehlûkeya balkanbûna Sahelê heye. Wisa tê fikirîn ku bi sedan endamên tarîqeta **Boko Haram** xwe spartine Nîjerê û Çadê (nîvîsa li ser vê mijarê bixwînin). Îhtîmala ku mîlîsên îslamîst *şebab*, yên ku li Somalîyê li dijî arteşên Kenya û Etîyopyayê têdikoşin ber bi Sahelê ve biherikin. Li Darfourê ***Tevgera ji bo Edalet û Wekhevîyê*** ya **Gibril Ibrahim** meyldar e ku ji nû ve çekan bi kar bîne. Li Bakurê Afrîkaya Navîn general **Baba Ladde** ku ***Bereya Gel ji bo Peşketinê*** bi rê ve dibe, îdia dike ku wê serokkomarê Çadê **Idris Déby Itno** ji text bixe û ji bo hevkarîyê bang li tûaregan, li AQMIyê û li sahrawîyên Bereya Polisario, hwd., dike.

Di heman demê de, Cezayîr, Nîjer Morîtanya û Burkîna Faso derîyên xwe li dused hezar penaberên malîyî vekirin ku ji şerên li Bakurê welat diqewimin, direvîyan. Lê belê, li gor Bernameya Zad û Qût a Cîhanê, di rewşa hêyî a hişkesalî, xela û birçîbûnê de pêdivîyia lezgîn a pênc heta heft milyon şênîyên Sahelê bi alîkarîyeke di cîh de heye.

*Rojnamevan

1 Robin Edward Poulton, "Vers la réintégration des Touaregs au Mali (Ber bi ji nû ve întegrebûna tûaregan li Malîyê", *Le Monde diplomatique*, çirîya paşîn 1996

2 *Jeune Afrique*, Parîs, 21ê sibata 2012ê

3 *ElWatan*, paytext Cezayîr, 4ê nîsana 2009ê

4 "Le débat africain (nîqaşa afrîkî)", Radio France Internationale, 26ê sibata 2012

5 *ElWatan, li jor navê vê jêderê dibihure*

6 *Li ber bigre*, Antonin Tisseron, di "Géopolitique du Sahara (jeopolîtîka Saharayê)", *Hérodote*, hejmar 142, Parîs, trîmestra sêyem 2011

7 Di 1998ê de Qedafî ji xwe re Yekîtîyeke Dewletên Sahel-saharî li hev anîbû (CEN-SAD) weke Yekîtîya Afrîkîyeke duyem

8 *Le Monde*, 15ê sibata 2012

9 *Jeune Afrique, li jor navê vê jêderê dibihure*

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

# Boko Haram, terîqeta piçûk a ku mezin dibe

JEAN-CHRISTOPHE SERVANT *

Nîjerya ku ji ber çeliqîna xwe ya civakî û çandî pir caran weke "democrazy" (demokrasîya hêçbûyî) jî tê bi nav kirin, cinawirek jî di nav xwe de afirand: **Boko Haram**. Di destpêkê de, berî dozdeh salan, ew tevgereke olî (dînî) ya muxalif bû û hewl dida valahîya ku ji ber xemsarîya partîyên pêşverû derdiket holê, dagire. Lê belê bijîjkên frankeştaynî yên hikûmetê ev terîqet raguherand çerxeke jeopolîtîk û prensîpa bingehîn a rêzeke êrişên-tolhildanê yên mezin û herwiha kujer.

Bi rastî jî, navgînên siyasî –ji ***Partîya Demokratîk a Gel*** a li ser desthilatê bigirin heta bigihîje muxalefeta bakur, ***Partîya Hemû Gelên Nîjerîyayê*** (*All Nigeria Peoples Party, ANPP*)– û derdorên eskerî-ewlekarî yên ku şewirmendîya serok **Goodluck Jonathan** dikin, hemûyan piştgirî da tundûtûjkirina vê terîqeta li bakur-rojhilatê welêt ku di destpêka salên 2000ê de peyda bû. ***Cemaet-ul Ehl-ul Sunna lî Da'awetî lil Cîhad*** (Cemaeta Sunnîyan ji bo Banga Cîhadê) a ku bi awayekî hovane hate perçiqandin, ji niha û şûn de êdî bi du herfan tê nasîn: **BH** ango ***Boko Haram*** –"book-pirtûk" bi ingilîzîya xwecihî û "haram-qedexe" bi erebî. Di navbera tîrmeha 2009 û despêka sibata 2011ê de, wê berpirsiyarîya sed û şêşt û çar êrişan, êrişên xwekujîyê, înfaz û rêbirînên heta navenda paytexta federal, Abujayê jî dirêj bûn, girt ser xwe; neh sed û sî û pênc kes hatin kuştin û piranîya kuştîyan ji derdorên îslamî bûn.

Navûdengê ***Boko Haram*** helbet bala *katibas* (mîlîtanên) El-Qaîde yên li Maxriba îslamî (AQMI) û ya *shebab* (şervanên îslamî) yên Somalîyê jî dikişîne. Şaşûmetelmayî, çapemenîya navneteweyî carna ji xwe dipirse, (2), ka gewrecivaka nîjeryayî ya sed û şêst milyon şênî gelo nekeve ser rêya parçebûneke navbera Bakurê misilman û Başûrê xiristîyan. Helbet tiştekî wisa tê wateya jibîrkirina realîteya şikestina esasî ya vî welatê ku lê ji sedî 60ê şênîyan, rojê bi hindiktirîn du dolaran dijîn, ango xizanîya di asta perîşanîyê de li welêt pirsgirêka esasî ye. Dozdeh dewletên ku kemera bakur a federasyonê pêk tînin –li sînorên Nîjer, Çad û Kamerûnê– dewletên herî hindik pêşketî yên welêt in. Neyeksanîya bi Başûr re jî hê kûrtir bûye, bi taybetî ji dema ku sivîlek, ango generalê berê **Olusegun Obasanjo**, piştî pênc salên dîktatorîya general **Sanî Abaşa**, cardin di 1999ê de bû serok.

### Ustaz Muhemed Yûsif

Li Dewleta Borno ku lê *yusifîyên* Boko Haram –ji navê şefê wê yê rûhanî yê mirî, Ustaz Muhammad Yusif tê– dest bi xwînrijandinê kirin, çarsêyê civakê li bin sînorê xizanîyê dijîn. Ev rêjeya herî bilind e li welêt. Tenê ji sedî 2yê zarokên li bin panzdeh mehî li himberî şewban tên aşî kirin. Rêjeya perwerdê jî dîsa pir qels e: Ji sedî 83yê ciwanan ummî ne; ji sedî 48,5ê zarokên di temenê dibistanê de perwerdê nabînin. Û ji sedî 34,8ê misilmanên di navbera 4 û 16 salî de ti caran piyê wan bi dibistanê neketiye –neçûne kursa Qûranê jî : *"Ewçend hêman dibin sedem ku civak bi taybetî nikaribe xwe ji bin pêlên neyînî, ku yek ji wan jî şidet e, rizgar bike."* (3)

Muhemed Yusif di despêka salên 2000ê de hêdî hêdî navûdeng dide. Ew hingê 30 salî ye û li dewleta ku lê jidayîkbûye ***Yob***ê, ku cîrana ***Borno***yê ye, li gundekî waazan dide. Ew dikare ji nav bi dehan hezar waizên gerok, parêzvanên kevneşopîyeke "derwêşîya çîlekêş", -ku xwedî helwesteke biryardar in û li bazarên bajarên mezin xîtabî gel dikin- xwe bide xuya kirin. Ew dibe dijberî mirîdên misilmanekî din ê nîjerîyayî, **Abubakir Gumî,** ku di 1992ê de mir, û îdeologê tevgera ***hembelî*** ya nû ya ***Yan Îzala*** bû. (4) Evê ha êdî têra xwe milahîm bûbû, bi taybetî piştî venûkirina şerîetê ku ji sala 2000ê ve li nav dewletên Bakur dest pê kir –ev herwiha yek ji daxwazên wî yên bingehîn bû. Wî qebûl kiribû ku bikeve nav komîsyonên fermî li van herêman ji bo bicihanîna qanûna îslamî wezîfedarkirî. Lê belê venûkirina şerîetê wê ji olê (dîn) bêhtir di siyasetê de bibûya sedemê pêkenok û nerazîbûnên civakê. Bi rastî jî, derdorên siyasî-eskerî yên bakur wê di nav kulma xwe ya hesînî de li gel deshilata navendî, weke amûrekî zextê bi kar tînin. *Zekat* (5)– yek ji pênc şertên îslamê– jî nehat bi cih anîn.

Yusif, ku li zanîngeha Medîneya Erebistana Siûdîyê perwerdeya teolojîyê xwend, bêhtir ketiye bin tesîra waazên nexweşbîn ên waizê misirî **Şukrî Mustafa**, ku pala xwe didin dercivakîbûn û derwelatîbûnê û li dijî rayedarên Abujayê rexneyên giran tîne ziman. Ji bo wî, bicihanîna bi hişkî ya qanûna îslamî tê wateya xwe gihandina edaleta bi livûtevgerên Pêxember re lihevhatî. Ew wekî din li dijî perwerdeyeke gelemperî a *"di bin têsîra rojavayîbûnê de ji rê derketî"* ye, li dijî tevlîbûna hilbijartinan e û dijberîya markayên navdar ên pîşesazîya çandûqût a nîjerîyayî jî dike ji paketên ***Maggi*** heta bi paketên şîr ên ***Dairy Milk***. Ev dijberîya wî ya li himberî "nûjenî"yê li gel vê yekê jî wê nebe asteng ji bo ku kujerên ***Boko Haram*** motorsîkletan bi kar bînin, dema diçin kuştina mirîdên **Îzala**, yê ku bi sempatîya xwe ya ji bo selefîstan û herwiha ji bo hin sofîyên terîqetên ***Tidjaniyya*** û ***Qadirîyan*** tê nas kirin.

### Mizgeft û dibistan

Bakurê Nîjeryayê berê jî di destpêka salên 1980yê de rastî pêlên şidetê yên ji ber pevçûnên navbera mezhebên misilman ên "dij-rojavayî" hatibû. Tevgera ***Maitatsîne***, ku bixwevekirina saetan jî qedexe dikir, bi wî awayî kolanên ***Maidugurî*** û yên ***Kadûna***yê dagîr kiribûn. Zexta hovane ya eskerî ya mirîdên wê yên li nêzî bazara ***Kano*** kozik vedabûn –gewrebajarê li Bakur– di sibata sala 2012ê de bûbû sedemê mirina zêdetirî sê hezar kesan.

Di payîza sala 2003yê de, "*bajarê ruhanî*" yê Yûsuf, ê li ***Kannamma***ya di nav ***Yobe***ya kûr de, rastî êrişa hêzên polîs ên dewletê hat. Gelek mirîd hatin kuştin. 22yê kanûna sala 2003yê, ***Boko Haram*** li dijî hêzên ewlekarîyê êrişên xwe yên pêşî dide dest pê kirin, dû re vedikişe ***Maîdugurî,*** paytexa dewleta ***Borno*** ku li wir tevgerê di nîsana 2003yê de bi dizî piştgirîya ji bo hilbijartina walîyê nû, **Alî Moddu Şerîf** kiribû. **Moddu Şerif** bi rastî jî soza pêkanîneke hişktir a şerîetê dabû. Çawa ew tê hilbijartin, endamekî dîrokî yê ***Boko Haram*** tîne ser wezareta nû ya karûbarên olî: **Buju Foi**. Terîqet li ***Maîduguri***yê mizgefteke û dibistanekê çêdike. Ev dezgeh pir bi lez bala ciwanên serserî û perîşan ên taxên xizan, herwiha ya xwendekarên neserketî û tenêhiştî yên kampusan û karmendên halnexweş dikîşînin. Li pişt perdeya olê, kîneke kûr jî bi van derûdorên civakê re mezin dibe, ji ber ku ew di wê bawerîyê de ne, ku bijarteyên Bakur, deshilata navendî, polîsên federal ên qebe û sextekar ew bi tenê hiştine.

Di cotmeha sala 2004ê de, endamên ***Boko Haram*** li nêzî sînorê Çadê, li ***Kala Balge***yê êrişê dibin ser karwanekî şêst kesî yê polîsan. Ji polîsên ku rehîn digirin dozdeh jê jîyana xwe ji dest didin. Li Abujayê, servîsa îstîxbaratê ya Nîjeryayê (***State Security Service, SSS***) dest pê dike, dikeve nav xem û fikaran. Lê belê serok **Obasanjo** di xem û fikaran de hin pêşekîyên wî yên din hene: Serhildana li deltaya ***Nîjer*** a ku lê çeteyên ciwanan êrişî ser bîrên petrolê dikin. (6) **SSS** Yusif desteser dike, pêşî wî vediguhezîne Abjuyayê, dawîya dawî jî wî berdide.

Di nîsana sala 2007ê de misilman **Umaru Yar Adua** şûna **Obasanjo** digire. Li Maiduguriyê, ***Boko Haram*** êdî destekê dide namzedê piranîya civakê **Qasim Îbrahîm Îmam**. Lê belê piştî kampanyayeke hilbijartinê ku di encamê de gelek cînayetên siyasî pêk hatin, **Şerîf** careke din hat hilbijartin. Çar salan piştî ku bikaranîna terîqetê, ji bo xwe bigihîne deshilatê, vê carê jî li dijî wê şer îlan dike. Di hezîrana 2009ê de pênc mirîdên bi motosîklet, ji alîyê polîsên dewleta ku ew bi lixwenekirina kaskan sûcdar dikirin ve tên kuştin. Ev kesên kuştî bi xwe çûbûn merasîma binaxkirina yek ji nasên xwe yên ku hê berî çend rojan ji alîyê heman hêzên polîs ve hatibûn kuştin. Li ser Înternetê, Yûsûf dîyar dike ku ew ê tolê hilde. 26ê tîrmehê ***Boko Haram*** li çar dewletên Bakur êrişeke berfireh dide dest pê kirin, bi ser banka û komîserîyan ve digire. Polîs û artêşa federal bersivê didin: Zêdetirî heşt sed kes tên kuştin, bêguman bi sedan kes bê pirsûîfade tên înfaz kirin û yek ji wan jî **Yusif** bi xwe bû. Wêneyên jiholêrakirina wî li ser tevna Înternetê hê jî tên parve kirin û terîqetê jî tûndûtûjtir dikin. Heta îro jî, ti komîsyoneke lêpirsînê ya hikûmetê nehatiye pêkanîn ji bo ku bûyerên xwînrij ên di tîrmeha 2009ê de bên ronî kirin.

Hê çend meh berê, li ***Bauchîyê***, **Boko Haram** bi ser zindanekê de girtibû, sed jê mirîdên terîqetê, heft sed kes rizgar kiribûn. Terîqet niha êdî wêdetirî xaka xwe ya dîrokî, navûdengê xwe û tesîra xwe digihîne heta perengên li ber sorbûnê yên li **Jos**, li navenda welêt: Ji destpêka sala 2000ê ve, bajar bûye derza herî nazik a şidetê û pevçûnên olî yên xwe dispêrin şerên siyasî yên ji bo desthilata ***Dewleta Pleateau***. (7)

### Herêm roj bi rojê ditengije

Boko Haram êdî ne xwedî fermandarîyeke navendî ye, lê belê ***şura***yeke (desteyeke) wê û tê texmîn kirin ku bi qasî deh zilamên wê hene. Ew xwe dispêre ser du şane (hucre) yên bingehîn. *"Cûya Dîrokî" ya* ji alîyê cîgirê **Yûsif**, **Abdulqadir Şêxo** ve tê bi rê ve birin, berê êrişên xwe bêhtir dide ser polîsan, rêveberên siyasî û îmamên "*derewan dikin û xwe li pişt perdeyên olê vedişêrin*". (8) Bi êrişbirina ser bankayên ku tefecîtîyê dikin, hem xwe fînanse dikin, hem jî wisa xuya ye ku demên agirbestê jî vediguherînin pereyan. Şaneya din a navneteweyî jî piştî perçiqandina tîrmeha 2009ê li welatên din ji penaberên siyasî kadroyan pêk tîne û tê gotin ew ji alîyê **Mamman Nûrê** girêdayî ***Cîhadîya Cîhanî*** ve tê bi rê ve birin. Vî yê dawîyê di rêbazên çalakîyan û hedefên terîqetê de jî hin guhertin pêk anîn: Êrişa xwekujîyê – ya yekem di diroka Nijerîyayê de– li dijî avahîya Neteweyên Yekbûyî, di 23yê tebaxa 2011ê de li Abûjayê. Tê gotin ku dîsa zilamên Nûr bi xwe bûn ên ketin nav pêla çalakîyên li dijî perestgehên xiristîyanan ku yek ji wan a pir binavûdeng a li derkinarê Abuja Maddalayê di 25ê kanûna 2011ê de hat li dar xistin. 20ê çileya 2012ê, ***Bokom Haram*** êrişê dibe ser ***Kano***, paytexta dewleta bi heman navî li bakurê welêt. Heşt serdegirtinên hevgirêdayî li dijî qereqolên polîs û buroyên ***SSS***ê hatin pêk anîn. Erebeyên bombebarkirî û kujerên di kirasên polîsan de jî sed û heştê kes kuştin.

Lê belê ev dilê herêmên misilmanan çima bi awayê ewçend dijwar tê hingaftin, tevî xetera terorîzekirin û dijminkirina welatîyên xwe? Li ***Kano***yê, nûnerê xwecihî yê terîqetê, **Abubakir Şêxo**, bi rastî jî li taxên xizanan jidil dihat hez kirin. Kesekî din ê ew dikaribû pê ewle bibe, walîyê berê yê dewletê **Îbrahîm Şêxo** yê di hilbijartinên giştî yên 2011ê de têk çû, bû. Ya girîng ew e ku ev stratejîya tengijandinê –ya ku ji niha û şûn ve bala wezareta karên derve ya DYAyê û lîsta wê ya rêxistinên terorîst dikşîne– bi kêrî aktorên din neyê. Lêkolîner **Morten Boos**, li ser mijarê binê van rêzan xêz dike: "*Sedema mezin a endîşeyê, îdîayên li ser hebûna têkilîyên navbera **Boko Haram** û hin giregirên siyasî û dezgehên dewletê ne. Heta niha ti delîlên van îdîayan teyîd bikin derneketine holê, lê belê divê ev yek bêhtir weke îşareteke nû ya navgînan were nirxandin, ev navgînên ku dilê hin kesan dibijîyê ji bo ku deshilat û dewlemendîyê bi dest bixin"*. (9)

* Rojnamevan.

1 Binêre "Li Nîjerîyayê, Şerîet li Hember Bûyeran Xwe Radigire", *Le Monde diplomatique*, hezîran 2003

2 Binêre, Joe Brock, "Boko Haram, between rébellion and Jihad" ("Boko Haram di navbera Serhildan û Cîhadê de"), Reuters, 31 janvier 2012

3 Binêre, Muhammad Nur Alkali, Abubakar Kawu Monguno, û Ballama Shettima Mustafa, "Overview of islamic actors in northeastern Nigeria" ("Agahdarîyên li ser Aktorên Îslamê li Nîjerîyaya Bakurojhilat"), Nigeria Research Network, University of Oxford, janvier 2012

4 ***Hanbalîzm*** ji ayînên çar mezheban ya herî hişk (beşên ramana olî ya ku huqûqa îslamî pêk tînin) ya îslama sunî ye

5 Li gor zekatê, divê misilmanek hesabê malên xwe bike û salê carekê sedeqeya para xizanan li wan belav bike

6 Binêre, "Li Nîjeryayê, petrola hêrsê", *Le Monde diplomatique*, nîsan 2006

7 11ê îlona 2001ê, dema ku cîhanê berê xwe zîvirand ser New Yorkê, Jos navenda herî dijwar a şerên navbera xiristîyan û misilmanan bû û ew şer bûn sedemê mirina zêdetirî hezar kesan

8 Ibrahim Shekau, 11 çile 2012, www.youtube.com/watch?v=umkj50SUzck

9 Binêre, Morten Boos, "Violent Islamist uprising in Northern Nigeria" ("Serhildaneke bi Şidet li Nîjerîyaya Bakur"), Norwegian peacebuilding Resource Center, 27 çile 2012, www.peacebuilding.no

Wergera ji fransî: Baran Nebar

# Her tişt li Xezayê dest pê dike û diqede

Jean-Pierre Filiu *

Tofana şideta li Xezayê ya di meha adarê de xuyê bêaram ê statuko û korerêya stratejîya Îsraîlê piştrast kir.

Şerîda Xezayê, weke herêmeke xweser, bi şerê 1948-1949ê ev dirûv girt. Pêvajoya şer û pevçûnê, gelek filistînîyên nefîbûyî lê hêwirîn. Serokwezîrê pêşî yê îsraîlî **Davîd Ben Gourion**, ku hertim xwedî vîzyon bû, bi carekê bi xetera lihevkomkirina wisa ya penaberan li bakur-rojavayê **Neguev**ê hesîya. Lewre astengîya xwezayî ya çola Sîna nehişt ku li Xezayê dîyardeyeke jihevpelişînê rû bide. Rewşa li welatên cîran bi xwe derfet dida jihevpelişîneke bi vî rengî û li derdora ***Amman, Beyrûd*** û ***Şam***ê jî penabergeh derketin holê. Herêm bi xwe jî raguherî, herî kêm ji bo ji sisiya diduyê şênîyê, wargeheke qirase ya penaberan. **Ben Gourion** ji xwe re xeyal dikir eger ew pêşnîyareke îlhaqê bike, ew ê vê pirsgirêkê ji holê rake, lê belê ev yek ji 1949ê ve li Konferansa Lozanê hat beralî kirin. Herêm hingê bû pirzika ragirtî ya tesbîtkirina enîya başûrî, qada ceribandina êrişên tirsandinê û bombebaranên bêarmanc.

Vegirkarîya Îsraîlê ya 1956ê, dema buhrana Kanala Suweyşê (Suez), bi xwe re zextûzoreke xwînrij jî anî, lê belê Xeza di bin zexta navneteweyî de neçar ma were vala kirin. **Ben Gourion** hingê nêrîna wî bi awayekî xwezayî ew bû ku pala xwe bide ser zextûrepta serokê misirî **Cemal Abdul Nasir**, ê ku li vê herêmê heta sala 1967ê soza aramîyeke rastîn dida. Dagîrkirina şerîda Xezayê, bi destpêkirina şer ji meha hezîranê ve, pêşî ji bo Îsraîlê dihat wateya bêminetkirinê, bi vegotinên dij-serhildanî, li himberî gerîlayên filistînî ên bi biryar û bêmînak. General **Moşê Dayan**ê ku bi awayekî pir hovane serhildêr perçiqandin, tercîh kir ku Xezayê li nav "derîyên vekirî" (çûnûhatina azad) ên bi *Îsraîl* û *Şerîaya Rojava* ji hev bixe. Vê siyasetê fêkîyên xwe pêvajoya du deh salan hilberandin. Serokwezîr **Îzhak Rabîn** di 1993yê de biryar da ku hem "dorgirtina" li vê herêmê biserûber bike, hem jî li gel ***Rêxistina Rizgarîya Filistînê*** (RRF/PLO) rêya dîyalogê veke.

Xwerizgarkirina ji Xezayê bû fikreke sabit ya rayedarên îsraîlî yên ku hewl didan pêkanîna nîzamê radestî hêza filistînî bikin, tevî ku mafekî herdemî yê destwerdanê jî di rewşa tehdîdê de ji bo xwe dadianî alîyekî û diparast. Berdewamîya stratejîk ji vî alîyî ve di navbera vekişîna qismî ya 1994ê û peymanbetalkirina yekalî ya 2005ê de pir zelal e. Lê belê, cihê ku lê **Rabîn** dînamîkeke aştîyê xistibû dewrê, serokwezîr **Arîel Şaron**, Xeza daf da ber rewşeke emrîwaqî.



Muzaffer Oruçoğlu: **Alozî**, teknîka tevlihev, 76 x 61 cm

### Tankvanê esker Şalît di berdêla zêdetirî hezar girtîyan de hat berdan

Ji 2005ê ve, ji ber helwêsta xwe ya bi temamî xwe dispêre ewlekarîyê ya ku di encamê de bi qebatîya xwe rê li livûtevgera navneteweyî ya ji ber buhranan peyderpey zêde bû, vekir, Îsraîl ketiye nav asêrêyekê. "Mîsyonên sîvîl", ên ji ber rewşên lezgîn ên alîkarîya ji bo mirovan derketine holê, gihîştine sînorekî ku êdî di vê astê de nikarin careke din bergehekê bidin şênîyên Xezayê. Ev bergeh asê maye li navbera milê hesînî yê ***Feteh**a* ku ti caran serkeftina îslamî ya di hilbijartinên çileya sala 2006ê de qebûl nekir û ***Hemas**a* ku ji hezîrana 2007ê ve kontrola herêmê xistiye bin destê xwe. Bi vî awayî ye ku asêrêya stratejîya îsraîlî dibe sedemê dijwarkirina asêrêya alîkarîya mirovî, û ew bi xwe jî ji ber asêrêya siyasî ya li ser dika filistînî didome, dijwartir dibe. Mîlyonek û nîv rûniştivanên li herêmê yên ketine bin nîrê vê îzolasyona fîzîkî ya zextûrepteke awarte, di navbera van her sê asêrêyan de careke din asê dimînin.

Peymanbetalîya îsraîlî û parçekirina wargehên li Şerîda Xezayê, di dawîya havîna sala 2005ê de, piştî meheke din jî hatin şopandin bi êrişeke bi navê : "jinûve destpêkirina bêdawî". Serdegirtin û bombebaranên îsraîlî wê êdî li peyhev bihatana û ya herî dawî di meha adara 2012ê de bû. Dîlgirtina eskerê tankvan **Gîlad Şalît**, di 25ê hezîrana 2006ê de, bû sedemê hilperikîneke lêzêdekirî ya şer û şidetê. Xirabûna agirbesta navbera Hemas û Îsraîlê, di navbera hezîran û kanûna sala 2008ê de, bû pêngaveke hilpekîna tofaneke şidetê û operasyona "zirinc" ya ku rêjeya qurbanîyên îsraîlî û filistînîyan beramberî yek-sed bû, tevî vê yekê jî êrişên bi roketan ên li ser Îsraîlê di 2009ê de bênavber dewam kirin. Pêvajoya şeş mehên pêşî yên sala 2010ê, artêşa dagîrker sî û çar filistînî li şerîda Xezayê (ku yazdeh ji wan sîvîl bûn) kuştin, ji îsraîlîyan bi xwe her sê kesên hatin kuştin jî esker bûn. (1) Nîvê dawî yê 2010ê jî bi kuştina sî û heft filistînîyan (ku dozdeh ji wan sîvîl bûn) qediya, di vê pêvajoyê de ti îsraîlî nehatin kuştin. (2) Dewleta Israîlê bawer dike ku formula birêvebirina sînorê xwe yê başûrî peyda kiriye, bi berdêleke sînornenas ji bo Xezayîyan, lê bi awayekî qebûlbar ji bo raya giştî ya Îsraîlê.Şoreşa misirî, ya ku 25ê çileya 2011ê diteqe û di nav hijdeh rojan de serokdewlet **Husnî Mubarek** neçarî vekişîna ji wezîfeyê dike, di nav demeke kin de dawî li vê stratejîya xapînok tîne. Di pevguhastina rolan de, Şerîda Xeza ye ya ku bi xêra tunelan qût û xwurekê digihîne bajarê misirî ***Rafah***ê ku têkilîya wî ji cîhanê hatiye qut kirin –ango ji ***Qahîre***yê– ji ber serûbinbûnên Kanala Suweyşê (Suez). Îsraîla ku israr kiribû ku peymana aştîyê ya 1979ê li gel Misirê her cure bicihkirinên eskerî li Sînayê weke şert were qebûl kirin, niha destûrê dide hebûneke ji hemû deman zêdetir a hêzên artêşa misirî li rojhilatê Suweyşê da ku bikaribin pêşî li livûtevgera şoreşgerî bigirin …

11ê cotmeha 2011ê, bi xêra navbeynkarîya Qahîre û herwiha navbeynkarîya îstîxbarata alman (BND), Hemas û Îsraîl digihîjin lihevhatina pevguhertina girtîyan. Azadkirina esker **Gilad Şalît**, hefteyek bi derengî, weke şert tê danîn beramberî azadkirina 1027 girtîyên filistînî: 477 tên azad kirin ji lîsteya pejirandî ji alîyê Hemasê û Îsraîlé ve û dûre jî 550 girtîyên din jî li gor wextên Îsraîl dîyar dike, di nav du mehan de. Helbet, ***Hemas*** nikare yek ji pêşengên binavûdeng ên ***Feteh*** –Marwan Barghoutî– ji yên *Enîya Gel a Rizgarîya Filistînê*– **Ahmed Saadet** bide berdan. Lê belê ew azadkirina hejmareke mezin a mîlîtanên Feteh, yên *Komîteya Berxwedana Gel* an jî yên *Cîhada Îslamî* pêk tîne. Bi taybetî, bi dehan kadro û endamên dîrokî yên gelek caran cezayên muebetê li wan hatibûn birîn, ji ber beşdarîya nav çalakîyên reşkujîyê yên li dijî îsraîlîyan, azad dibin û vedigerin welatê xwe.

Wê pêdivî bi derbasbûna du hezar rojan hebe, heta ku Îsraîl xwe bide ber cewhera daxwazên ku ***Hemas*** hema rojek piştî dîlgirtina **Şalît** jê re ragihand. Pêvajoya pênc sal û nîvan, artêşa Îsraîlê êriş domandin ji bo ku pişta Hemasê bişkîne, an jî qet nebe serî lê bitewîne. Hikûmeta **Benyamîn Netenyahû** di vê navberê de ji sêtrinca vê opsîyona bi temamî eskerî ti encaman bi dest naxe û li alîyê din, wê, ti caran nekarî li pêşîya kontrola Hemasê ya li ser Şerîda Xezayê bibe asteng. Berevajî, tevgera îslamî ye ya ku radihêje hefsarê tundkirina pevçûnê û wê di asta herî nizim de radigire û di heman demê de bi navgîna birêvebirina tunelan, ku hejmara wan li gor *Rêxistina Neteweyên Yekbûyî* wê şeş sed bebendên heyî ji hev bixe.

Di çileyê sala 2011ê de, mîlîtanîyeke bêhempa li Xezayê xwe dide der, tam jî li qonaxa serhildanên gel ên Tûnis û Qahîreyê. Xwepêşandaneke destekê ji bo şoreşa misirî 31ê çileyê sala 2011ê tê qedexe kirin. Jitextdaxistina serok **Mubarek**, 11ê sibatê, xwepêşandêrên filistînî dixe nav coş û liveke zindîtir. Slogana "*gel dixwaze rejîmê hilweşîne*" li Xezayê bi awayê *"Gel dixwaze dawî li parçebûna navxweyî bîne"* hat veguhertin û bi vê vegotinê ***Hemas*** û ***Feteh*** dihatin vexwendin ji bo li ser navê berjewendîya bilind a gelê filistînî mil bidin hevûdin. 14ê adara 2011ê, bi hezaran ciwan bi vê armancê diherikin kolanan. Dotira rojê hejmara wan deh qet zêdetir dibe, lê belê li Şerîaya Rojava xwepêşandan pir bi sînortir in. Lihevkombûn dipelişe, çunkî mîlîatanên Hemasê dixwazin amblema partîya xwe li ser xwepêşandêran ferz bikin ku ji bilî ala filistînî destûrê nadin ti al û amblemên din.

### Gelo lihevhatineke filistînî gengaz e?

Tevî van bûyeran jî, dînamîka yekpare qadê ji bo lihevhatineke qet nebe formel, di navbera rêxistinên Hemas û Fetehê de amade dike. Hilweşîna rejîma Mubarek jî ku ji navbeynkarîyê bêhtir hewl dida tevgera îslamî hevsar bike, bû piştgira vê pêla vebûnê. Her çi jarbûna Sûrîyeya **Beşar El Esad** e, ev jî rêveberîya Hemasê ya li surgunê neçar dihêle nirxekî zêdetir bide daxwazên li Xezayê hatine ziman. 4ê gulana 2011ê du rêveber, **Xalit Meşal** û **Mahmûd Ebbas**, ên ku ji pêvajoya pir kurt a "yekîtîya neteweyî" ya berî çar salan li Mekeyê pêk hat û vir ve nehatibûn cem hev, careke din ji bo îmzekirina peymaneke lihevhatinê li Qahîreyê hev dibînin. Çarçoveyeke hevkarîya navbera karûbarên ewlekarîya ***Remellah*** û ***Xezayê*** tê qebûl kirin. Prensîpa berdewamkirina muzakereyên ***Rêxistina Rizgarîyê ya Filistînê*** (RRF) li gel Îsraîlê ji alîyê Hemasê ve tê pejirandin, û tevî ku xwe girêdayî van muzakereyan nebîne jî, Hemas tîne ziman ku ew amade ye encamên muzakereyan bipejirîne.

Piştî rijîna ewçend xwînê û windakirina ewçend wext, rûniştivanên Xezayê pir bawer nakin ku rûpelê şer û pevçûnên Filîstînekê li dijî ya din, bi hêsanî were pelandin. Lihevhatineke rastîn dimîne weke şertê nebenabe ji bo rizgarkirina herêma ji nav mijûmorana ku ji sala 2007ê ve di nav de asê maye. Biryara dawî ya werçerxeke wisa vedigere ber destên **Ebbas** û **Meşal** ku yê pêşî li Remellahê û yê dawî li Qetarê (ji dema veqetîna xwe ya ji Şamê) pir dûrî Xezayê û karûbarên xwe yên esasî dijîn. Dozên xwînûheyfê yên milîsên dijber û dîwarên her bilindtir dibin yên burokrasîyên tevlîhev (3) li pêşîya her cure lihevnêzbûnên mayînde dibin astengên pir dijwar. Lê belê heta ku her du tevgerên sereke ên filistînî kiras û pêsîrên hev biçirînin û hevûdin ji hev bixin, mirov çawa dikare rêûrêbazeke maqûl amade bike ji bo paşerojeke bi rûmet û çarenûseke hevpar a gelê Xezayê?

Sê nifş mezin bûn li ser vê şerîda axa dîrokî. Nifşê şînê, ji 1947ê heta 1967ê, rê ji bo nifşê perçiqandinê yê navbera 1967 heta 1987ê amade kir, dûre jî ji bo nifşê întîfadayan [serhildanan] ê navbera 1987- 2007ê. Li vir jî weke deverên din ên Filistînê, rêyên derketina ji vê reşexewna kollektîf tevî vê yekê besît û nas in. Mirov dikare wan weke sê qonaxên bi fezîlet jî ji hev veqetîne: Ji rewşa dorlêgirtî xilas bûn, pêşveçûn û dereskerîkirin. Dînamîkeke wisa wê xwe bigihanda asta berevajîyê meylên nêzî du dehsalan bi heman şêweyê didan dû hev. Ciwan û xortên Xezayê ji niha ve, di dema livûtevgera adara 2011ê de, biryardarîya xwe ya ji bo xistina nîzameke evqasî bêyom û xirab raxistin pêş çavan. Ji bo pîvana asta vê çarenûsê, divê mirov vegere ihtîmala bingehîn a herî hêvîdar ya peymanên Osloyê: Berî her tiştî Xeza.

* Profesor li Sciences Po Paris. Nivîskarê bi taybetî, pirtûka bi navê *Histoire de Gaza (Dîroka Xezayê),* a berî çend rojan ji alîyê Fayardê ve hat weşandin û bû çavkanîya îlhamê ji bo vê nivîsarê jî.

1 Rapora hefteyî ya buroya hevkarîya karûbarên mirovî yên Neteweyên Yekbûyî, 2 tîrmeh 2010

2 Rapora hefteyî ya buroya hevkarîya karûbarên mirovî yên Neteweyên Yekbûyî, 7 çile 2011

3 Hemas heqdestên sî û yek hezar karmendên li şerîda Xezayê dide û hejmara tevahîya karmendên girêdayî Rêveberîya Filistînî bi qasî heftê hezaran e

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Komkujîyên di nîvê meha adarê de yên li Toulouse û Montauban ên ciwanekî ku xwe weke endamê Al Qaîdeyê nîşan da, girtin ser xwe, bûn sedemê ji nû ve vegera Enîya Neteweyî li ser mijarên wê yên herî zêde derdixe pêş: Pirsgirêkên ku li gor wan ji ber koçberî, an jî ji ber îslamê peyda dibin. Berê, namzeda ji rasta tundrew a hilbijartina serokdewletîyê, Marine Le Pen, li ser mijareke civakî ya qet nebe di nav partîya wê de nû, kampanya dabû meşandin.

### HILBIJARTINÊN SEROKDEWLETÎYÊ LI FRANSAYÊ

# Teqlebazîyên doktrînal li Enîya Neteweyî

ERIC DUPIN *

Ji bo îlahîyata lîberal, *Gîyanê Pîroz, destê nepenî ye, ew dest e ku, dê ji komeke reftarên ferdî yên egoîst, li gor Zanyarîyê û jê wêdetir li gor Nîzama Xwezayî bextewerîyeke kollektîf ava bike"*. Ev hevoka, ku biqende bi Siyaneya Pîroz re ewinde jî bi rastê kevneperest re kufir dibe, ji pirtûka dawîn a **Marine Le Pen**ê hatiye girtin. (1) Ev berhema berendama Bereyê Neteweyî (FN), ku di nîvê kampanyaya serokayetîyê de hatiye çap kirin, bi hevokên xwe yên fiş û vala, balê dikşîne ser xwe. Ew di pirtuka xwe de *"ultralîberalîzm"*ê, weke *"ji îdeolojîya çîneke serdest a navneteweyî ya cîhanîbûyî pê ve netiştekî din be"* dibîne û dibêje dê pir baş be ku mirov herî bi lez xwe ji vê *"arîstokrasîya nû"* xilas bike. Rast û çepê sazîyî dê *"heman îdeolojîya cîhanî ya ji kapîtalîzma ultralîberal bûyî, ku bi kêrî berjevendîyên olîgarşîyekê bê"* par vekin.

**Marine Le Pen** qet dudilîyê nake, ku ji bo delîlên xwe xurt bike, nivîskarên din ên ku bi kêmanî mirov dikare bêje tu têkilîya wan bi rasta tundrew re tuneye jî seferber bike. Du caran navê **Philippe Askenazy** derbas dibe û ji ber *Manifeste d'économistes atterrés / Danezana Aborînasên Têkçûyî* ya wî digire. (2) Du berhemên **Serge Halimi** hatine bi kar anîn, yek ji bo destnîşankirina dagîrkirina bazarê ji alîyê rewşen-bîrî ve û ya din jî ji bo dîyarkirina *"arîstokrasîya rojnamevanîyê"* ye. *"Globalbûn peymaneke ji bo berxwerî û materyalîzmê ye, ji bo ku Mirovî ji dîrokê derxe û wî ber bi nav tiştê ku Gilles Lipovetski weke* "qada valahîyê" *bi nav dike de bibezîne",* seroka FNê dîsa ji **Emmanuel Todd** heta bi **Franklin Roosevelt**, ji **Karl Marx** heta bi **Maurice Allais** dinivîse, ew her tiştî dide ber dasa xwe ji bo ku helwêsta xwe ya li dijî "globalbûnê" xurt bike.

Lê dîyar e, ew hîn bêtir di bin bandora **Jean Claude Michéa** de maye, ku di encamê de wiha dibêje, *"gotûbêj û devjengîyên li ser mijarên ew çend girîng ên weke sekulerî, komarê, guhastina azad an dawîlêanîna euroyê yên bikelecan ez derxistim hemberî hin hevalên min"*. Berendama serokatîyê gelek caran xwe dispêre vî nivîskarî, heta radeya ku jê re dibêje *"bila li min bibore ji ber ku min ew neteweyî kiriye"*. Divê xwendina *"L'Impasse Adam Smithe / Korerêya Adam Smithe"* (3) derfet dabe wê ku têbigihê bê çima çepî xiyanet bi îdealên xwe re kir, ku dev ji *"qada berevanîya çînên gelerî, yên karkiran* berde*, û bi ber bayê keve biçe berevanîya* yên lidervehiştî, *yan jî bênasname bike"*.

Birêvebera rastê tundrew ji bo rêzgirtineke dema bihurî ya benda reqîbê xwe ku mirov ji guhên xwe bawer nake jî îstifade dike: *" çep divê tewandî be û ez nizanim ka gelo têkoşîn tê dayîn. Mirov dikare têkoşînê weke lêker bi rehetî bi kar bîne.*

*Ew dîroka siyaseta xwe li ser navê aqil, li hemberî rastîyên dîtî dide dest pê kirin: Fîlozof û ansîklopedîstan ji ber ku ew li dijî zanînê didîtin, êrişî Dêrê, Paşverûtîyê kirin"*. Rojnameyên *Rivarol*, *Minute* û *Présent* –ku berî dilê wan ne bi ser **Marin Le Pen** de bû– êdî dê jê hez bikiraya.

Heta di gilîyên wê yên li dijî koçberîyê de jî, ku navenda rexneyê wê yê li dijî "globalbûnê" pêk tîne, **Le Pen** han dide delîlên xwe ji qada civatî peyda bike. Ew balê dikşîne ser *"rewşa pêşbazîya bi hemî karkirên welatên din re"* ku dê bibe sedema xirabûna siberoja mehanegirên fransî, *"neherêmîkirinên ber bi malê de"* bi bîr tîne û *"maska erjeng a dîlîtîya hevdemîyê"* dihejîne. Hîn jî, birêvebera rastê tundrew bi dilekî rihet axaftinên benda rikeber ji bo xwe bi kar tîne. Ew jêgirtineke **Pierre Mendès France** ya di 19ê çileya paşîn a 1957ê de, ji nav tozê derdixe ku tê de serokê berê yê Konseyê bawer dike ku divê welatê wî rastê xwe biparêze *"koçberîya ber bi Fransayê kêm bike, bi taybetî jî dema ku pêvajoya aborî, xwe parastina li hemberî xeterên bêkarîyekê û kêmbûneke standardên jîyanê yên ji derve îtxalkirî wê li ser mirov ferz bike"*.

Berendama bereparêz ji xwe re delîlan ji nameya **Georges Marchais** ya ku di 6ê çileya paşîn a 1981ê de, ji melayê Grande Mosquée/Mizgevta Mezin a Parîsê re şandibû jî derdixe, ku tê de sekreterê giştî yê *Partîya Komunist a Fransî* (PCF) vedibêje ku çima *"divê em koçberîyê ragirin, nexwe em dê bibin sedemê ku gelek karkirên din jî bêkar bimînin",* û *"tansîyon"* û fenomena *"getoyan"* bi bîr tîne. Lê, weke ku **Alexis Corbière**, birêveberê Partîya çep jî, dest nîşan dike, ew di vê navberê de ji bîra dike ku hevokeke din a **Marchais** bi bîr bîne, ku bi misogerî dibêje *"tiştê rêberîya me dike, hevpişkîya berjewendîyan, piştgirîya karkirên koçber e. Ev jî bi tevayî berevajî kîn û cudabûnê ye"*. (4)

Şerê li dijî "globalbûn"ê her weke mifteya cinetê ya FNê dimîne, ku derfeta tevahîya rexneyên wê yên li dijî guhastina azad a aborî û koçberîya ji derve didiyê. **Marin Le Pen** bi banga xwe ya ji bo *"siyaseteke ji nû ve senaîkirin û herêmîkirina çalakîyên aborî"* ku ji bo wê dê bi tenê *"derfeta jîngeheke rastîn bide",* berevanîya siyaseta proksîyonîzmê dike û pesnê dev ji euroyê berdanê dide. Stratejîya li ser bingeha deynkirina mijareke têkilîya wê bi wateyeke civatî re hebe ku mirov bikaribe pê projeya xwe ya siyasî pêş bixe, heke mirov ji her alîyî ve lê nefikirî be, hingê pir sîstematîk e.

Em dîsa ji pirtûka wê dixwînin ku dibêje, *"Ji bo min tu kêmanîya wê tuneye ku ez bêjim: Êdî cudayîyeke di navbera rast û çepê de nemaye"*. Her çend ku hin guherankarîyên di bernameya wê de, ji ya bavê wê ya berîya bi pênc salan cihê bin jî, helwêsta berendama FNê ya di derbarê pirsên ewleyî û koçberîyê de, ji ya rastê herî hişk qet jî nekêm hişktir e.

Helwêsta wê ya di warê koçberîyê de, bi taybetî jî bi *"kêmkirina koçberîya qanûnî di pênc salan de, salê ji dused hezar ketine heta deh hezar",* yan jî bi *"jêbirina mafê axê* [ku mafê hevwelatîtîyê dide kesê ku li Fransayê ji dê û bavekî bîyanî bibin– wergêr]*"* her radîkal maye. *"Tercîha neteweyî"* ya ku bi **Le Penê** bavşêrîn bû cîyê xwe daye *"pêşekîya neteweyî"*. Di 2007ê de, berendamê FNê pêşniyaz dikir ku *"alîkarîyên civatî û alîkarîya zarokan bi tenê bidin fransîyan"*. Îro, keça wî ya ku şirket wê tercîh dikin, *"û xwedî heman desthilatê ye, dibêje em bidin yên ku hevwelatîyên fransî ne",* heman mentiq ji bo lojmanên civatî -dewletê- jî derbas dibe. Heke em dîsa bên ser alîkarîya zarokan, ew jî dê dîsa *"ji malbatên ku bi kêmanî dê yan bavên wan fransî yan ewrûpî bin re be"*.

## Cezibandina perwerdekaran

Bi tenê di warê aborî de cudabûna di navbera keçê û bavê wê de gelekî zelal e. Şefê dîrokî yê FNê heyranbûna xwe ya ji bo serokê amerîkî (1981-1989) **Ronald Reaganî** qet jî venedişart. Parlamenterê ***poujadîst*** [tevgereke sendîkayî û siyasî ya fransî (1953-1958) ye ku navê wê ji yê **Pierre Poujade** tê- wergêr] ê berê, xwe weke berevanê teşebusa azad dibîne, û bêrawestan gilîyê *"dewletperestî"* û *"bacperestîyê"* dike. Di 2012ê de, **Marîn Le Pen** *"Dewleteke xurt ku hevsarê dirav û spekulasyonê bixe destê xwe"* dixwaze û ji girtina ber çavan a *"dewletîkirina, heta bi qismî û demî ya bankayên pere razandinê yên di tengasîyê de"* jî dudilîyê nake. Bavê wê pêşniyaz dikir ku rêjeya bacê ya beşê herî jor ê hatinîyê daxe ji % 20ê, lê ew dixwaze wê derxe ji % 46ê.

Di wexta xwe de **Le Penê** bav alîgirê *"vegera li temenê xanenişînîya qanûnî ya di 65 salîyê de"* bû, lê seroka niha soz dide ku *"dê wê hêdî hêdî daxe 60 salîyê",* û heta dibêje *"armanc divê weke bi zûtirîn wextê pêkan vegera prensîpa çil salîya temamkirina prîman bê dîyar kirin, ku mirov bikaribe ji xanenişînîyeke bi mehaneyeke bê kêmanî îstifade bike"*.

Birêveberên FNê yên ku li ser vê guherankarîya di bernameya wan de pirs ji wan hatiye kirin, vê yekê bi pêşketina dinyayê bixwe ve girêdidin. Cure awayekî bêrîkirina Fransaya "sîh salên serketî" ji hin ramanên **Marin Le Pen** didin der: *"Fransa, bi aborîya xwe ya têkel, bi dewleta xwe ya bibandor a ku lîstika serbest a hêzên aborî bi sînor dike; bi qanûndanîna xwe ya civatparêz û mehaneya herî kêm, xizmetên xwe yên giştî "yên biha", dibistan û karmendîya xwe ya "bêhatinî", sîstema xwe ya tenduristîya destvekirî, yekdestdarîyên xwe yên mezin ên gazê, yên elektrîkê, yên geştûguzarî û ya posteyê, ji îdeala ku ultralîberal xeyal dikin pir dûr e"*. Berendama bereyî misoger dike ku dixwaze "plankirina stratejîk" pêk bîne ya ku xwe dispêre *"berpirsîyarîya serekî"* ya bi general **De Gaule** şêrîn.

Ev hemî heqaret e ji bo rabirdûya rastê tundrew ê fransî yê ku gelek hesasîyetên wî hene û ku **Le Pen**ê bav di salên 1970yê de ew bi awayekî serketî li dora xwe kom kiribû. Birêveberê berê yê FNê û danerê *Kluba Horlogê*, **Yvan Blot**, nerazîbûna xwe bi hêrs derdibire: Xanima **Le Pen**, ew dinivîse (5), *"marksîsta dawîn a Rojava ye. Dengdarên wê yên bi koçberî û ewleyîyê mijûl in, dê li hemberî ferqa mijûlîya xwe û ya Marina Sor mat bimînin!"*.

Divê mirov çi qîmetî bide nivîsên berendameke di kampanyaya hilbijartinê de? **Florian Philippot**, birêveberê stratejîk ê kampanyaya berendamê, piştrast dike ku *"wê pênûs girtiye û ji Ayê heta **Z**yê nivîsiye"*. Ev teknokratê ku ji Tevgera Komarî û Hevwelatî ya **Jean-Pierre Chevènement** derbas bûye, bi kêmanî dizane ku ev pirtûk mêyweyê *"xebateke hevpar a du salan e"*.

Ev nivîs ne ji ber taktîkeke ji bo peydekirina piştgirîyeke ji derûdorên cihê ye gelo? FN, birastî îro di nav rastê tundrew de di rewşa tekelbûnê de ye. Ji bo wê jî ew dikare pişta xwe bi dengdarên adetî, konservatîv rast bike, û li dengdarên nû bigere. Perwerdekar, weke mînak, ku **Marîn Le Pen**, di dema konferanseke li ser perwerdeyê ku ji alî "think tank"a bereyî ve bi sernavê Raman û Neteweyê, di 29ê îlona 2011ê de hatibû organîzekirin de, bi van peyvan pirsan ji wan dike: *"Demeke dirêj, şaş têgihîştinek di navbera me de çêbû. Demeke dirêj, me li we weke em li dijminên xwe binêrin, nêrî. Demeke dirêj me nizanibû ku em ê çawa bi hev re bipeyivin, (...) Demeke dirêj, me şaşîyek kir ku em fikirîn hûn li hemberî hilweşandina dibistanê bêdeng man, an bûn hevkarên xirabkeran. Ji bo piranîya kesên weke we, ev şaşîyek bû û ew dewran derbas bû, dê careke din venegere"*.

Her bi vî awayî, rexneya neheqî û bêîstikrarîya sîstemeke aborî ya bêbalans dikare – di rewşeke krîzê de– bibe stratejîyeke rastîn a ji bo îqnakirina derûdorên gelerî.

### Nebûna parvekirina dewlemendîyan

Ew dixwaze gilî û gazinan ji sextekarîyê bike. Piranîya helwêstên xwedêgiravî civatî yên Bereyê marînîst li hemberî lêkolîneke kûr nikarin zêde li ber xwe bidin. **Marin Le Pen** sozê "Dewleteke xurt" û lêpirsîna Revîzyona Giştî ya Siyaseta Dewletê (RGPP) ku li ser navê wê meqamên karmendan bi awayekî girseyî ji navê hatin birin, lê ew fermanê dide ku birêveberîyên herêmî *"planeke zerûrî ya kêmkirin, yan jî stabilîzekirina mewcûda xwe"* pêk bînin. Mînakeke din: Bernameya wê xweş dike ku mehaneyan 200 euroyên net heta 1,4 qatê mehaneya herî kêm, ku ji alî "beşdarîyeke civatî ya îtxalatê" ve tê fînanse kirin zêde bike; lê rastîya wê tiştê mewzûbahs sivikkirina ew çend prîmên ewleyîya mehaneyî ye, ku ew jî dê di warê parvekirina dewlemendîyê de neyê wateya tu tewazûnê –ku pirseke bi tevayî ji vê partîyê re xerîb e.

Ji alîyê din ve, berendama FNê, di warê lihevanîna du baskên propagandaya xwe ya ku xîtabî du beşên gel ên cihê dike de zahmetîyê dikşîne. Pirsa jiberxwekirina zarokê semptomatîk e ji bo zehmetîyên wê yên di warê razîkirina hem dengdarên mihafezekar ên ku bi tevayî li dijî her cure di nîvî de birîna bihemlebûnê ne, û hem jî dengdarên ku hê nû piştgirîyê didin, ya bi saya mafên jinan hatiye bi dest xistin. **Marin Le Pen**, di bernameya xwe de, berîya dîyar bike ku dana mesrefên di nîvîde birîna bihemlebûnê dê *"ne berîya her tiştî"* be, heta heke ku budceya ewleyîya civatî li hev dernekeve, dikare ji navê jî bê rakirin, bi vê tevlîhevîyê qîma xwe tîne *"azadîya jinan a jiberxwenekirinê heye"*.

Êrişa berendam **Nicolas Sarkozy** ya li ser mijarên taybetî yên FNê, ku bi awayekî nisbî di anketan de bi biserketinê hatin tacîdar kirin, berendama partîya rast a tundrew mecbûr kir ku di dema kampanyayê de, li ser koçberî û îslamê propagandayeke hîn tûnd û tûjtir bike. Dîsa jî ew zorê dide xwe ku dev ji alîyê îtiraza aborî berde, ku di vî warî de ew hisabê berfirehkirina bandora xwe ya li ser çînên populer û navîn dike. Ev peşbazîya di nav Yekîtîya ji bo Tevgereke Gelêrî (UMP) û FNê de, tevî vê jî cesaretê nûker ê birêvebera nû ya bereyî bi sînor dike, ku nikare rîska bi tevayî qutkirina rihên dîrokî yên partîya xwe ya bi tûndrewan re bigre ber çavan.

* Rojnamevan, û nivîskarê *Voyages en France / Gerên li Fransayê,* Seuil, Parîs, 2011.

1 Marine Le Pen, *Pour que vive la France / Ji bo ku Fransa bijî,* Jacques Grancher, Parîs, 2012

2 Philippe Askenazy, Thomas Coutrot, André Orléan et Henri Sterdyniak, *Manifeste d'économistes atterrés. Crise et dettes en Europe: 10 fausses évidences, 22 mesures en débat pour sortir de l'impasse / Danezana Aborînasên Têkçûyî. Li Ewropayê krîz û deyn: 10 delîlên sexte, ji bo ji korerêyê derketinê 22 tedbîrên gotûbêjkirinê,* Les Liens qui libèrent, Parîs, 2010

3 Sernivîsa wê ya tam *Impasse Adam Smith. Brèves remarques sur l'impossibilité de dépasser le capitalisme sur sa gauche / Korerêya Adam Smith. Daxwiyanîyên kurt ên li ser nepêkanbûna derbaskirina kapîtalîzmê di çepê wê re,* Flammarion, Parîs, 2006

4 Alexis Corbière, "Marine Le Pen, un livre absurde et dangereux pour la France / Marine Le Pen, pirtûkeke pûç û xeter ji bo Fransayê", 3ê sibata 2012ê, www.placeaupeuple2012.fr

5 Yvan Blot, "Un livre néomarxiste? Quand Marine le Pen devient Marine la rouge... Pirtûkeke neomarksîst? Gava ku Marin le Pen bibe Marîna sor...", 4ê adara 2012ê, www.atlantico.fr

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

# Bazirganîya belengazîyê, mîkrokredî

CÉDRIC GOUVERNEUR *

Bi dana wan a mîqdarekî hindik ji bo pê çalakîyeke ku karibe deyn pê danê, diviyabû mîkrokrediyan ên herî hejar bihêz bikirana. Lê li Hindistanê, mantiqê hîsedarîyê bi ser ket: Şirketên bi mîkrokrêdîyê avabûyî bi mêtina xwîna yên herî lawaz ji xwe re serwetan didin ser hev.

**Laksmi** û jina wî **Rama** yên ku ji bo 70 rûpîyan qezenc bikin (dike 1,10 euro) duwazde saetan dixebitîn, êdî nema sebra wan bi çêkirina bi qasî hezar *beedies*an (cixareyên bibêhn) dihat. Vê malbata bi du zarokan 5 000 rûpî (78 euro) ji sazîyeke ku mîkrokrêdîyan dide, deyn kiribûn, ku ji xwe re pê quleke dikana giwîzên palmîyeyê, li bajarokê Warangalê yê ser bi eyaleta Andhra Pradesh a ku li başûrê wêlatî dimîne, vekin. Bi vî awayî, wan dê heftê 130 rûpî deynê xwe bidana û belbî baştir debara xwe bikirana. Lê, **Rama** dibêje ku **Laksmi** nexweş ket: *"Bi dirêjîya çar mehan, nema karibû bixebite"*. Teqsîdên me ketin ser hev û li gel wan jî selef zêde bû. Ji ber ku şirketên mîkrokrêdîyê sîstema berpirsiyarîya hevpar a şirîkan bi kar anîn, cîran bêtir bi hevdu ketin: Ji ber ku gava yekî deynê xwe nedaya, yê din diviya li şûna wî deynê wî bida. Cotê, ji canê xwe bêzar, qudûmşkestî ji bo deynê xwe yê pêşî bide careke din xwe dixe bin deynan û krêdîyê distîne. Paşê cara sisiyê krêdîyê distîne ku deynê duyê bide... Li ser hev pênc caran, krêdîyeke bi bihayê çi bigire 1000 euroyan digire.

Di encamê de bi temamî deyndar li ber derîyê koxa mala **Laksmi** û **Rama** konên xwe vedigirin. Paşê jî ew -bi awayekî qet neqanûnî- dest datînin ser dikana piçûk a gwîzan ku vekiribûn, ocaxa wan a gazê, xişrên wan ên zêrîn û her wiha jî mekîneya wan a dirûnê ku yek ji du keçên wan, Eegaya 20 salî, cilûbergan ji bo frotinê pê çêdike. Gava ku keçik ji deyndaran re dibêje em ê bi çi parîyekî nan bixwin, jê re dibêjin *"Tu xweşik î: Laşê xwe bifiroşe!"* Ji ber vê heqaretê, di 28ê îlona 2010ê de, keçik agir bera bedena xwe dide û xwe dişewitîne.

Wezîrê Karên Pêşxistina Gundan **Reddy Subrahmanyam** bi kurtî dibêje *"Hejar dikarin bi hêsanî krêdîyê bistînin, lê bi çi bedelî! Tevli xercên zêde û hindik ma selef bigihîje ji %60ê"*. Li gor fikra **Bangladais Muhammad**ê xwedîyê Xelata Nobelê ya Aştîyê, (1) yê ku ev sîstema mîkrokredîyê îcad kiriye, diviya mîkrokrêdîyê derfeta bidestxistina jêdereke nû ya hatinîyê bidana, ne ku roleke temamker bidîtana. Cihêtîyeke serekî ew e, ku mîkrokrêdîya hindî êdî weke kredîyeke ji bo xerckirinê xwiya dike: *"Yên herî hejar vê krêdîyê dikşînîn ku heqê doktor û dermanên xwe, qelenekî, dawetekê, televizyonekê yan hecekê bidin,* **Subrahmanyam** li pey hev rêz dike. *Mikrokrêdîyê diviya mirovên herî mahrûm bi hêz bikira, rûmeta wan li wan vegeranda. Lê mixabin êdî, wan heta qirikê dixe nav sefaletê"*. Û li şûna ku piştgirîyê di navbera wan de ava bike, berpirsiyarîya hevpar a deynkirinê bi cîranan re civatên gundîyan ji hev dipeşkilîne.

**Andhra Pradesh** çaryekeke mîkrokrêdîyên taybetî yên welatî, ku dike 52 mîlyar rûpî (818 000 euro) û di 2010ê de li 6,25 mîlyon malbatan hatiye belav kirin, kom dike. (2) *"Di salên 2000ê de,* **Abhay N.**, edîtorê rojnameya li ser Înternetê ***India Microfinance*** vedibêje, *li herêmên çolter ên ku gerîla lê aktîf e, hikûmeta herêmî ji bo rê li ber bandora maoîstan bigire, dest bi gelek bernameyên civatî kiriye"*. Dewlet bankeyan teşwîq dike ku krêdîyê bidin gundîyên ku di komên alîkariya hev kirinê de cîh digirin *(self-help groups,* ou SHG) û ew bixwe jî beşeke selefê digire ser xwe.

Li gundê ***Dharmasagram*** ê bajarokê ***Warangalê***, dayikeke xwedî zarok, **Bhergya** vedibêje ku wê çawa karibûye bi riya SHGyê, bi selefeke % 12 (ku ji % 9ê wê dewlet digire ser xwe) ji bankayê hinekî zêdeyî 1000 euroyan deyn bike û pê erebeyeke barkêşanê bistîne, paşê jî bi kirê bide birayê xwe, bi kêfxweşî dîyar dike: *"Kiriya erebeyê ji min re mehê net 6 000 rûpîyan* [94 euro] *tîne û divê ez 2 700an heqê wê bidim"*.

Lê şirketên taybetî vê peywendîyê ji bo gundîyan bixapînin û krêdîya xerckirinê li ser modêla ewropî bifiroşin wan, bi kar tînin. Ev guherankarî bi pêşketina piranîya şêst û şeş sazîyên mîkrokrêdîyê yên hindî dikare bê rave kirin, ku êdî mentiqekî bi tenê rêberîya wan dike û ew jî yê berjewendîyê ye. Nimra yekê ya vê sektorê, SKS ye ku di 1998ê de ji alîyê **Vikram Akula**, yek ji xebatkarên civatî yê xwedî dîploma zanîngeha Şîkagoyê ve hatiye damezrandin. SKS di destpêkê de rêxistineke ku armanca wê ya kar nebû. *"Vê statuya wê ya hiqûqî rê li ber digirt ku têra xwe deyn bide",* yek ji berdevkên şirketê yê ji navenda wê ya li ***Heyderabad***ê vê yekê piştrast dike. *Ji bo wê jî* ***Akula****, di 2005ê de, biryar dide ku wê bike şirketeke diravî ya nebankayî"*. Li gor hiqûqa hindî, şirketeke wiha dikare pere bi deyn bide, lê nikare pereyê kesên din li cem xwe bigre. Weke hemî patronên sazîyên mîkrokrêdîyê ku me têkilî bi wan re danîbû, ji bo me qebûl bike pir mijûl bû. Berdevkê wî li hemî berpirsiyarîya şirketa xwe ya di warê xwekujîyan de da mandelê (înkar kir).

Destûrnameyeke nû ya hikûmeta **Andhra Pradesh** (Partîya Kongreyê) li tahsîldaran çûna mala deyndaran qedexe dike û deyndaneke nû bi şertê destûrdana dewletê ve girêdide. Ji bo rikeberîyê van tedbîran têrê nedikir: ***Telugu Desam Party*** (TDP) ya di navbera salên 1999 û 2004ê de, li Andhra Pradeshê li ser hikum bû, îdia dike ku bi têsîra vê tedbîrê bi mîlyonan deyndar sor kirin ku êdî nema deynên xwe bidin.

Li bajarokekî Heyderabadê, em çûn mala xanima **Kaushalya** û cîranên wê. Vê dapîra liserxwe û jêhatî ji bo dermankirina mêrê xwe yê felcbûyî xwe xistibû bin deynan. Lê ji ber ku nikaribû deynê xwe bide û diviya deyndarên din ên taxê deynê wê bidin, ji alî wan ve hatibû tacîz kirin. Lê van xaniman biryara xwe dan ku bereyeke hevpar çêkin û careke din tu deynan nedin: *"Ji çirîya paşîn a 2010ê bi vir de, me qet qiruşek jî neda,* ew bi cilûbergên xwe yên herêmî, bi serbilindî û bi awayekî cidî dibêjin. *Mirovên şirketa krêdîyê me tehdîd dikin, ji me re dibêjin ku em ê bikevin zindanê, lê tiştekî wiha nebû, êdî em qet gudarîya wan nakin û bala xwe jî nadin wan!"* Mînakên wiha yên piştgirîyê di nav gundîyan de, li seranserê welêt qat bi qat zêde dibin. Û miqdarê deyndanê her ku diçe kêm dibe, % 97ê daketiye % 20, heta % 10ê... Di encamê de, *"lêpirsînên di derbarê pêncî xwekujîyan de berdewam in. Berpirsên tacîzê divê îfadeya kiryarên xwe li hember dadgehê bidin"*, Subrahmanyam sozê dide.

Sîh û neh birêveberên SKSê ên ku têgihîştin ba li wan vegerîyaye, stokên senedên xwe yên hîseyan ji destpêka krîzê heta dawîya 2010ê tasfiye kirin. (3) Li gor agahdarîyên me, şirketên mîkrokrêdîyê êdî li gundên bişûndemayî yên xwecîh ên Advasisê: Yên îzole, belengaz, nexwendî, yên ku kêm dikarin ji wan bikevin şikê, dest bi kar kirine... Mîkrofînansa hindî dikare henekên **Alphons Allais** (1854-1905) ji xwe re bike mal: ″ pere li ku be divê mirov here wir: yanî here cem xizanan. Pereyê wan kêm e lê hejmara wan ewqasî zêde ye ku... ″. (4)

* Rojnamevan.

1 M.Yunus, di 1976ê de Grameen Bank ava kir, di adara 2011ê de ji şirketê hat avêtin, bi ihtîmaleke mezin ji ber kîndarîya serokwezîrê zordar Şêx Hasîna

2 Narasimhan Srinivasan, "Microfinance India: State of the sector report / Mîkrofînansa Hindistanê: Raporek li ser rewşa sektorê diravî", SAGE Publications India Pvt Ltd, New Delhi, 2010

3 *Express India,* New Delhi, 11ê sibata 2011ê

4 Bişirîn, Paris, 27 kanûn 1902

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

# Di nav daristanê de bajarê taybet

MAURICE LEMOINE *

Serokdewlet **Porfirio Lobo** 18ê çileyê, di civîneke çapemenîyê de bi kelecan got, "*ez bang li gelê xwe dikim ku xeyal bike û bijî li devereke îdeal, ya ji sûcan şûştî, li ser erdekî xweser xwedî sîstemeke perwerdeyê û tenduristîyê ya baştir*". (1) **Paul Romer** dikare xwe razî bihesibîne.

"Aborîzanê bêqisûr" (ev peyv ne ya me ye), dersdarê li zanîngeha ***Stanford***ê li seranserê dinyayê, bi taybetî jî ji gelek salan û vir ve li Afrîkayê diçe û tê, li welatekî digere ku teorîya xwe di pratîkê de lê pêk bîne. Ew teorîya xwe weha bi tefsîlat rave dike: "*ya ku pêşîyê li pêşketina welatên xizan digire, "pîvanên xirab" in ku dewlet li ser muteşebbisên bi vî rengî cesareta wan namîne, ferz dike.* (2) Li gor wî dema li ser erdên beyar "Charter Cities" ango "bajarên model/numûne" peyda bibin, li van bajaran ev muteşebbisên neteweyî û bîyanî wê fabrîke û kargehên xwe ava bikin, lê belê herweha binesazî, xanî, dikan, dibistan, nexweşxane û xizmetên pêwîst ên ji bo karker û kedkarên ku bêkarîyê ew heta wir ajotine jî ava bikin. Bêguman qanûn, dadgeh, polîs, xwerêveberîya wê bi xwe –û wê bacê nede welatê wê dihewîne, bac ji wê bi xwe re ne– wê hebin.

**Romer** bi tenê yek berjewendîya nazik îfade kiribû heta roja ku di çileya 2011ê de bi inîsîyatîfa serokê ***hondurasî*** yê şirketa milk a amerîkî *Inter-Mac International*, **Xavier Arguello** li Waşîngtonê bi serokê kongreya vî welatê piçûk ê Amerîkaya Navîn **Juan Orlando Hernández** re rûnişt. Wî jî bi **Lobo** û çend hevkarên wî re li ***Miami***yê civînek organîze kir.

**Romer** behsa serketinên Hongkong, Sîngapûr û Deverên Aborî yên taybet ên Çînê dike. Kesên reşbîn wê li ber vê yekê rabin û bibêjin, şert û mercên dîrokî, cografî, aborî û çandî yên ku ev welatên mînak di navê de bi pêş ketin, wan ji şert û mercên li ***Honduras***ê hene, pir dûr bi cih dike. Ji bo ku mirov **Lobo** û hevalên wî bişehitîne bêhtir divê. 17ê çileyê di televizyonê de sekreterê giştî yê Kongreyê **Rigoberto Chang Castillo** piştî ku argumanên heyî pirgêsinî kirin –"*muteşebbis li qadekê digerin ku qanûnên welêt lê derbas nabin*"– pesnê wê modelê da, ku li Çînê "*400 milyon mirov ji feqîrîyê xilas kirin*".

Ji bo ku ji tenê "bajarekî model" yê hezar kîlometre kareyî (33 km x 33 km) fireh peyda bibe, Kongreyê di xala 304ê ya Destûra Bingehî de –"*tu caran dezgehên ku di warê huqûqî de îstîsna ne, nikarin bên afirandin*"– reform kir û peyva "*ji bilî îstîsnaya* (heman peyv!) *îmtiyazên huqûqî yên Herêmên Taybet ên Pêşketinê* [HTP]" lê zêde kir. (3)

Piştî eşkerekirina biryarnameya ku xebitîna bajarê (yan jî bajarên) model diyar dike, qanûnên Hondurasê –yên der barê mafê kar jî di navê de–, ji bilî qanûnên der barê hukumranîyê(!), têkilîyên derve (HTP wê dîsa jî karibin lihevhatin û peymanên navneteweyî mohr bikin), hilbijartin, weşana belgeyên nasnameyî de, wê li wir neyên pêk anîn. Weke hîpotez heke hikûmeteke din hez bike vê lihevhatina li ser parçeyekî erdê neteweyî ya ku encama rejîmeke darbeya eskerî ye, biguhere, hingê bi kite kit hatiye diyar kirin: "*sîstema li HTPyan pêkhatî divê* (...) *ji alîyê Kongreya Neteweyî ve bi piranîyeke wesfdar ya ji sê paran didu bê erê kirin*" divê herweha bê zanîn ku "*ji bo ku ev statuya destûra bingehîn were guhertin, şirovekirin û li ber rabûn, divê piştî referandûma di nav şênîyên li HTPyan dimînin, bi heman piranîyê pêk were*". "Hindikahîya ultra-hindikahî" ya ku di bin tehekkuma efendîyên vê devera dor lê girtî de dest û piyên wê girêdayî ne!

**Dema ku Lobo îdîa dike ku ev "bajarên model" wê "*awayekî jîyanê yê sinifa A*" biafirînin, gelo ew hez dike li gor destûra bingehîn du kategorîyên welatîyan pêk bîne?**

Hondurasa li navenda berzexa Amerîkaya Navîn e, bi peymaneke bazirganîya serbest (PBS) girêdayî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Kanadayê ye û bi vî rengî îmkana hilberîn û firotina bo van dewletan çêdike, bêyî ku riyên dirêj yên di kanala ***Sûwêz***ê re (hebûna krîzên herêmî) yan jî di ya ***Panama***yê re bikudînin. Serokê Bankeya Navamerîkî ya Pêşketinê (BNP) **Luis Moreno** 2yê adarê çû serdana ***Tegucigalpa***yê û bi xurtî serokdewlet **Lobo** pîroz kir: "*BNP wê destekê bide vê hewldana ku li gor me hem nûjen e û hem jî ji bo paşeroja Hondurasê tiştê herî girîng e.*"

Lê belê behsa kîjan paşerojê tê kirin? Em qebûl bikin (bi girnijîneke gumanbar) ku rêz wê ji şertê destpêkê –kar, xanî, perwerde, tenduristî, ewlekarî, asta jîyanê ya bilindtir ji asta jîyanê ya bi navincî– re were girtin jî hîç şik û guman tê de nîne ku ev giravoka xwedî îmtiyaz wê bike ku bi sedhezaran kesên mehrûmkirî hewl bidin lê karekî peyda bikin. Gelo hingê wê pêwîst be ku ev *geto* li dijî vê girseya ku wê biherike û zorê li derîyê wê bike, bi birc û têlên rêsayî yên bi elektrîk bê parastin? Dema ku **Lobo** îdîa dike ku ev "bajarên model" wê "*awayekî jîyanê yê sinifa A*" biafirînin, gelo ew hez dike li gor destûra bingehîn du kategorîyên welatîyan pêk bîne?

Hîpotezeke din a realîsttir zêde xweşbîn nîne. Dema ku Serokê Kongreyê **Hernández** kite bi kite behs dike, dike ku em xetên wê yên giştî texmîn bikin: "*ev weke* maquila*yekê ye ku gelekî bêhtir fireh e* (...); *ev weke jîyina xewna amerîkî li Hondurasê ye.*" (4) Pirsgirêkek heye, ew jî ew e ku *maquila* (fabrîkeyên serkar û taşeron) pir kêm dişibin xewna behsa wê tê kirin! Ji destpêka salên 1990ê ve ew nexasim li ***Tegucigalpa*** û ***San Pedro Sulayê*** bi pir zêde îstîsmarkirina karkeran û astengkirina sendîkayan, tên nasîn. Ev şirket halê hazir pir karkerên xwedîyê peymanên kar ên bêdem ji kar derdixin û didin zanîn ku ew ê yên herî baş ji nû ve bigirin kar, lê belê "heqê wan li gorî saetê bidin" – bi vî awayî ew ê mafên xwe yên civakî yên bi destxistî, ji dest bidin.

Armanca "*Charter City*"ekê wê hemin ne weke di *maquila*yên nifşê pêşî de hilberandina tekstîlê be, ew ê teknolojîya bilind hilberînin. Li ser pirsa "*gelo karkerên biwesif ên Hondurasê hene?*" **Silvestri** bi beşişînekê bersivê dide: "*ez ê ji dil û rastgo bim, na karkerên me yên biwesf nînin. Lê belê dema ku* maquila*yan dest pê kir, hingê jî tu kes amade nebû. Îro sedûpêncî hezar karker di wan de îstîxdam bûne.*" Kevneparlemanter **Elvía Argentina Valle** realîsttir e û dibêje: "*heke qanûnên wan bi xwe hebin û dema mirov girîngîya sermayeyê jî li ber çavan bigire, muteşebissên çînî wê çînîyan, yên koreyî wê koreyîyan bînin û bi tenê pir kêm kar wê ji Hondurasîyan re bimînin.*"

**Romer** pêşbîn e, heke bextxweşên pêşî neqandî bi mijarên nerazîbûnê bihisin, ew dikarin serê xwe li dîwaran bixin – ango biçin. Heke ew bixwazin mafên xwe biparêzin? "Bajarê model" hebûna tu şêwazê sendîkayan qebûl nake. Heke ew li ber xwe bidin? Polîsê taybet wê dîsa nîzamê pêk bîne, huqûqeke îstîsnayî wê nîqaşan ji holê rake. Heke alozî û rewşa serhildêrîyê dewam bike û belav bibe? Hingê ji bo çi artêşeke seferê ya ji Asya yan jî ji devereke din hatî li vî parçeyê erdê êdî hukumranîya dewletê lê nemayî, nîzamê ji nû ve pêk neyîne...

Bêguman bêyî ku haya wî ji girîngîya îfadeyên wî hebe, dema ku em 3yê adarê rastî wî hatin, **Silvestri** bi dengekî bilind dihizirî: "*guman tê de nîne ku Sîngapûr baş dixebite ji ber ku dewleteke totalîter e. Serokdewlet bîstûçar salan li ser desthilatê ma; niha jî kurê wî desthilatdar e... Li wir gelek avahî/struktur hene ku li cem me nînin. Ev pirsgirêkeke mezin e ku em vê modelê li rastîya me bînin.*"

* Nûçevanê taybet yê LMd

1 The Associated Press, 20ê çile 2011

2 Paul Rommer fikrên xwe li ser malpera "Charter Cities" bi pêş dixe: www.chartercities.org/blog

3 Sedûbîstûşeş deng li hemberî dengekî dijber û dengekî xwe jê vedayî

4 *El Heraldo,* Tegucigalpa, 4ê çileyê 2011

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Bîranîneke ji agir

MAX DORRA *

Psîkanalîzê xwe daye karûbarên ji bo azadkirina gîyanî ya mirov; lê belê vedîtina tirsan, dilbijînan, xweşxeyalan, li ser têgihîştina nirxên bi gelemperî pejirandî û rewatîya hîyerarşîyên serdest, ne bêtesîr e. Ew di heman demê de dibe alîkar ji bo xweragirtin û têkoşîna li himberî modelên siyasî yên weke yekane heqîqeta gengaz tên hesibandin.

Gelo şerê çînan xwedî naverokeke veşartî bû?

Henri Lefebvre,
*Danezana diferansîyalîst*

Tengezarîya bazaran: Ev vegotina hêç û ecêb piştgirîyê dide veşartina rastîyê. Lê dîsa jî, wexta mirov cihê peyvan diguhere, ew derfetê dide peyva herî girîng xwe bide pêş: Tengezarî. Ne ya bazaran, ya kesan, ku gotara aborîzanên medyatîk a têkildarî "deyn" bêyî şerma wan sucdar dike: "We demeke zêde dirêj ji heddên xwe zêdetîr mesref kirin û jiyana xwe usa domand". Bi wî awayî tirs/şidet, a ku li himberî *yê din*, bîyanî tê hîs kirin, veguherî reaksîyonê. Ew e koka siyasetê. Ev koka girêdayî hestan ku tête înkar kirin, ("ne koka zanistî"...), ya ku zanîngehên îro behsa wê nakin. Ma jixwe her desthilatî di encamê de xwe naspêre ser kapasîteya tengezarkirinê, zarokhiştinê?

Pêwîst e mirov wê nas bike, da ku hewla jê xilasbûnê bide, ji vê tirsa girîng ku rûyê veşarî yê cure şidetê ye -tirsa ji *yê din*-, bê guman ya ku berî her tiştî pêwîst e, ew e, daku em karibin behsa guhertineke reel bikin, guhertineke ku di dawiyê de serkeftinek e.

Şidet, bi tenê tundrewîyeke xapînok, tundrewîyeke neçûye serî ye.

Awayê çûna ba yê din bêyî xwewindakirin, ev hunera di bingeha xwe de siyasî ye ku divê mirov wê hê ji zaroktîyê ve fêr bibe. Ji vê ramana, ji bo berbiçavkirina vê utopîya pedagojîk, fîksîyoneke ku bi awayekî balê dikşîne rasthatina **Lacan** (mirovê "vegera li Freud") li tekstên **Sîgmûnd**. Lihevrasthatina xeyalî ya her du kesayetîyên ku di tevahîya jîyana wan de hebû ku bikevin nav rîska hebûnî ya guhdarîkirina li yên din.

Ew niha bi temamî bêlivûtevger bû.

Ew li paşnavê wî, li paşnavê bavê xwe ku wê ti kesî ti caran navê wî nizanibûya, difikirî. Navê wî bi xwe -**Jacques Marie**- wê pê ve bima, qet nebe heta çend wextan, weke nîşaneke cihêreng ku divê wî karibûya pêvajoya bi salan pê xêz bike.

Ew demeke dirêj pir bi tenê mabû. Dûre, yên din hatibûn, şagird, bi hejmareke wisa mezin ku neçar mabû pir hişyar û baldar be ji bo ku ew, gotina wî li gor xwe neguherînin. Di dema semîneran de wî dinyayek şema, krokî, pêşnuma li ser text ji wan re xêz kiribûn û di nav vê lezûbezê de yek ji wan bi tenê jî ne ya herî baş bû. Diviyabû ku wî ya herî baş ji bo xwe bihişta, bêyî vîna xwe: Tiştek hebû ku ti caran bi awayê herî baş nehatibû xêz kirin. Wan dinyayek pirs jê kiribûn. Hemû ew pirs niha di pirtûkekê de kom dibûn: Pirseke yekane. Û **Pontalîs**, serhildêrê dilovan, yekane şagirdê ku dikaribû jê veqete bêyî ku wî bikuje -û bi rastî jî ew jê veqetiyabû- bû yê ku ew pirs jê kiribû. (1) Li pêşberî her kesî. Berî gelek salan, **Pontalîs** der barê *reel*ê de jêpirsîna wî kiribû. Wî dixwest bi vê yekê çi *bibêje*? Wî bi rastî bersiv nedabûyê.

Reel, ne gengazî (mumkunî) ye. Ji ber ku ew ne tiştek e ku bikaribe were xeyal kirin.
Her tiştekî nû yê ku dibe mijara lêkolîn û analîzê bi serê xwe bûyerek e. Rûyê vî *yê din*, gotina wî dibin destpêka mutleq ku li hember wê, divê were pejirandin, teorîya herî biserûber û şemayên herî sofîstîk jî wê ji hev bikevin û hilweşin. Ev kêlîya pêşî, ev bîstika nebinavkirî, eger ew ti caran nehatibe teswîr kirin, ji ber ku ew mîna xewneke di pratîkê de her tim jibîrkirî ye. Wêneyên çirûskî ku carna, tenê rêbaza lihevkombûna azad -îcada şahane ya **Freud**- wan diqefêle.

Tevî westana xwe jî, bi awayekî ecêb, wêne, peyv weke her car bi awayên xwe diherikîn.

Reel ti caran nabêje *ew çi ye*, lê bênavber dibêje *ew ne çi ye*. Dema ku ew xwe hêdî hêdî dide der, bîranînên xumamî û şîlo xwe bi ser de digirin. Lê belê nûyê tundrew (radîkal) bi şêweyekî bêwestan bera wan dide. Ew protesto dike: Ez ne ev, ne ev, ne jî ev im.

Ya ecêb çi ye eger, ji bo xwe vesazkirina li pêşberî vê nûya ku averê dike, ku endîşeyê dide, ji bo bi awayekî ji awayan xwe jinûve gihandina nermbûneka cihêreng a aîdê xwe, mirov di rewşeke bêhêvî de zêdetir kombînezonan bixe nav gotina xwe? Di navbera qadên xeyalî de têkoşîneke dijwar heye.

Her yek, ji bo yê din, bajarek e ku di nav de divê mirov tevî xetereyan bi êşûazar, fêr bibe ka ew bi kû ve diçe. Labîrenteke ku jê gelek gavên berepêş û berepaş -danpeyheveke nepêşbînkirî ya hêvî û bêhêvîtîyiyandawîya dawî mirov, bi hêsanî, an jî bi dijwarî, dikare xwe ji nav rizgar bike û derkeve.

Guhdarîkirina li yê din -yê din, di ser de jî yê herî nêz-, rê lê vekirin e ji bo ku xwe li dijî me jinûve saz bike. Herwiha dîsa ev e ku mirov di nav gotinên wî de dibihîse: Rêya ku divê ew bide ser ji bo xwe derxistina ji me, ji nav vî bajarê bi dîrokê barkirî, vê labîrenta ku em dinimînin û temsîl dikin, eger hûn ji wî bipirsin. Û dibe ku ew me bitengijîne, eger, tevî xisûstiyetên ku ew ji me werdigre jî, -stîl, awayên cihêreng, rîtma ku bi xeşîmî ew teqlîd dike-, ew ê di vê jinûvesazkirinê de bi ser nekeve. Weke ku em jê hêrs dibûn, ji ber ku me nekarî têk bibin -û bi bertekîyan sivikkirin û destekkirina barên em hildigirin- cihêrengîyeke ku aîdê me ye û carna li ser me piçek giranîyê pêk tîne.

Li pêşberî rûyekî nû, bîra hiş bi vî awayî bi tevahî hildiweşe û ji hev dikeve; bi pêleke kûr û jinîşka ve ku wê hişyar dike, heta bigihe kevintirîn portreyên galerîyên wê yên demên herî dûr. Di pey re jî, hêdî hêdî weke keştîyeke ku êdî pêdivî bi romorkan tine, rûyê nû wê kombînezonên me sist bike û berê xwe bide deryayên vekirî. Ew ê îca cihê xwe bigire, ew, yê din ê têknar (nayê têkbirin), di nav okyanûsa bîra hişê me de. Ew ê bûbe bîranînek.
Freud. Wî jîyana xwe bixwe vesazkirina li dijî wî derbas kir. (2)

Ji bo **Jacques-Marie**, şagirdê berê yê koleja ***Stanislas***, lihevrasthatina *schnorrer*ê Vîyanayê, ev reng û awayê nexeyalbar, destpêkeke mutleq bû. Li pêşberî vê xerîbîya endîşedêr, wî bi awayekî azad û coşeke dînane, ji matematîkê bigire heta lenguîstîkê hemû warên fêrkarîyê yên mumkun li hev gihandibûn û qeyd kiribûn; Bi optîkê jî ku tê de modelên nû peyde dikirin, ji kêf û dilşadîyê ji ser hişê xwe diçû. Di her şemayeke xwe de, ew li hev kom dibû û xwe dikir yek. Jinûvebûyîneke ku tê de wî kêfeke mezin distand, bi pêkanîna sentezeke ku rê lê vedikir ji bo ji nû ve hilperike û pêşbînîyan bike. Senteza wextî, qonaxa -nazik, pêşîlênegir - di dema analîzeke bêdawî de. Stîla wî dîroka vê têkoşînê vedibêje. Û hevalbendên wî yên wê demê. Gelo **Freud**, tiştê ku wî der barê wan, der barê surrelîstan digot, wê der barê wî de gotibûya: *"Ew zirdîn in (em bêjin, ji sedî 95, weke alkola saf)"*?

Ji vê hevdîtina li gel **Freud**, wî bîranîneke şewatê diparast. **Vincean Gogh** rûyê xwe bi alavên agir boyax dike. **Salvador Dalî** jî di otoportreya xwe de bi rêya xwevesazkirinê nîşan dide ka *min-ez* çi ye: rû (yan) çene, guh (an), bi êşeke mezin bi çetelan li hev radigire.

Wî komên xwe, modelên xwe xebitandibûn eynî weke ku Dalî jî bi veçirandin, xemilandin, an jî tazîkirinê malzemeyên di destê xwe de bi hemû awayên mumkun nêzî hev dikirin.

Ji bo weke zindî vedîtina **Freud,** bi şêweyekî ji şêweyan lê vegerandin rewşa wî ya jenînê, mîna ku sihêrbazek saeteke ku ji zû ve rawestiyaye ji nû ve bişuxulîne, pêdivîya wî hebû ku teorîya xwe xwarovîçko bike û hin bergehên wê yên ku milahîm bûbûn, melisîbûn har bike û cinawirîya wan, hêçîtîya wan li wan vegerîne. *Faustê min, Freudê min*, an jî çawa mirov xwe ji nû ve bigihîne têgihîştineke nû ya ku tê de xweserî û cinawirîya xwe jî raxe pêş çavan.

Wî ew wisa kiribû.
Freud ji bo wî bûbû weke dermanekî coşjêwergir ê sembolîk. Xwevesazkirina li dijî wî û bi wî re yekane rêya rizgarîyê bû. Redkirina yê din ji bilî têkçûna xwevesazkirinê ne tiştekî din e. Ji ber vê têkçûnê bi xwe di 1963yê de *Weqfa Psîkanalîtîk a Navneteweyî* nekarîbû nûbûna wî bibîne û ji ber vê yekê jî wê ew ji nav xwe avêtibû der û ji xwe dûr xistibû.
Xewn, ev serhildan, tevî vê yekê her şev tîne bîra wî ku *hilperikîneke din pêkan e*.
Dema ku, ji ber hêçîtîyên wî, şagirdên wî klîşe veguherandibûn şîfreyên terîqetekê, wî dibistana xwe bi xwe ji hev xistibû û girtibû.
Ji klîşeyê bêhtir dişibe dengekî, hawarekê.
Ew diponijî. Gava wî yê bi temamî **Freud** û **Spînoza** terk bikirana, wê jî, wî jî, wî yê çavên xwe vekirî bihiştana ji bo ku, hê demeke dirêj piştî mirina wî, ew bikaribin ji bo wî awirekî hilberînin.
Hingê haya wî jê çêbû.
Şema.

Wî ew didît, nîhayet û ji bo cara pêşî. Ew li wir bû, li ber çavên wî, besît weke almastekî, û wî yê ti caran nikaribûya ew ji wan re eşkere bikira. Dan (lib) ê reelê. Serhildaneke herdemî.

* Nivîskar û et profesorê zanîngeha bijîjkîyê li fakulteya Parîs- Ouest. Berhema wî ya dawî: Di heyberekî de çi kurte-hevokeke hilweşîner heye*? Proust, Freud, Spinoza*, Gallimard, Paris, 2005.

1 Jean-Bertrand Pontalis, psîkanalîst û nivîskar, bû şagirdê Jean-Paul Sartre, dûre jî yê Jacques Lacan heta 1964ê û rahişt karûbarê afirandina Weqfa Psîkanalîtîk ya Fransayê berî ku di 1967ê de kovara la *Nouvelle revue de psychanalyse* derîne. Wî di 12ê gulana 1955ê di semînera li ser " min-ez" de cara pêşî ev pirs kiribû. *Cf.* Jacques Lacan, *Semîner, pirtûka II. Eza min a di nav teorîya Freud û nav teknîka psîkanlîzê de,* Seuil, Paris, 1977, p. 254-256


2 Li vir, bi tenê, em ê balê bikşînin ser xeyalşikestina hat serê Lacan ê ku di 1933ê de teza xwe şandibû û ji Freud yekane bersiv wergirtibû: "*Spas ji ber şandina teza we*". Lacan di kurtedemeke ku evê ha li Parîsê dimîne berî ku 1938ê derbasî Londonê bibe, hewl nade Freud bibîne.
*Cf.* Elisabeth Roudinesco, *Jacques Lacan. Gelaleyeke jîyanekê, dîroka pergaleke ramanê*, Fayard, Paris, 1993, rûpelên 88, 106, 121, 160


Wergera ji fransî: Baran Nebar

Ji Pelrecordsê 4 albûmên bijare…
Li market û platformên dîjîtal yên muzîkê!










Navnîşanên xwestinê:
Tirkîye: Pelrecords Ltd.Şti.
Katip mustafa mah. Hasnun Galip sk. no:25 a/4
Beyoglu /Istanbul
Tel: (+90) 212 243 83 97
Fax: (+90) 212 244 24 83
Ewropa: Pelrecords GmbH
Carnotstr. 4 10587 Berlin
Tel: (+49) 30 330 990 430
Fax: (+49) 30 330 990 439
Email: info@pelrecords.com
pelrecords
www.pelrecords.com

www.arsivakurdi.org

**Maurice Maeterlinck, *Berhemên bi tevahî*, 4 cild: *Jixewrabûna gîyanê*, helbest û ceribandin, *Şano 1*, *Şano 2*, *Jîyana Xwezayê*, André Versaille Editeur, Bruksel, 2010, 2600 rûpel, 139 ewro. Weşana ji alîyê Paul Gorceix ve amadekirî û pêşkêşkirî, bi tabloyên resamê sembolîst ê belçîkî Fernand Khnopff xêz û wênekirî. Bi hevweşankarîya Akademîya Şahîtîyê ya Ziman û Wêjeya Fransî ya Belçîkayê.**

***Jîyana xwezayê* li tenişt gelek tiştên din, herwiha cih dide *Jîyana Morîstankên Spî*. Eger li vir em ji *Pelléas û Mélisande* dûr bikevin jî, em di rastîyê de ji Maeterlinck venaqetin –"*li nav tarîtîya komarî ya li ser ziblê avabûyî, fedakarî mutleq e, dorgirtineke di navbera çar dîwaran de, hertişt reş e, tê perçiqandin û di bin zext û zorê de ye. Sal di nav tengetarîyan de li pey hev derbas dibin. Herkes li wir dîl e û li ber korbûnê ye. Bêhnvedan jî bi tenê bi xewa dawî mumkun e*". Her çi ceribandina *Zîrekîya kulîlkan* e, ev berhem jî berbelavkirina tozên kulîlkan weke destpêkirina rîtûelekê vedibêje. Maeterlinck *Jîyana morîstankan, Jîyana mêşên hingiv*, weke ku ew li ser jîyana mîstîk a Jan van Rusbroeck dinivîse, vedibêje: "*Dema ew dadikeve nav tiştên dişibin hev, ew bi tenê tiştên herî hesas û herî [?] nenas dest nîşan dike*".**

# Maeterlinck û şahîtîyên wî

FRANCK VENAILLE *

Maurice Maeterlinck (1862-1949) nivîskarekî mezin ê piralî ye. Ew *Jîyana mêşên hingiv*, a ku ne belgewareke li ser mêşvanîyê, lê ponijînek e li ser hevgirtina nîzama mîstîk a mirov û xwezayê. Ew bi afirandina dramaturjîyeke nû şanoyê serûbin dike –"*Gelo bi rastî jî pêwist e mirov eynî mîna Lanetkirîyan biqîre, ji bo ku Xwedayî herdem di jîyana xwe de xwe nîşan bide û ma ew ê ti caran neyê li bin bêlivîya lampeyê rûnenê?*". Weke ku **Antonin Artaud** dest nîşan dike, cara yekemîn ew *"dewlemendîya sînornenas a binhişîyê"* derbasî nav wêjeyê dike. Hêzeke xerîb dikeve nava wî, jê –û di heman demê de–boksorekî pêk tîne û me dît ku ew boksor derket pêşberî şampîyonê cîhanê yê nîv giran Georges Carpentier, û jê helbestvanekî pêk tîne û vî helbestvanî jî xwe daye fêmkirina vê dîyardeyê: *"Li cihê bûyerê ye ku mirov wisa xuya dike ku ew li ber qedandinê ye tevî ku ew muhtemelen hê nû dest pê dike"*.

Ew bi fransî dinivîse, ango bi zimanê malbata xwe, hevalên xwe û yê sinifeke civakî. Lê belê ew li Gentê –flamanîaxêv– hatiye dinê. Ew çîrokên efsanewî yên vî bajarî nas dike, ew adet, kevneşopî û helbet zimanê vî bajarî baş nas dike (tevî ku di 1921ê de ew îmze davêje bin daxuyanîya ronakbîrên belçîkî yên li dijî flamanîkirina Zanîngeha Gentê û veqetandina îdarî. Li gel vê yekê jî ev yek di 1930ê de pêk tê). Ew serdemeke ku tê de Emile Verhaeren (1) bi dengekî bilind evîna xwe ya ji bo niştiman tîne ziman.

*"Wey ! hûn, bircên dêwane, bircino!*
*Ji Nieuportê, ji Lisweghe'ê û ji Furnesê*
*Li ser bajaran û gundikên filamanan*
*Hûn girseya xwe bicih dikin*
*Bi awayekî kambax".*

Maeterlinck, li gel wî û helbestvan **Charles Van Lerberghe**, bi temamî an jî hema hema bi temamî bi xêra ronahîyê, bi xêra şideta veşartî ji zilanên vî welatî, bi xêra xwezaya hov û nexweş wê xwîşkûbiratîyekê biafirîne.

Lehengên pirtûkên wî, evên *Pelléas û Mélisande*, bo nimûne, zarok **Yniold, Arkelê** ewçend kal û nexasim mîr **Golaud** xemgînîyê temsîl dike, hemû ji alîyekî ve jî balê dikşînin ser heqîqeta girêdayî manewiyateke xweser a xwecihên bakurê Belçîkayê, ku ew ê êdî ti caran înkar neke. Lê balkêş e ku girêdana wî ya bi belçîkîbûnê ve carna dikeve ber lêpirsînê. Sûcdarî wiha ye: Bicihkirina belçîkîbûnê li cihekî ku tenê kevirên kevnare hene. Çawa dîsa jî mirov nikare bibîne, wextê em behsa *Pelléas* dikin, ku qesra Allemonde (Belçîkaya duzimanî) (dorlêgirtin) bi daristana Ardenî hatiye dorpêç kirin, tevî ku Perav weke xwe hatiye hiştin: Gelo ev jî parçeyekî hebûna bedenî û hişî ya axa qedim a flaman e? Axa ku hetahetayî bi ronahîya bêtarîf, bi ezmanên nizim û bi deryaya Bakur ve hatiye girêdan.

***Baş e divê çi ji bo xemginîyê bê kirin; ji vê nenasa ku ji pêvajoyeke bi dirêjahîya temenê çend nifşan xwe tim dike mêvan?***

Baş e divê çi ji bo xemginîyê bê kirin, ji vê nenasa ku ji pêvajoyeke bi dirêjahîya temenê çend nifşan xwe tim dike mêvan? Xemgînî her didome. Ew êdî gîyana rewşê bi xwe ye. Ew cihê xwe (yê rast) di nav livûtevgerên me, daxwaz û dilbijîna me de digire. Parêzerê ku di destpêkê de gentî bû û demeke dirêj karê parastinê bi zimanê flamanî kir, niha ketiye nav jixwepirsînekê. Ew hebûna bîranînên xwe yên zaroktîyê qebûl dike. Ew ketiye nav hewldaneke hişî ji bo vî ezmanê gewr ê bi awayekî adil xwe dirêjî ser her du civakan dike, ji nû ve biafirîne. *"Û kêf, ew ne her roj bi me re peyde dibe !"* Ev bi xwe ye nasnameya vî zilamî ya li ser pasaportê nivîsandî. Û *Serayên wî yên germ*, helbestên wî yên zelalî û xumamîyê, melodîya kefeke reş a ku li peravê bêrawestan venû dibe, didin bihîstin û di korîdorên teng ên nexweşxaneyan de beden li bin gulopeke zer û jar dinalin.

Li cem vî burjûwayê Bakurî eşkerekirî dînîtî û bêgunehî heye. Lewre, li gor wî, *"dibe ku nexweşî, xew û mirin cejnên razdar û netêgihîştbar ên bedenê bin"*. Û wiha dirêjî pê dide: *"Nehatiye gotin ku hemû kesên em li wan rast tên, divê ilehî zindî bin; hetta, mumkin e ku em gelek caran silavê li mirîyan dikin"*. An jî : *"Ez ketime destê kesên ku hê nehatine dinê"* –ango em.

***Mirov dikare têra xwe gotinên bi flamanî peyde bike, lê belê ji bo tiştê ez dixwazim bibêjim, ne flamanî heye, ne jî gotin.***

Êvarekê, di trêneke navbera Bruj û Gentê de ji nişka ve ez lê vearqilîm ku li derûdorê bêyî ku bilivin hin hespan, hemûyan bi hev re, li alîyê deryayê temaşe dikirin. Û ev yek bû keşfeke bêhempa. Ez fikirîm ku ew hêja bûn ku mirov navê cezbê li wan bike û nemaze ez fikirîm ku li tenişt alîyê wan ê prîmîtîf/heywanî herwiha alîyekî zanyarane jî hebû û ku diviya ez fêr bibim, di wan de cureyek nasîna balkêş a bi temamî ji mirovan veşartî jî hebû. Ez nizanim çi navî li vê hîsê ku bi min re peyde bûye bikim. Lê belê ez piştrast im ku têkilîya vê dîmenê bi vê ramanê re heye: Ev heyberên ji ziman bêpar herî zêde der barê vegotinê tiştan fêrî me dikin.

Maeterlinck, mirovê hişmend û haydar ji dijwarîya heqîqeta civakî, demekê, nêzî Partîya Karker a Belçîkî û ji Parîsê (û ji şanûşohretê ) ditirsiya, zilamê di navbera du zimanan de parvekirî, yek jê yê çandê û yê din jî yê ax, zindîbûnê, bi awayekî şahane ev hîs raxist ser dikê.

*"Em herin ber bi kesên herî nexweş:*
*Bêhnên herî xerîb ji wan tên*
*Di nîvê wan de, ez û diya di qada şer re derbas dibin.*
*Hevalekî şer nîvro li axê tê spartin,*
*Dema ku nobedar xwarina xwe dixwin".*

Wî herwiha tercîh kir bikeve nav cîhana binerdî ya herî bêparhiştiyan: Yên nabînin. (2) Yên ku ti caran hevûdin nedîtine, ji cîhana reel nehaydar dijîn û vê pirsa bingehîn dipirsin: *" Baş e bi van çavên xwe yên kor, me kengî, çi nas kir? –Ez bawer dikim stêrk hene; ez wan dibihîsim. Bi min wiha tê ku ez tavehîvê li ser destên xwe hîs dikim"*.

***Hişyar bin; mirov nizane heta ku derê gîyan dor mirovan digire… Ew bawer dikin ku ti tişt wê neqewime, ji ber ku wan derî girtiye û ew nizanin ku hertim tiştek di nav gîyanan de diqewime û nizanin ku cîhan li ber derîyên malan bi dawî nabe…***

Û dibe ku ev bi xêra korên **Maeterlinck** ên 1890ê ye ku mirov dikare berhemên **Paul Willems**, an jî **Henri Bauchau**, flamanên fransîaxêv ên îro bixwîne. Divê mirov piştînîvroyên gewr û bi baran li bajaran û hetta li ser bilindekên rê, li bin ezmanên deryayî û tenêtîya herî mutleq derbas kiribin. Lê belê divê mirov herwiha *Hundirîn* xwendibe, ji bo bikaribe guh bide ka Kalo çawa ji me re tiştê di nav malê de diqewime tarîf dike: *"Hişyar bin; mirov nizane heta ku derê gîyan dor mirovan digire… Ew bawer dikin ku ti tişt wê neqewime, ji ber ku wan derî girtiye û ew nizanin ku hertim tiştek di nav gîyanan de diqewime û nizanin ku cîhan li ber derîyên malan bi dawî nabe… "*

Dibe ku bêyî vê mirov nikare ji wêjeya vê xakê *hertiştî* fêm bike: Hîsa ewçend dûrbûn, ewçend nêzî manewiyata herî bi xwestek û ku li gel vê yekê jî li cihekî din e, li nav veguherîna herî bi tesîr a realîzmê bi barokîyê re, bi veguherîna şideta devkî heta bigihe îtirafên zarokên xembar, bi veguherîna jîyaneke surreel heta bigihe kêlîyên jidil. Bi vî awayî, li nav ceribandina wî ya ku ji bo mîstîkeke mezin vediqetîne, ango li nav berhemê bi navê *Ruysbroeckê Xoşevîst*, Maeterlinck flamanê ronîkirî wiha tarîf dike: Mirovê ku hem dikare ji nû ve biafirîne *"gotina nexwuyayî ya Xwedê li ber piyê ixlamûreke li serê girekî ku jê haleyek hildikişiya"*, hem jî dikare dûre, di vegera manastirê de *"bi nefsbiçûkî sebzeyên baxçeyê keşeyan"* biçîne.

Maeterlinck bi her halî berî hertiştî divê li "li cihê bûyerê" bê xwendin, eynî mina **Umberto Saba** û **Italo Svevo** li Trieste, **Cesare Pavese** li Turin an jî **Constantin Cavafy** jî divê li Îskendiriyayê bên xwendin. Ji ber ku dîmena flaman berî hertiştî gerdûneke hişî ye û xwe spartiye dîroka mêr û jinên bi goşt û hestîyên xwe ve girêdayî xwezayeke wêdetirî demê ne. Av serdest e. Rewa radibe. *"Û darûber dinalin"*. Mij, hêdî hêdî vê koma spîndaran di nav xwe de vedişêre. *"Lê belê li derve tiştê hêjayî dîtinê tuneye!* wisa dibêje, Koro. *Gelo bi rastî jî di nav tarîyên zelemat de peyv ji taqetê û hêzê dikevin?"*.

Baş e, awayek, hestyarîyek, an jî rêbazeke domandina hebûna xwe ya xweserî li van herêman heye? *"Zarok, jin û kesên li ber mirinê nobedarên Heqîqetên dixewreçûyî, Heqîqetên nexweş û Heqîqetên mirî ne"*. Meyla mirov pir mezin û nas e û dixwaze tê de cîhaneke ku mîstîsîzm û xweşxeyal xwe li hev bigirin. Ev e Cihana Maeterlinck, nivîskarê flaman ê fransîaxêv, *"Shakespearê belçîkî"*, li gor **Octave Mirbeau**, cîhana ku ji rengê esmanan pêk hatiye, mîna ya li Kortrijk (Courtrai), li Rijsel (Lille) an jî li Veurne (Furnes)…

Gelo lihevnekirin e, di navbera raman û zimanê dayikê yê xwe di berhemên wî de ji şanoyê (Jan Fabre) heta bi romanan (Hugo Claus, nivîskar–pêşbîn), xwe îfade dike? – Ji *Êşa Belçîkîyan* heta bi ceribandinan. Ango di navbera wan de pir kêm pêwendî hene. Di vê rewşê de, mirov çawa dikare li hemberî tiştên ku fêr bûye weke "dibistana belçîkî ya dijwarîyê" pêşkêş dike û "realîzma wê ya bisêhr bi tedbîr nebe?". Hadewijchê Anvers, mîstîkê "dînî" gewre yê flaman, nivîsandibû di *"Visions"*ên xwe yên ji bo alîkarîya jinên li manastirê yên li derdora xwe ya li bazara ber bi lihevkombûna li cem Xwedê: *"Mirov dikare têra xwe gotinên bi flamanî peyde bike, lê belê ji bo tiştê ez dixwazim bibêjim, ne flamanî heye, ne jî gotin"*. Dibe ku ji bo xwenêzîkkirina rasên cîhanê pêwist be mirov bêçe wêdetirî ziman, lê belê herwiha di asteke din de, bi çandekê û di nav vî warî de, Maeterlinck yek ji wan nivîskarên alîkar ên ji bo me rênîşandêr e…

* Nivîskarê *Daketina Çemê Esko*, Gallimard, Paris, 2007. Xelata Grand a helbestê ya Akademîya Fransî ji bo tevahîya berhemên wî hatiye dayîn.

1 Emile Verhaeren (1855-1916), helbestvanê flaman ê fransîaxêv *(Bajarên bi Destûling, Hemû Flandr)*

2 *Yên Kor* pîyesa duyemîn a Maeterlinck e

Wergera ji fransî: Baran Nebar

## WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ



## Muzaffer Oruçoğlu

Wênesazê vê hejmarê Muzaffer Oruçoğlu, di 18ê adara 1947ê de li gundê **Zavota Mezin** ê navçeya **Golan** a bi ser **Qersê** ji dayik bûye. Ji ber ku li gundê wî dibistana seretayî tunebû, perwerdeya xwe ya dibistana seretayîyê li dibistana gundê cîran (**Zavota Piçûk**) û li Qersê xilas kir. Li dû dibistana navîn a Qersê, ezmûna dibistana mamostetîyê ya **Rîze**yê qezenc kir, du sal şûn ve jî li Stenbolê çû dibistana Bilind a Mamostetîyê ya Çapayê. Perwerdeya xwe ya bilind li Fakulteya Fenê di beşa astronomîyê de berdewam kir.

Di 1967ê de **Îbrahim Kaypakkaya** jî di nav de **Muzaffer Oruçoğlu** tevî 9 hevalên xwe li dijî filoya şeşem a Amerîkayê belavokek belav kir. Ji ber vê çalakîyê ji dibistana mamostetîyê ya Çapayê hat bi dûr xistin. Beşdarî tevgerên 68ê ya xwendevanan bû. Di FKFê (Fikir Kulüpleri Federasyonu: *Federasyona Klûbên Ramanê*) de wek endamê Komîteya Huner û Zanîstîyê xebitî. 1969ê hat girtin, demekê di girtigeha Sîlîvrîyê de ma.

Di sala 1972yê de di nav damezrênerên TKP(M-L)yê de cîh girt. Di 1973ê de li Stenbolê hat girtin û cezayê muebbedê (bê dawî) wergirt. Di pêvajoya jîyana girtîgehê de rojên xwe bi nivîsandina roman û helbestan derbas kir. 13 sal di girtigehê de ma, li dû serbestberdana ji girtigehê Oruçoğlu birin eskerîyê. 40 roj bi şûn de ji leşkerîyê revîya çû Yewnenistanê, ji wir jî çû Fransayê û bû penaber. Ji nû ve dest bi nivîsandina romanan û wênesazîyê kir. Di kovarên polîtîk û wêjeyî de gotarên wî hatin weşandin.

Oruçoğlu sala1988ê zewicî û li Avustralyayê bi cîh bû. Li vê parzemînê berê li koleja wênesazî û peykerê (Greensborough TAFE COLLEGE-NMIT) ya 2 salan, dûre jî li beşa PUBLIC ART a Enstîtuya Teknolojî ya Royal Melbourne(RMIT) ê perwerdeya wênesazî û peykerê kir. Heta niha li 6 welatan zêdeyî 40 pêşangehên şexsî vekirine.

13 ji wan roman, 7 çîrok, bi tevayî li ser mijarên cûr bi cûr 30 pirtûkên wî hatine çap kirin. Di 2011ê de bi romana xwe ya 4 cildî **Grizu**, xelata **Abdullah Baştürk** a karker û edebiyatê wergirt. Oruçoğlu li Avustralyayê dijî.

Di derheqê Oruçoğlu de ji bo agahdarîyên zêde li malpera www.muzafferorucoglu.com binêrin.

www.arsivakurdi.org

Sergueï Eisenstein, di fîlmê xwe yê bi navê "Cengkeştîya Potemkîn" de berê kamerayê dide ser sehneya binavûdeng a komkujîya sîvîlên li ser pêlpêloka abîdeyî ji alîyê eskerên Çar ve tên gulebaran kirin. Li Rojava, em ji xweşxeyal û cezba taybet a Odessayê kêmtir haydar in; lîmana mezin a Deryaya Reş, navenda bilivûtevger a bazirganî û petrolê ya Ukraynayê. Irena Wiszniewska, çîrokvebêj û afirînera lîstika şer a îdeal ji bo hûrkolana li ser gîyanê kesan û gelan di vî warî de bi ser neket…

## HEVDÎTINÊN LI KEVÎYA DERYAYA REŞ

# Odessa yan jî cazîbeya nedîyarîyê

IRENA WISZNIEWSKA *

Odessayîyên ku li ser Bulvara Perava deryayê randevûyê didin hev, hertim dîyar dikin ka li alîyê Pûşkîn an li alîyê "Duk" e. Kesek xwe naêşîne ku vebêje bê dukê navbihurî kî ye. Jixwe ji yekî pê ve kesekî din tuneye: **Armand du Plessis de Richelieu**, walîyê bajêrê ji 1798ê heta 1811ê, ku peykerê wî li navsera pêlikên binavûdeng ên Potemkînê ye. Odessa gelekî deyndarê wî ye –plana yekê ya bajêr, lampeyên kolanan, riyên bi parçeyên lavên Vezuvê resîfkirî, bi akasyayên spî yên Italyayê xemilandî... Lê, berî hertiştî, ew deyndarê wî ye ji bo karakterê xwe yê navneteweyî, ji ber ku wî bi hezaran ewropî anîn wê derê. îtalyanîyan piranîya avayîyên wê çêkirin, xebatên kêzînan / kanalîzasîyonan ji alî îngilîzân ve pêk hatin; belçîkî beşdarî avakirina şebekeya tramwayê bûn; bêyî awistiryayîyan dê Opera çênebûya û keştî berî herkesî ya armatorên yewnanî bûn.

Îro, keç û xortên nûzewicî li ber piyê peykerê *Richelieu*yê "xwe" wêneyên xwe digrin, ji ber ku ew ê ji wan re bextewerîyê bîne. Ew bûye cûre bapîrekî, ku mirov belbî wî rojane îhmal dike, lê hebûna wî mirov piştrast dike.

Maweyê deh rojan, min silav da Dukê li ser riya ber bi sekoya xwe ya li Bulvara Peravê: Li alîyê çepê ber bi peykerê Pûşkînî ve di kolana duyê de ye. Li ser vê sekoyê, li kêleka lewha nivîsa min a bi rûsî *"Ez ê ji te re çîrokekê bibêjim, bêpere, ku di hemî jîyana xwe de tu yê her wê bi bîr bînî"* ez jî li hêvîya minêkaran im. Ba carinan pir bişid dihat, xortikên nûgîhaştî bi beza bayê li ser patenên bitematîk dişemitîn û derbas dibûn, zilamekî bicilên kaptanan han dida ku helbesta xwe bifiroşe. Kesê yekê yê ku bi pêşnîyaza min dilşad bû kî bû? Êdî nayê bîra min. Lê herçi **Borîs** e baş tê bîra min, yekî salên wî li dor sîhê, ku birçîyê çîrokan bû, havalên xwe mecbûr kirin ku li benda wî bin.

– *Ji min re peyvekê bibêje, yeke bi tenê,* min jê re got.
Berî ku bersivê bide saniyeyekê jî dudilî nekir:
– *Keştîya "bixêlî".*

Berî ku ez li ser Bulvara Deryayê bicîh bibim, ez li temamê Odessayê gerîyam, ku ji xwe re cîhekî baş bibînim. Diviya ku şên û di heman demê de jî ketina hundirê wî hêsan bûya. Weke li Antananarivo, li Madagaskar û li Polonyayê elimîbûm, min cihê bazarê hilbijart, ji ber ku li ber çavên min li wir vejen tevdigerin.

Bi vê bîr û bawerîyê, du rojan, ez bi ser bazara herî girîng a dîrokî ya Odessayê vebûm: Bazara Privoz ("hatin"), li wê derê, li dora 1828ê, bazirgan hînî valakirina barê xwe bûne. Dora wê bi dîwarên di nav wan de maseyên kevirî bicîhkirî û sîstema kevnar a valakirina avê tê de pêçayî, tevî lehîya berhemên çînî yên ku mirov nikaribû ji wan birevîya, wê hewa dema berê parastibû. Pîrejinekê, qazaxekî jihevketî bi ser kirasekî bermalê de bi xwe da kirî, çivîkek li ser milê wê, li falê dinêrî. Yeke din pesnê kalîteya penîrê ter ê ku wê bi destê xwe parzinî bû, dida. Serxweşekî di nav refên cilan de wendabûyî, toza li dijî kêzikên navmalê dida her kesê ku di wir re derbas dibû. Li Privozê, li nav bajêr bêtir mirov sîmayên bîyanî dibîne: Ozbekan ava hinaran xistibûn bin destê xwe û pê kêfa xwe dikirin, jinên asyayî jî di warê çêkirina xwarinên sivik de bûbûn bispor –xwarinên wan pir bitam bûn! Şeraba reş a Odessayê ya binavûdeng, bidohn û tarî, rasterast di şkevkan de tê firotin. Û masî... yên hişkkirî, dûdayî, xwêkirî... Çetilxêra ku mirov di cîh de bimezêxe –cûreyekî masîwirg ê pir hindik xwêkirî ku mirov bi xavî dixwe.


GÉRALD ASSOULINE: **Odessa, ji rêzeweşana** "Entre deux rives-navbera du kevîyan", 2008

Vê bazara ewçend zindî, ku min ewinde girîngî dayê, dîsa jî wê ez qebûl nekirim. Ez li nav beşê sebzeyan bi cîh bûm, maweyê du saetan, ez matmayî mam ku yên dibuhirin berê xwe ji min diguherin. Di dawîyê de min lavelav kir, min pankarta xwe vekir û bi bergeran min got: *"Çîrokek?", "belaş!", "ji kerema xwe re!"* Di encamê de dilê kartolfiroşekê bi min şewitî. Svieta peyva "keça ciwan" hilbijart û bi saya wê jî çîrokek kar kir ku, bi rastî jî, ew zêde bilind nedifirîya. *"Li vir, xelk bi tenê li bihayê tiştan difikire,* dilbirehmê dilê min xweş kir. *Gava ku pereyên te tunebin, kirîna mêl dibe pirsgirêk. Biçe li nav bajêr biceribîne: Li wir, mirov dê guhdarîya te bikin, tu yê bibînî."*

Ez di nav troleybusê de pişkîyam.
– *Her bijî!,* zilamekî got. *Ez dizanim nexweşîya we çi ye: Ev alerjîya tavê ye. Ez jî heman derdî dikşînim."*

Ji ber gelek sedeman mirov dikarî tê derxe ku ev henekek bû, yek ji wan sedeman jî barana ku dibarî bû. Mêrikê troleybusê li kolanê xwe nêzîkî min kir, ez, bîyanîyek im û dixwaze bi min re henekan bike. Li Odessayê, ev yek ne bûyereke seyr e, ji ber ku gotûbêj pirseke giştî ye. Bi tenê bi serinc nêrîn têrê dike ji bo mirov bibîne ku kolan sehneyek e. Jinikek kûçikekî şîwawa di bin milê wê de bi lez diçe kuafor. Masîvanan li dora bufeyeke kambax li derve kom bûbûn, hevdîtina xwe pîroz dikirin, bavekî keça xwe hînî meşa li ser piyên canbazan dikir, xortan li ser sekoyên giştî weke ku Brassens nas bikin, hêdîka hev maçî dikirin... Jîyana rojane weke straneke xwezayî bikêf û şayî xwiya dike. Avayîyên bi stîla husmanî hewşên pir kêm klasîk –di nav kaosê de– vedişartin. Lê ev kaoseke avaker bû. Bexçeyê wî xweş bû û palkursîyên kevin lê kom bûbûn. Mêw bi darên biçûk ên di ber wan de çikandî radipelikin, cil û bergên ji bo ziwakirinê raxistî li ber tavê direqisin. Navenda bajêr ji pisîkan re maye. Ew bi qandî ordîyekê ne, weke xirnosekan in û xwe li mirov dihebilînin. Ji ber ku avayî çar qatan derbas nakin, pisîkên kedî herwiha jî li kolanan dijîn, lê mafê hemcinsên wan ên sikakan jî heye ku xwe bielimînin şaneşînan. Sînorê di navbera yê kedîbûyî û yên kovî de ne dîyar e.

Di encamê de ez tê digihêm ku odessayîbûn çi ye û ne çi ye. Efsaneya avaker, piştî avakirina bajêr bi şeş salan, li dora bûyereke ku di 1800ê de bûye, pêk hatiye. Piştî mirina **Katerînaya Mezin**, odessayî, ji alîkarîya wê bêpar man; ji bo avakirina bendergehê fonên pêdivî neman. Çarê nû, Paulê Iê, biryarê dide ku esera diya xwe wêran bike, lê zeafên wî jî hebûn. Odessayîyên ku tê gihîştin ew ji porteqalan hez dike, gişt kom dibin û jê re tirimbêleke bi sê hezar meyweyên wî yên ji wan hez dike dagirtî, dişînin û misoger dikin ku gava bendergeh ava bibe, dê şandina mal hîn rêkûpêktir bibe û ku çar wê tu caran bê fekî nemîne. Nûnerên wî bi pereyekî baş bi 250 000 rûbleyên zêrîn tên, ku ev jî derfeta ji nû ve dest bi xebata avakirina bendergehê dide. Odessayîyên bi qûrnazîya xwe serbilind, zorê didin xwe ku ji bo bîranîna wê yekê, abîdeyekê ava bikin ku bi kêfxweşî navê "bîranîna bexşîşê" lê kirin. Ew wê ji erebeyeke mîrî ya grover weke porteqalekê, ku ji alî du hespên didin çargavan ve tê kişandin, pêk tînin.

Efsaneya avaker li ser bawerîya ku li şûna rikeberîkirina li dijî desthilatê, mirov qurnaz be baştir e, hatiye ava kirin. Ev siyaset bûye sedemê ku mirovên li ser desthilatê bawerîya xwe bi odessayîyan neanîne. Weke nimûne, Aleksandrê Iê, ji ber ku dizan, muxbîran û mêjîyên xirabker dikşîne bajêr rexne dike. Ji alîyê mîmarîya xwe ve, bajar çi bigire saxlem maye. Ji felaketa realîzma sosyalîst a bi heybet rizgar bû. Navê pêxwasên jiheqderketî bi pey odessayîyan ketiye û vî navî bi kêfxweşî diparêzin. Di yek ji romanên Ilf û Petrov de, qehremanê wan Ostap Bender, sextekarekî zimanxweş, cûre Mariusekî Odessayî ye, ewqasî li sosîsan difikire ku kuçik didin dû wî. Izaak Babel bixwe jî, taxên hejar ên cihûyan bi hesasîyet û bi henek rave dike û rewşa heyî weke dawîya dinyayê nîşan dide.

Hestê odessayîbûnê li gor her nifşekî diguhere. Îro, tevî ku Odessa bajarekî Ukraynayê ye jî, ew xwe bi awayekî giştî weke serbajarekî rûsî dibîne. Nataşaya jeolog û akademîsyen, vê yekê bi vê hevokê vedibêje: *"Ez hez nakim biçim Moskovayê, ji ber mirov bawer dike ku heke mirov tiştekî bêje, mana xwe ew wiha difikire".* Nataşa mafê xwe yê henekpêkirinê, tandanê, qeşmerîpêkirin û mezinkirinê bi kar tîne û bi cidîyeta moskovayîyê ku ew weke acizker û piçûk dinirxîne, miqayese dike.

Li bajarekî ku kolan şûna sahnê bigire, dê cî ji bo çîrokbêjeke weke min li her derê hebe, helbet bi tenê Privoza bi dîwaran pêçayî û berevajîya bajarê mayî, di bin bandora hisab û kitaban de mayî ne tê de. Li ser sekoya min a li kolana duyê ya li çepê ji alîyê Pûşkînî ve, li gor peyvên "keştîya bixêlî", "zerya", "vova", "seyranek", "agir", "pisîk", "koleksîyonkarek"... min nêzîkî sîh çîrokan vegotin. Min nexasim çîrokên ku li gor peyva "evîn" li hev anîn gotin, lewra çar keçikan ev peyv hilbijartibû. Ev çirûpirîya daxwazê Madagaskar dianî bîra min, ku lê, ji alîyê din ve, pêdivîya heskirinê bi zilaman re jî hebû. Balkêş e, li Polonyayê, peyva "evîn"ê carekê jî derbas nebû. Çima gelo? Dibe ku li welatên girêdayî mezêxerîyê ne, ravekirina rastarast a hîsan dibe weke tabûyekê. Odessayî, her weke madagaskarîyan û polonîyan, sedemên teşebusa min û kara ku ez ê jê bikim, dipirsin. *"Ji bo tiştekî nakim,* ez ji wan re dibêjim. *Di vê dinyaya ku mirov her ji bo pêkarî û berjewendîyê tev digere de, divê carinan tiştekî bê armanceke dîyarkirî jî bike".* Odessayî, bi nisbet polonîyan xwiya ye li hember vê yekê kêm şaş dibin, weke ew bi fikra jesteke belaşî û kêfxweşîyê baştir bizanibin.

Hinek li bal min, weke Borîsê peyva "keştîya bixêlî" hilbijart ji ber ku ew dixwaze girêbendên xwe firehtir bike, li piştrastkirina plana xwe digerin. Ew min weke cûre remildareke ku wê evîn û bextewerîyê misoger bike, dibînin. Ew li hêvîyê ne ku çîroka min dilê wan hênik bike, tên bi min dişêwirin, kulîlkan dîyarî min dikin… Qet şik tê tuneye, odessayî dizanin ji cazîbeya nedîyar hez bikin. Heta wê radeya ku ew min vedixwînin dibistana 121ê, da ku beşdarî dersên zimanê rûsî yên hunera vegotinê bibim. Le ev jî çîrokeke din e...

* Rojnamevan, niviskara *Paroles dégelées / Peyvên nivîskî yên stranan* (bi Marek Wyrwa re), Calmann-Lévy, Paris, 1994

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

PERGALA GLOBAL Û HUNER

# Sermîyanê gerdûnî yê hunerî û kurd

HASAN HÜSEYIN DEVECI *

Di cîhanê de, ku dibe gerdûnî, hevkêşîyên hêzan pir bi lez tên guhertin. Guhertin û veguherînên weha tên jîyin, ku di warê siyasî, aborî, civakî û çandî de bandora xwe li ser hemû gelên cîhanê dike û ev yek her roj li ber çavên me rû dide. Di nav vê guherîn û veguherînê de jî têgiha gerdûnîbûnê di warê huner û çandê de jî cihê xwe nîşan dide.

Li gor vê yekê:

-Gerdûnîbûn û sermîyanê gerdûnî ya hunerî

-Li Tirkîyeyê sermîyanê hunerî û kurd

Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA), ku yek ji hêzên herî mezin yên pergala cîhana gerdûnî ye, nemaze piştî êrişên 11ê îlonê hewlê dide ku li gor berjewendîyên xwe teşe bide konsepta cihana gerdûnî û vê yekê li ser cîhanê ferz dike. Ew herweha bi piştgirîya welatên Yekîtîya Ewropî jî dixwaze bibe lehenga cîhanê. Desthilatdar niha, ji salên şerê sar bêhtir bi baldarî û bi îtîna û heta bi fenekî bêyî ku hêzek, ku jê bitirsin hebe, konseptên xwe disepînin. Piştî serdema şerê sar, bi gerdûnîbûnê re ji alîyê hêzên herî mezin yên cîhanê ve ne bi tenê di qadên aborî û yên din de, lê herweha di warên çandî de jî wekî encama çavnebarîya emperyalîst şerekî navbera çandan hate dest pê kirin. Dema ku em bi kurtasî li vê pergala cîhana gerdûnî, ku nû teşe stendiye, binihêrin tiştê ku em bibînin ev e: Hunera nûjen a cîhanê bi lez û bez pêş dike û diguhere. Desthilatdarên gerdûnî, ku bi îdealên wekî hunera navneteweyî, pirçandî, aştî û hwd. ketine rê, di warê parvekirina sermîyanê çandî de jî bi azîne û navgînên nû, ku berê bi rêya hunerê nehatibûn ceribandin, bûne hakimên pîyaseyê. Ev pêvajoya nû, ku bi pêşengîya DYA û welatên Yekîtîya Ewropî pêş dikeve, li welatên din jî wekî modêl tê girtin û bi lez ew jî derbasî vê pêvajoyê dibin.

Bi gerdûnîbûnê re li cîhanê cure û domdarîya berhemên hunerî ku pir û pircure dibin, ketin jêr nîrê sermîyandarên hunerî yên dilbijok. Ev hêz ku di warên perwerdehî, siyaset û aborîyê de gihiştine merheleyên herî bilind, ji ber ku ji wan neteweyan pêk tên ku xwedî rabihurîyeke herêmî-resen û qedîm nînin û tevlihev in, koçber in, li cem wan valahî û birçîbûneke mezin heye. Parvekirina sermîyanê navbera çandan, ku em navê şerê navbera çandan lê dikin, digel post-modernîzmê wekî qada civakî û çandî di qada hunerî de piştgirîya herî mezin dide gerdûnîbûnê. Têgiha hunera post-modern piştî serdema şerê sar pêş ket û di qadên mîmarî, felsefe û gelek beşên hunerî de êdî gelek caran tê bi kar anîn. Têgiha hunera post-modern, ku di warê derbasbûna ji pergala kevin ber bi pergala nû de, ku nû tê ava kirin, risteke temamker dilîze û di warê hunerî de dibe xwedî cihekî girîng. Ev têgih herweha piştgirîya desthilatdaran jî werdigre; ketiye bin nîrê wan û bûye ekolek, ku tê pêş ve birin.

Di pergala cîhana gerdûnî de tevî ku qala aştî û pirçandîbûnê tê kirin jî, li seranserî cîhanê modeya hunereke bi şêwaza amerîkî û ewropî dest pê kiriye. Herêmîbûn û otantîkbûn naçar dimînin ku cihê xwe pir bi lez ji sermîyana hunerî ya cîhana gerdûnî re bihêlin. Hin berhevkar û galerîstên amerîkî û ewropî, ji ser *aborîjînan* (aboriginal) hunerê çawa veguherînin sermîyanê. Ev yek mînakeke berbiçav e. Pêşangehsaz, yan galerîstê li herêma *Gallera Başûr a Nû* (New South Wales- Awistralya) bi sazgeheke civakî re peymanê girê didin û berhem û tabloyên herêmî yên *aborîjînekî* kal, dikirin. Ji bo wê tabloyê 50 dolaran didin, lê di galerîyekê li bajarekî Amerîka, yan jî Ewropayê de bi 50 hezar dolaran difiroşin. Dema ku ew weha dikin mebesta xwe ya rastî, an ku hêla sermîyanê bi hostetî vedişêrin. Hêla pirçandî û trans-çandî û parastin û piştgirî dayîna nirxan, ku bi çavê mirovan xweş tê, derdixin pêş û bi vî awayî hunerê îstîsmar dikin. Sermîyandarên hunerê di pergala gerdûnî de ji cîheta hilberîn û afirinêrîya hunerê dîyar dikin. Ew, hunerê ji asta wê ya çalakî û civakî derdixin û dikin berhemeke di bin nîrê sermîyan de.

Bi vî awayî hunera vê pergala cîhana gerdûnî, ku xwedî bingeheke îdeolojîk e û sermîyanê wê ji xwe re hunermend û hunerhezên xwe jî afirandine. Huner jî ji bêgavîyê bi awayekî lez li gor fikarên aborî tê afirandin. Berhemên hunerî yên cîhana nûjen vediguherîne pêşbirka dewlemendbûna sermîyandarên çandî û lewra bûye qada mulkiyeta çîneke dîyakirî ya civakê. Ji ber vê helwêsta cîhana sermîyan û mulkiyetê ya li hember hunerê, helwêsta huner û hunermendan a li hember cîhan, jîngeh û civaka ku ew jê tên, aşkere dibin.

Li Tirkîyeyê jî rewş weha ye, modêla amerîkî-ewropî li wê derê jî hatiye pejirandin. Herçend vê binavkirinê tercîh nakin jî, ji ber têkilîya wan a nêz a digel mijarên *"Kurdên Spî"*, li vê derê peyda dibe. Bi rastî gotina *"Kurdên Spî"* sentezeke berfireh e. Dikare di nav xwe de li gor mijar û qadên cuda jî were nirxandin. Di warê parvekirina qada çandî de Tirkîye rista xwe di warê çandî de bi ser kurdên spî re xweş dilîze. Herçend her tiştê ku têkilîya wî bi kurdîtîyê hebe li Tirkîyeyê tê qedexe kirin jî, hunermendekî/e kurd û hunera wî/wê (ku li Tirkîyeyê yan qedexe ye, yan jî bi şik û guman lê tê nihertin) di bazara derveyî welêt de wekî hunermendekî tirk û hunera tirk tê firotin. Ji vê rewşê him sermîyandarên hunerî û him jî hunermendê pîyasayê, ku hewlê dide ku navê xwe bide bihîstin, razî ne. Di wî warî de stratejîya çandî ya Tirkîyeyê, ku modêla amerîkî û rojavayî ji xwe re dike modêl, stratejîyeke zirav e. Bi çavên xwe dibînin ka hunermendên kurd ên ciwan, ku ez navê *"zarokên super ên kurdan"* li wan dikim, çawa dikevin tora sermîyandarên hunerî û wekî min gotî dibin *kurdên spî*.

Di cîhana gerdûnî de projeya Tirkîyeyê ya navbera çandan her ku diçe mezintir dibe û li Tirkîyeyê yek netewe, yek dewlet, yek huner aşkere tê dîtin. Di vê projeyê de ne bi tenê hunermendên kurd tên kedî kirin, lê herweha hunermendên çepgir, an ku ew kesên ku dixwazin heqê hunerê bidin, tên tasfîye kirin. Herçend hunera wan gelek hêzdar be jî ew hunermend nikarin bikevin pîyasayê û li derve tên hiştin, tenêmayîn dibe qedera wan. Da ku hunermendek baş bikaribe bikeve vê pîyasayê, divê li pişt wî têkilîyên baş ên sîyasî, sertewandina li ber cema'atekê û helwêsteke nêz a îqtîdarê hebe, yan ne guncan e ku ew bikeve pîyasayê. Hevdem, hunermendên pîyasayê, ku ne xwedî resenîyek, tecrûbeyeke kûr in û hunera wan kopya ye û tije dekorasyon e, bi piştgirîya sermîyandarên hunerî û bi dîrektîfên wan, ew di pîyaseya huner a Stenbolê de peyda dibin.

Di çarçoveya hunera gerdûnî de, heger berhemên çandî û hunerî rastîya xwe ya civakî di nav xwe de nehewîne û bi awayekî paralel pê re nemeşe, piştgirî nede wê, xema jîngehê nexwe, wê demê em dikarin qala kêmasîyeke hunerî bikin. Ji destpêka dîrokê heta roja me ya îroyîn huner hertim xwedî helwêsteke çalakbûnê bûye. Hunerek ku alîyên wê yên lidijrabûn, rexnegîrî û berpirsiarîyê nebe, dikare bi tenê birçîbûna estetîk a sermîyandar û îqtîdaran têr bike û bersiva pêdivîyên wan bide.

Bi gerdûnîbûnê re hunermend dikare resen bimîne, ji rastîyên civakî veneqete û hunera xwe bigihîne girseyan. Ji bo wê jî divê hunermend derfetên zanistî yên hunerê, teknîkên hunerî, azîne, alav û navgînên wê baş bizanibe û xwe di vî warî de bi pêş xe. Sermîyandarên hunerê herçend ji bo fikarên xwe yên bazirganî têgihên wekî pirçandî, transçandî û navçandî bi kar bînin jî platformên xweser ên hunerî û hunermendên xweser dikarin ji vê yekê sûdê werbigirin. Di van salên dawîyê de di vî warî de xebat û pêşveçûn hene. Însîyatîfên hevbeş û hunermendên alternatîf, bi rêya çalakîyên navneteweyî yên hunerî, bîenal û fûarên hunerî dikarin li hember sermîyandarên hunerî tora xwe damezirînin.

Di vî warî de, pêdivî ji her demê bêhtir bi hunermendên kurd heye ku xwedî helwêsteke hêzdar, bi nirxên xwe yên civakî ve dilsoz in û tiştên resen diafirînin.

* Pedagogê Hunerî / Wênesaz / Di KIK (Kölner Institut für Kulturarbeit und Weiterbildung) de perwerdekar.

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya




www.arsivakurd.org

# ÇAND Û HUNER

## 'Wênesazekî kurd ku tabloyên Da Vinci tîne bîra mirov': Şikak Mareskê

# "Dixwazim roj neçe ava da ku wêneyê xwe biafirînim"

AZAD ŞATEHÎ *



**Şikak Mareskê** bi Ernest Gombrich re

***"Wêneyên te nîşanek di ser ya şîyana te ya hunerî re ye, ku mirov jê bawer nake. Gava ku ez ji te re dibêjim hin ji wan lêkolînên li ser xwezayê yên Leonardo da Vinci tînin bîra min, vê yekê weke pesnekî ji rêzê nebîne. Ez jidil bawer dikim, di demeke ku huner tê de bi dawî tê, li Îspanyayeke dûr doktorekî kurd rûmet û mezinahîya wî bilind dike. (...) hunerê orijînal dê hertim heyranên xwe bibîne."***

***Sir Ernest Gombrich***

Hunermend Şikak (Schkak) li gundê Mareskê yê Efrînê, di 1947ê de ji diya xwe bûye. Navê wî yê rastî **Farûq Tobal** e û pêşîyên wî ji eşîra şikakan in. Wî xwendina xwe ya seretayî li Efrînê û ya navîn jî li Helebê kiriye. Hewesa wî ji biçûkanî li wêneçêkirinê hebûye û ji bo wê jî li gel xwendina xwe ya navîn dersên hunerî ji Akademîya Hunerên Ciwan wergirtine. Ew ji bo xwendina xwe diçe Îspanyayê, li Madrîdê bi cîh dibe û xwendina xwe ya bilind li wir kuta dike. Wî ji bo xatirê bavê xwe xwendina xwe di warê tibê de kiriye û li gel karê xwe yê bijîşkîyê, li La Manchayê, bi salan xebata xwe ya hunerî jî domandiye. Ew li gel kurdî, zimanên erebî, spanî, fransî, almanî û ingilîzî jî dizane, lê kurdîya xwerû diparêze. Şikak, hin karên xwe bi kilsê çêkirine û hin jî bi boyaxa rûnî li ser caw çêkirine. Di tabloyên wî de gelek kitekit ên weke toza li ser xoxan, xetên hûr ên li ser qawin û hûrikên nan hene. Karên wî ji pêncî tabloyan bêtir in û yekemîn pêşangeya xwe ya taybetî li **Enstîtuya Kurdî ya Parîsê** pêk tîne, ku di 14ê adarê de vebû û dê heta 31ê wê ji bîneran re vekirî be. Bi minasebeta vekirina pêşangeya wî, me çend pirs jê pirsîn û wî jî wiha bersiva pirsên me da:

***Hewesa te ji bo wêne çêkirinê çawa dest pê kir?***

**Şikak Mareskê:** Min çavên xwe li dinyayê vekirin venekirin, min dît ku dinya cîyekî pir şîrîn e. Min xwest ku ez jî ji vê şîrînayî, xweşî û bedewîyê şadetîyekê li pey xwe ji ebediyetê re bihêlim. Berî fêrî nivîsandin û xwendinê bibim, min bi qelema reş dest bi wêneçêkirinê kir; min ezman, dar û ber û dîwarên Mareskê nîgar kirin. Metika min, çavê min li ciwanî, rindî û bedewîya dinyayê vekir. Ez dikarim bêjim ku bi saya wê min dest bi wêneçêkirinê kir. Wê rêberîya min a hunerî kir.

***Tu dibêjî ku gundê min xizneya min a hunerî ye û ji bo karên ku min kirine ez deyndarê gundê xwe me. Tu deyndarê gundê xwe û çi yî?***

Gundê ku ez lê çêbûme, Mareskê, ji sala 1842yê de ye ku yê malbata min e. Cîyekî pir xweş e, zozan, dar û ber, ba, baran, ewr û berfa Mareskê ji bo min tiştekî din e. Merîyên me, ezab, xêr û xweşîyên wan, dar û ber, pez û dewarên wan, ango jîyana wan dinyayek cihê, şabûn û şênayîyek bitenê, bêhempa bû. Ez sipasîya Xwedê dikim ku ez di şênayî û şaristanîyeke wiha de anîm dinyayê.

***Tu bahsa welatê xwe, weke cîyekî pir xweş û zindî dikî, çima karên te hemî naturmort in û ew ciwanî û zindîtîya wî di wan de kêm in?***

Ji ber ku rengên ku ez bi kar tînim ne rengên cîyê (Îspanya) ku ez niha lê dijîm, rengên welatê zaroktî û ciwanîya min in. Qawinên ku ez çê dikim, hûn nikarin ne li Îspanya û ne jî li tu welatekî din ê Ewrropayê bibînin. Hemî resmên ku ez çêdikim, haya min jê hebe, yan tunebe tiştên berê tînin bîra min û bîna min bi wan derdikeve. Min gulên kevin ên gelek welatên Ewropayê xwestin, ez li wan gerîyam, min ew peyde kirin û li nav erdê xwe, li hewşa xwe çandin, lê min tu tiştek weke gulên nav rezê me, xweşik û bi bîn nedît. Ji bo wê jî ez tim li dîroka zaroktîya xwe dikolim, lê digerim û besta ku ji wir digrim xweşikbûneke din dide hunerê min.

***Te got ku rismên tu çêdikî, bêyî ku haya te jê hebe bîhna te pê derdikeve. Çawa dibe ku bîhna mirovî bi kevok û kîroşkên mirî derdikeve?***

Zanibe, min tirî û hejîrên gundê Mareskê û gundê Elkê yê zaroktîya xwe anîn li nav erdê xwe li Îspanyayê çandin û bi salan e, ez ji wan tirî dixwim û wêneyê wan çê dikim. Ma tiştekî din heye ku bi qandî tirîyê Mareskê û Elkê ruh tê de hebe? Heke ez bimirim û vî tirîyî bidin min ez ê dîsa pê zindî bibim.

***Çima bi awayekî giştî kevok û kêrguyên kuştî, pîvaz û garisên hişk ango nezindî û neşîn çêdikî? Rengên ku tu bi kar tînî mat û sar in, ne germ û brûsandî ne?***

Kêrgû û kevokên kuştî mijareke klasîk û kevin e di tarîxa huner de, ne tiştekî ku min bi xwe derxistiye holê. Ev stîlek e, awayekî wênegirîyê ye ku bandora wê di hunerê min de jî dîyar dibe.



**Simbilên garisî (lazût)**, zeyt li ser kitanê, 52x 36 cm



**Hêk û amûrên metbexê**, zeyt li ser kitanê, 72x48 cm

***Te xwendina xwe di warê bijîşkîyê (tibê) de kiriye û tu dibêjî ku tu debara xwe ji doktorîyê dikî. Te çawa wext dît ku bi ber van karan hemîyan re van wêneyên wiha rind û xweşik jî çêbikî?***

Mirov nikare saetê bi şûn de bide, ez tewer ne derdikevim û ne jî wextê xwe bi xewê û bi xwarinê derbas dikim. Firçê dikim destê xwe, bi destekî wêneyên xwe çêdikim û destê xwe yê din jî didim ber rojê û li ber Xwedê digerim ku roj neçe ava da ku ez jî bikaribim karên xwe bi ser xim.

***Baş e, ji bo te têkilîya wêne û doktorîyê çi ye gelo?***

Têkilîya di navbera doktorîyê û wêne de, ji bo min ew e ku ez doktorê wêneyên xwe me. Ez doktorîyê ji bo bikaribim wêneyên xwe çêkim, dikim.

***Him doktorî û him jî hunerê wêne bi hev re ji bo te ne giran e, karê doktorîyê rê li ber xebata te ya hunerî nagire gelo?***

Mixabin wiha ye, rast e! Xwezya kesekî karibûna rola doktorîyê ku ji bo min weke patronîya karê min ê huneri ye, ji dest min bigirta û barê min sivik bikira. Wê gavê min ê jî karibûna bêtir rola xwe ya hunermendîyê bilîsta û bêtir berhem bida. Bi rastî jî ez dixwazim xwe jidilûcan bidim karê wêneçêkirinê ku ez bawer dikim Xwedê ez ji vî karî re dame. Heke derfeteke wiha ji min re çê bibe, ez jidil bawer dikim ku wê çaxê dê derîyekî fireh ji huner û ji navê kurdan re jî vebe.

***Rexnegirê hunerî Ernest Gombrich karên te yên natur bi yên Leonardo da Vinci re dide ber hev, tu ji vê yekê re çi dibêjî?***

Gombrich zanayekî mezin bû, wî şaşîyên hevkarên xwe yên herî mezin yên wekî **Winckelmann**, **Hegel**, **Arnold Hauser** û **Panowski** rast kirin; îcar dê çawa bi min re xwe şaş bikira? Ez ne hunermendek im ku debara xwe bi hunerê xwe dike, ne jî di warê hunerî de nav û dengê min heye. Ez ne li Îtalya û ne jî li Holandayê hatime dinê, wekî **Michelangelo** û **Rembrandt**; ez, wek **Gombrich** jî dinivîsîne, "Doktorekî kurd li Îspanyayê dûr" im û disa weke wî nivîsandiye, ez "rûmet û mezinahîya ji hunerê re dikim".

* Rojnamevan



**Zebeş**, zeyt li ser kitanê, 56x35 cm

# Awirek li ser şanoya kurdî

**Jîyan bi kurdî xweş e!**

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Tevahîya bisporên şanoyê, dîyar dikin ku şano ango tîyatro ji şahîyên ***Dionisos***ê derketiye. Di serdema kevnar de gorî û pêşkêşî ji bo ***Dionisos***ê Xwedavenda Şerabê dihatin kirin û şahî dihatin organîze kirin. Ji ber vê yekê jî heman şareza û bispor radigihînin ku trajedyayên yekem, nivîskarên destpêkê yên şanoya dramatîk ji Yewnana Antîk derketine.

Helbet rîtûel di wan serdemên kevnare de jî girîng bûne û bûne bingeha şanogerîya roja me ya îroyîn. Heman rîtûel, bi qasî ku ji gelên din re girîng bûne, ji bo kurdan jî wisa bûne/hê jî wisa ne. Di rîtûel, cejn, destan, çîrok, kilam, lawje û serpêhatîyên kurdan de em rastî dîyarde û nîşaneyên teatral tên. ***Qirdik û Mirdik, Dêwê Heftserî, Xoce Xizir, Bûka Baranê, Girnewas, Mîrze Mihemed, Keçelo*** û ***Bûka Baranê*** çendek ji wan nîşaneyan in ku bi sedên salan in bi vegotin û serpêhatîyan têne jîyîn.

Analîz û nirxandinên li ser şanogerîya kurdan pir kêm in. Di şirove û nivîsandinên heyî de, tê gotin ku hevnasîya kurdan bi şanoya dramatîk di sedsala 21ê de dest pê dike. ***Memê Alan*** a **Ebdurrehîm Rehmî** wekî *"yekem şanoya kurdan"* tê hesibandin. Ev teksta şanoyê di sala 1918ê de hatiye nivîsandin. ***Dayîka Niştiman*** şanoyeke muzîkalî/operayî ye ku di sala 1946ê de ji hêla kurdên Rojhilatê Kurdistanê ve tê pêşkêş kirin. Şano behsa 4 perçeyên kurdan dike û bala wan dibe ser neteweperwerîyê. Herçî ji bo kurdên bakur e, pîyesa ***Birîna Reş*** a **Mûsa Anter** lîstika yekem e. Anter ev şano sala 1959ê, di hucreya xwe ya Zindana Leşkerî ya Harbiyeya Stenbolê de nivîsandiye.

Kovara ***Jîn***ê ku destpêka sedsalê li Stenbolê weşana xwe dikir, di sala 1918ê de teksteke şanoya kurdî diweşîne. Navê wê tekstê ***Memê Alan*** e.

Piştî salên 1990ê, geşbûna têkoşîn û siyaseta kurdî dike ku ev beşê *hunerên bedew* bi pêş bikeve. Bingeheke xurt a vê pêşketinê ji hêla komeke şanoyê ve tê avêtin: ***Teatra Jîyana Nû***. Ev koma şanoyê heta destpêka salên 2000ê jî roleke mezin dide ser milên xwe. ***TJN*** di serdema xwe de wekî dibistanekê tevgerîyaye, jê gelek şagird rabûne û toza dika şanoyê kişandine dil û hinavên xwe.

Helbet berîya cûnteya leşkerî ya 1980yê li gelek bajarên kurdan komên şanoyê hebûne û bi awayeke amatorî be jî hewla geşbûna hunera şanoyê dane.

Îro ne bi tenê li 4 beşên welatê me, li Ermenistan, Gurcistan, Ewropa, Qazakistan, Qirgizistan û her devera ku kurd lê dijîn, hewla şanogerîyê tê dayîn. Helbet rewşa Herêma Kurdistana Federal cuda ye. Ev beşê welatê me şayanê nivîsareke berfireh e. Lê heke em behsa kurdên me yên Bakur û Tirkiyê bikin, em ê bibînin ku tevî bêderfetîyên mezin jî karên giranbûha û hêja kirine û dikin.

Halihazir li Stenbolê ***Seyr-î Mesel, Destar Teatre, Tîyatro Avesta*** û xebatên wê vê demê qels û sekinî xuya bikin jî ***Teatra Jîyana Nû*** kar û barê şanogerîyê dimeşînin.

***Seyr-î Mesel***, li navenda Beyogluya Stenbolê ye. Di nav şert û mercên dijwar de, hewla pêkanîna *'tîyatroya kurdî'* dide. Di sermaweza 2002yê de ava bûye. Her çiqas ev 7-8 sal in kar û barên hunerî dimeşîne jî, bingeha xebata ***Seyr-î Mesel***ê diçe 20 sal berê. Berîya ku bê ava kirin, xebata hunerî di bin banê ***Teatra Jîyana Nû*** ya NÇM-ê de dimeşand. ***Seyr-î Mesel*** heta niha bi her du zaravayên kurdî; kurmancî û zazakî (kirmanckî) –kêm caran bi zimanê tirkî- derketiye pêşberî temaşevanên xwe. ***Qal û Qir*** yekem lîstik e ku di sala 2003yê de bi zaravayên kurmancî û kirmanckî bo dêhn û bala temaşevanan hatiye leyîstin. Tevî vê lîstikê, tevahîya lîstikên ***Seyr-î Mesel***ê, bêyî ku metneke nivîskî hebe, bi performans û awayekî *'xwe bi xwe'* tê pêşkêş kirin. Gelek caran hew mirov dibîne ku temaşevan bixwe jî bûye beşek ji hêmayên şanoyê û rasterast xwe di nav axaftin û performansê de dibîne. Seyr-î Mesel heta niha gelek berhem pêşkêşî dêhn û bala me kirine: ***Kemero Bask*** (kirmanckî, 2003), ***Xezika Tebeşîrê*** (kurmancî-ji bo zarokan, 2003), ***Sayê Morû*** (Şahmeran, çîrok, kirmanckî, 2005), ***Sêva Perîyan*** (Çîroka Elbistanê, kurmancî, 2005), ***Mesele ne kadar Ozağ?'*** (tirkî-kurdî, 2005), ***Xewn û Xeyal*** û ***Jan û Xeyal*** (Ji du perde û 11 kurtelîstikan pêk tê, kurdî, 2007), ***Öç*** (Tol -ji Orhan Asena, tirkî, 2006), ***Arkadaş Arıyorum*** (tirkî, ji bo zarokan, 2006), ***Lewheyên Bêmane*** (kurdî-tirkî, ji 8 performansan pêk tê), ***Êş-Epîlog*** (kurdî, ji berhema Hesenê Metê, 2011), ***Kayo Mixenet*** (kirmançkî, jîyana Hesen Xeyrî Kangozade pêşkêş dike.)


Herçî ***Destar Theatre*** ye, di Cotmeha 2008ê de bi pêşengîya **Mîrza Metîn** û **Berfin Zenderlioğlu** hatiye ava kirin. Di gotûbêjeke ku min berê bi wan re kiribû de dîyar kiribûn ku armanca wan a sereke ne ew e ku di zûtirîn katê de lîstikan hilberînin, lê armanc ew e di warê hunerî de hevîrtirşê komê bibistirin. Ew di şanoya kurdan de ji îdîayan bêhtir, girîngîyê dide jîyana ceribandinên teatral. ***Destar Tîyatro*** vê gavê bi van lîstikên xwe derîyên xwe ji hunerhezan re vekiriye: ***Bûka Lekî, Cerb, Disko 5 No'lu, Antigone 2012.***

***NTVMSNBC*** her sal lîsteya lîstikên herî baş hildibijêre. Îsal di lîsteya lîstikên herî baş ên şanoyê de, lîstika bi navê ***Disko 5 No'lu*** ket nav lîstikên herî baş. Jurîya şanoyê ya ***NTVMSNBC***yê ji van navan pêk dihat: **Ustun Akmen, Nîhan Bora, Bahar Çuhadar, Gulum Daglı, Yaşam Kaya, Asu Maro, Betul Memîş, Ozlem Ozdemîr** û **Ferhat Uludere.**

Di şanogerîya kurdî ya bakur de divê behsa rol û girîngîya ***Tîyatro Avesta***yê jî bê kirin. Ev koma şanoyê sala 2003yê ji hêla **Aydin Orak** û **Cîhan Şan** ve hatiye ava kirin. Avesta, di sala 2005ê de ***Rojinivîska Dînekî*** ya **Gogol**, bi wergera **Aydin Orak** li hundir û derveyî welat pêşkêş kir. Di sala 2007êde jî lîstika **Azîz Nesîn** a bi navê ***Tu Ne Gara Yî***, bi zimanê kurdî û bi rejîya **Turgay Tanulku** derxist ser dikê. Herçî lîstika bi navê ***Araf/ Du Welat*** e, behsa jîyana **Mûsa Anter** dike. Lîstik ji hêla **Cîhan Şan** ve bi tirkî hatibû nivîsandin, **Aydin Orak** hem dike kurdî, hem jî lîstika yek-kesî pêşkêş dike. ***Zimanê Çiya*** ya **Harold Pinter** û ***Mirina Egîdekî*** ya **Mehmed Uzun** jî du berhem in ku Tîyatro Avesta derxistine ser dikê.

Divê bibêjim ku ***Şanoya Bajêr a Şaredarîya Diyarbekirê*** jî di warê şanogerîya kurdî de karên gelek girîng dike. Ev şanogeha hanê her în û şemîyan di xizmeta şanoya kurdî de ye.


Dîmenek ji lîstika 'Cerb' a şanoya Destar



Ji lîstika "Malî Bûke Şûşe", Silêmanîye



Çend şanogerên kurd: Erdal Ceviz, Nazmi Kirik, Mîrza Metin, Îbrahîm Turgay


Dîmenek ji lîstika 'Qeyd'ê



Du lîstikvanaên kurd: Şengül Özdemir, Bêrîvan Ayaz



Dîmenek ji lîstika 'Nora'yê


Dîmenek ji lîstika 'Muxtar û Jinên Taxê', Silêmaniye


Dîmenek ji 'Lewheyên Bêmane': Güler Yüksel İnce, Salihê Kevirbirî


Dîmenek ji 'Lewheyên Bêmane'


Dîmenek ji lîstika 'Şermola'



Ji lîstika 'Komara Dînan': Kemal Ulusoy, Erdal Ceviz


Dîmenek ji lîstika 'Nora'


Ji lîstika 'Kayo Mixenet', Elîşan Önlü

## NAVEROK

NÎSAN 2012



Ragehandina dewleta kurdî
SALIMÊ CASIM
▶ R. 1

Destûra nû û pirsa kurdî
MESUT YEĞEN
▶ R. 1

Felsefeya bêdijwarî
CHRISTOPHE BACONIN
▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Wêrekî yan xetimîn
SERGE HALIMI
▶ R. 6

Pêla şokê ya Sûrîyê
ALAIN GRESH
▶ R. 7

Berdewamîya enîyê li Rûsyayê
JEAN RADVANYI
▶ R. 8

Di nîqaşê de Yekîtîya Sovyetan
JEAN-MARIE CHAUVIER
▶ R. 8

Li Portekîzê zanîngeha lihevhatinê
OWEN JONES
▶ R. 9

Li himberî deyndêran, bêrûtîya arjantînî û tirsonekîya yûnanî
MAURICE LEMOINE
▶ R. 10

Belengazîya kurdan
KENDAL NEZAN
▶ R. 12

Çawa Sahel veguherî bombeyeke li ber teqînê
PHILIPPE LEYMARIE
▶ R. 14

Boko Haram, terîqeta piçûk a ku mezin dibe
JEAN-CHRISTOPHE SERVANT
▶ R. 15

Her tişt li Xezayê dest pê dike û diqede
JEAN-PIERRE FILIU
▶ R. 16

Teqlebazîyên doktrînal li Enîya Neteweyî
ERIC DUPIN
▶ R. 17

Bazirganîya belengazîyê, mîkrokredî
CÉDRIC GOUVERNEUR
▶ R. 18

Di nav daristanê de bajarê taybet
MAURICE LEMOINE
▶ R. 18

Bîranîneke ji agir
MAX DORRA
▶ R. 19

Maeterlinck û şahîtîyên wî
FRANCK VENAILLE
▶ R. 20

Odessa yan jî cezîbeya nedîyarîyê
IRENA WISZNIEWSKA
▶ R. 21

Sermîyanê gerdûnî yê hunerî û kurd
HASAN HÜSEYIN DEVECI
▶ R. 22

ÇAND Û HUNER
▶ R. 23

## Forma Abonetîyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

Abonetîya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetîya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB